Arşîva Bîra Kurdan: Ji Kendal Nezan gotara bi serenavê "Bêdadîya li hember kurdan" (1999)

ÇAPA ÎNTERNETÊ

LE MONDE diplomatique kurdî

Îlon 2012 - Hejmar 34 www.diplo-kurdi.com • info@diplo-kurdi.com 20 Rûpel

Miramon û Amado
Şerê ku li ser Sûrîyê bi rêya çapemenîyê, bi berbelavkirina agahîyên beredayî û şaş tê meşandin, hesabê bandorkirina li ser mejîyan dike û herweha şerekî dezînformasyonê ye...
▶ R. 6

Deloire û Dubois
Bîstûheft serokdewlet û serokwezîrên ewropî li kûlîsên Konseya Ewropayê ji raya giştî veşartî siberoja Ewropayê nîqaş dikin. Ji civîneke bilind a krîza euroyê ber bi yeka din ve...
▶ R. 9

Martine Bulard
Li Çîn a ku modernîteyeke bêsînor û rêbazên herî kevin bi hev re lê dimeşin, li pişt dîwarên sor ê navenda PKÇyê ku ji sala 1949ê ve welêt li gor dilê xwe bi rê ve dibe çi diqewimin?
▶ R. 12

Dan Baker
Welatên Rojhilatê Asyayê yên wek Taywan û Koreya Başûr bi dehsalan mezinbûneke bi lêz ya nedîtî standardên xwe yên jîyanê gihandin nêzî yên ewropî, lê dîsa jî krîzê derbek li wan xist...
▶ R. 17

Jacques Delcroze
Gelo Malî ya ku wek modela herî dawî ya demokrasîya afrîkî dihate nasîn û niha qeyraneke siyasî dijî, ji ber cihêtîyên kevin bi xetereke parçebûnê û bi hatina şerîetê ve rûbirû ye?
▶ R. 18

Li Rojhilatê Nêzîk guhertinên ji binî ve

Sîyaseta kurdî ya amerîkî

Prof. Dr. Ferhad Ibrahim

I.

Wisa dîyar e ku aktorên li Rojhilatê Nêzîk, berîya hemûyan jî hêzên dijberî rejîmê yên li Sûrîyeyê, beramberî helwêsta amerîkî li hember bûyerên li Sûrîyeyê û li derdora vî welatê di nava şerê navxweyî de têra xwe neewle û hêvînehiştî ne. Dema mirov bi serokên muxalefeta Sûrîyeyê re diaxive, ew qet venaşêrin ku ew xwe bi xewn û xeyalan naxapînin, dîyar e heke **Obama** di hilbijartinan de bi ser bikeve DYA wê sîyaseta xwe ya heta niha dewam bike. Lê belê ka gelo heke komarxwaz di hilbijartinan de bi ser bikevin ew ê sîyaseta destwerdanê ji nû ve bikin amûrekî girîng ê sîyaseta derve, ev yek bi xwe jî bêguman hê ne misoger e.

Tiştek êdî vebirrî ye, heke Rojava dest werde bûyeran, hingê divê DYA helwesta *Leadership from behind* a ji alîyê **Obama** ve hatîye terîfkirin bi rengê ku bi kêrî amadebûneke zelal a birêveberîyê were, biguhere. Hingê dibe ku Fransa, Brîtanyaya Mezin û hêzên din ên rojavayî qet nebe destekê bidin avakirina qadên parastî li Sûrîyeyê.

Sîyaseta kurdî a Amerîkayê ya heyî di raste rast girêdayî ye bi birêveçûna sîyaseta herêmî û encama şer û pevçûnên li Sûrîyeyê û li derdora Sûrîyeyê. Heman tişt ji bo Bakur, Başûr û rojhilatê Kurdistanê jî wisa ye. Bêguman stratejîyeke giştî ya amerîkî ji bo pirsgirêka kurdî li Rojhilatê Nêzîk nîne; yan jî xetên sîyaseteke bi vî rengî mirov nabîne. Birêveberîya **Obama** bi xwe di çarçoveya herêmî de helwêsta xwe li hember vê pirsgirêkê dîyar dike. Di vê gotarê de em ê bi sê qonaxan bi xetên sereke behsa stratejîya Rojhilatê Nêzîk a birêveberîya **Obama** bikin, helwêstên vê birêveberîyê beramberî pirsgirêkan yek bi yek terîf bikin û cihê ***pirsgirêka kurdî*** (kurdan) di çarçoveya van stratejîyan de zelal bikin.

II.

Piştî bi dawîhatina li ***Şerê Sar***, mirov difikirîn ku bidawîbûna duqutûbîtîyê di pergala navneteweyî de wê sîyaseta amerîkî azad bike ji ferz, şert û mercên hevrikîya bi Yekîtiya Sovyetê re. Di nava çarçoveyeke fireh de diyar e ev qebûl ne şaş e. Şer û pirsgirêkên giran yên li Rojhilatê Navîn û nihayet şert û mercên di encama ***11ê Îlonê*** de peydabûyî ser rastîyekê digirtin, ew rastî jî ev e: bi dawîhatina li Şerê Sar serdemeke nû dabû destpêkirin. Di serdema Şerê Sar de me weha qebûl dikir ku berjewendîyên petrolê, girîngîya jeostratejîk û ewlekarîya dewleta Îsraîlê ferzên rastîya heyî yên sîyaseta amerîkî ya li vê herêmê ne. Pirs û mijarên din hemû di bin van dîyarkeran de cihê xwe digirin. Mirov dikare vê yekê bi awayekî empîrîk û bi bûyeran jî piştrast bike. Ji van dîyarkeran şaxberdayî û bi wan rewakirî, DYA palpiştîya pergalên otorîter ên ji rêûresmê yên Rojhilatê Nêzîk dikir. Rejîmên ku bi hovîtîya xwe ya sîstematîk xwe li ser pîyan digirtin jî, Rojavayê tiştek nekiribe jî xwe li wan radigirt.

Tevî ku birêveberîya **Obama** di dewamîbûna sîyaseta derve ya amerîkî de qutbûneke zelal çênekir jî, meyildarê stratejîyeke nerm û qayîşokî bû da ku nebe bende û êsîrê wan dîyarkeran ku me li jor behsa wan kir. Ew ji guncawbûna herêmê dida rê. Wê divîyabû herweha li ber çavan bigirta ku bûyerên li vê herêmê hê jî dikarin tesîrê li berjewendîyên heyatî yên DYAyê bikin. Prensîpa duyem jî pêşîligirtina bersivên piralî û bersivdayîna qebqebûyan bû û ev rewş hê jî wisa ye. Mirov dikarî çavdêrîya bersivdayîneke piralî û pirreng ya birêveberîya Obama li tevahîya bûyerên herêmî yên girîng de bike. Weke mînak birêveberîyê, vekişîna hêzên eskerî yên amerîkî ji Iraqê bêyî ku şertan deyne, pêk anî. Ya rastî jî ew e, heke eskerên amerîkî li Iraqa bêîstîqrar hê jî bimana, ev ê ne karekî aqilane bûya.

▶ R. 3

Yek ji welatên ku niha 'Bihara Erebî' lê tê jîyandin Sûrîye ye. Li Sûrîyeya ku derdora 3 milyon kurd lê dijîn, hîn pergala kevnare ya beasî li ber xwe dide. Herçiqas hin bajar ketibin destê kurdan jî, hîn nezelalîyeke mezin heye û nayê zanîn ku dê pêvajo ber bi ku derê ve biherike. Pêvajoya hilweşandina rejîmên wek Tûnis, Misir û Lîbyayê zêde ne ajot; lê li Sûrîyeyê rewş cuda ye. Çavdêrên siyasî radighînin ku sedemên li Sûrîyeyê zûbizû encamnedana raperînên gel û têkneçûna rejîma beasî zêde ne: Esadên bav û kur, bi salan li welêt qet keys û derfet nedane ku mixalefetek çêbibe. Konseya Netewî ya Sûrîyeyê (KNS) ji kesên derveyî welêt pêk tên û têkilîya wan bi gel re zêde ne xurt e. Kurd di nav KNSyê de cîh nagrin. Çînên navîn ên Sûrîyeyê ku bajarê Helebê nûnertîya vê çînê dike, hîn hêvîya xwe ji Esad nebirîne. Piştgiriya Çîn, Îran, Rûsyayê jî divê meriv li van sedeman zêde bike. Lê ji alîyekî din ve, divê helwêsta kurdan a li hember rejîma beasî û mixalefeta Sûrîyeyê çawa bê nirxandin? Li Rojavayê Kurdistanê gelo mimkin e ku rewşeke *de facto* wek a Başûrê Kurdistanê derbikeve holê? Heger li Rojava vesazîyek wek li Başûr pêk were dê reaksiyona cîhana navnetewî çi be? Dê statuya kurdên rojava çi be? Mutefîk û hevalbendên kurdan kî ne? Li Rojava siberoj çawa dixwuye? Ber bi destpêka du salîya 'Bihara Erebî' ve me xwest em him di der barê rewşa îroyîn û him jî bi taybetî li ser rewşa Sûrîyeyê û kurdan bi pisporê Rojhilatê Navîn, dîroknas û zanyarê siyasetê Hamit Bozarslan re hevpeyvînekê li dar bixin.

Bozarslan: "Xwevekişandina Sûrîyeyê ya ji herêmên kurdan biryareke stratejîk e"

Yado Ciwan

Birêz Bozarslan, me par gotarek we ya li ser 'bihara erebî' di rojnameya xwe de weşandibû. We di vê gotarê de hin tesbît û nirxandin kiribûn. Ji wê demê heta îro çi guherî, hûn rewşa îroyîn çawa dibînin.

Di destpêkê de daxwazîyeke pir mezin a demokrasîyê û guherandinê hebû. Di nava civatê de daxwazîya guhertinên radîkal hebûn. Û ew daxwaz ji alîyê gelek kesan ve dihatin bilêvkirin. Him sinifên marjînal, him sinifên navîn û him jî entellektuelan piştgirî didan vê pêvajoyê. Ji hêla din ve, nifşên kevin û nifşên nû bi hevre di nav tevgerê de bûn. Him jin û him jî mêr tê de bûn. Yanî konfugîrasyoneke gelek taybetî çêbûbû. Û bi saya wê konfugîrasyona taybet him li Tûnis û him jî li Misirê guherandin qewimîn. Wextê ku meriv piştî salekê li Rojhilatê Navîn mêze dike, meriv pirsgirêkeke aşkere dibîne ku ev civak him civakên guherandinê ne û him jî civakên mihafezekar in. Daxwaza sîstemeke mihafezekar a siyasî gelekî xurt e. Û hereketên ku ji îslamîzmê hatine û îro ne îslamîst lê belê mihafezekar in ên wek AKPê, bi saya vê mihafezekarîyê hatin ser kar. Hereketên wek Birayên Misilman bi vî şeklî bi organên sîstema berê re îtifaqeke nû çêkirin. Yanî meriv dikare bibêje ku îro blokeke hegemonîk heye û di navenda wan hereketên hegemonîk de hereketên îslamîst hene. Herweha, di nav van sîstemên hegemonîk de hin aktorên sîstema berê jî hene. Bi vî awayî desthilatdarîyeke nû derdikeve meydanê. Û ev desthilatdarîyên nû ji alîyekî ve bi saya demokrasî û hilbijartinan derdikevin meydanê û ji alîyê din ve jî meriv dibîne ku program û perspektîvên wan ne program û perspektîvên demokratîk in.



Kîto Sîno: Derence û maske, li ser bilêta trênê, pênûsa reş

Di van guhertinên ku rê li ber hilweşandina rejîman vekirin de gelo kîjan dînamîkan rolên girîng leyîstin?

Ji salên 1980 û 90ê bigrin heta salên 2000ê dînamîkên derveyî, roleke gelek mezin leyistibûn. Lê wextê ku meriv li 2010 an 2012ê mêze dike, meriv dibîne ku dînamîkên bingehîn yên hundirîn in. Dînamîkên çînî ne, yên nifşan in, yên rawestan û westandina li dij hikûmetên ku ev serê 30-40 salan e li ser hikim in. Civakan lê mêze kirin ku ti tişt naguhere, wê yekê westandineke pir mezin çêkiribû. Gelên Tûnis û yê Misirê xwestin xwe ji wê westandinê xilas bikin. Helbet xeyalşikestinek jî çêbû. Dema ku şoreşê di sala 2011-12ê de dest pê kiribû gelek kes wisa difikirîn ku dê bi saya şoreşê û guherandinan sîstemeke baş bê damezirandin. Lê îro meriv dibîne ku sîstemeke zêde birêkûpêk derketîye meydanê. Hikûmetên ku hatine ser kar, hikûmetên demokratîk nîn in. Meseleyên aborî gelek giran in. Programeke hikûmeta Birayên Misilman a ji bo baştirkirina aborîyê nîne.

▶ R. 4

EDITO

Daxwaza herî xirab

Serge Halimi

Kangrenbûna fînansa amerîkî rê li ber krîzeke aborî ya global vekir û em bi encamên wê dizanin: bêkarîya zêde; dibe petixîna bi milyonan xwedîyên milk, paşveketina parastina civakî. Dîsa jî piştî wê bi pênc salan di encama nakokîyekê bi tenê de, tu kes nikare hatina qesra sipî ya zilamekî bi tevahî li derveyî îhtîmalan bibîne, ev zilam **Willard Mitt Romney** e ku dewlemendîya xwe ya pir zêde bi fînansa spekulatîf, guhertina cihên kar û cezba (bacî ya) giravên Kayman bi dest xistîye. Tercîha wî ya ji bo namzedîya komarxwazan a ji bo meqamê alîkarê serok, parlemanter **Paul Ryan** e. Heke di 6ê çirîya paşîn a bê de hilbijêr li ber daxwaza herî xirab serê xwe bitewînin, ev yek der barê rengê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê de fikrekê bi mirovan re çêdike.. Tevî ku **Barack Obama** planeke kêmkirina lihevderneketina budceyê qebûl kir jî, ev plan mesrefên civakî qut dike û bêyî ku asta bacê – a ku jixwe bi awayekî nenormal nizm e – ya hatinîyên herî zêde bilind bike. (1) Ryan vê kapîtulasyona Partîya Demokrat bi tevahî kêm dinirxîne. Bernameya wî ya ku **Romney** alîgirê wî ye û Meclîsa Nûneran (a piranîya wê komarxwaz) ji niha ve erê kirîye, wê bacan hê jî % 20 kêm bike û bi vî awayî rêjeya herî bilind daxe % 25ê, ji sala 1931ê ve hê rêjeya bacê evqasî daneketibû; ew ê pêre mesrefên li eskerîyê jî zêde bike. Bi kêmkirina para lihevderneketina budceyê di Hilberîna Hundir a Nesafî ya amerîkî de, ew ê vê parê daxe asta ji dehan yekê. **Ryan** çawa dixwaze performanseke bi vî rengî pêk bîne? Ew ê biqewl cewherê wezîfeyên sivîl ên dewletê ji sektora taybet re – yan jî ji weqfên alîkarîyê re – bihêle. Bi vî awayî budceya ji mesrefên tibbî yên xizan û hewceyan re veqentandî wê % 78 were kêmkirin. (2)

Ji destpêka sala bihurî û vir ve Obama sîyaseteke kêmkirina aborîyê ya hem li Amerîkayê û hem jî li deverên din gelekî binketî pêk tîne. Carinan ew pesnê xwe dide (kêm caran) ji ber nûçeyên baş ên aborîyê ku ew wan dixe para serokatîya xwe, carinan jî yên xirab (rewşa îstîxdamê) dixe stûyê parlemanterên komarxwazan. Dîyalektîkeke bi vî rengî dîyar e wê zêde bi kêrî ji nû ve seferberkirina hilbijêrên wî neyê, belê serokê amerîkî jê hêvî dike ku tirsa ji radîkalîzma rastgir a reqîbên wî wê dewreke duyem a serokatîyê ji wî re misoger bike. Lê belê ew ê piştre çi bike, piştî ku sozên dewra yekem li ber avê berdan û dîyar e ku misoger e kongreya çirîya paşîn a bê were hilbijartin, wê ji ya ku dema li Qesra Spî wî dest bi wezîfeyê kir pêre rûbirû bû, rastgirtir be?

Careke din sîstemeke ji alîyê du partîyên di mijara îmtiyazdayîna karmendên dewlemend de, bi hevrikên hev ve kilîtkirî, wê bi milyonan amerîkîyên ji sistîya serokê xwe bêmoralbûyî, neçar bike dîsa jî dengê xwe bidin wî. Ew ê li ber tercîha li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê serê xwe bitewînin, adet e, ango di navbera xirab û herî xirab de. Biryara wan bi herhalî wê ji bo deverên din ên dinyayê jî rê li ber encaman veke: serketina Partîya Komarxwaz bi biryardar e ku dewleta civakî ji holê rake. Dilmayî û gelekî nerazî ye, di erebeya xiristîyanên ekstremîst de bi cih bûye û bi kîna xwe ya dij-îslamî berbi paranoyakbûnê ve diçe, bi vî halê xwe ji niha de rastgirên ewropîyên ku di vî warî de ji xwe li amanan e, wê bibin heyrana fikr û partîya wan..

(1) Chantage à Washington / li Washingtonê şantaj", *Le Monde diplomatique,* tebax 2011.

(2) David Wessel, "Ryan reflects arc of GOP fiscal thinking / Ryan li kevana GOP a fikra bacê dihizire", *TheWall Street Journal,* newYork, 16ê tebaxa 2012ê.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Robotekê *pulitzera* min dizî

Evgeny Morozo *

Gelo teknolojî dikare bi serê xwe jî hebe? Gelo ew dikare bêyî alîkarîya mirovan jî hebe? Ji teolog **Jacques Ellul** heta bi **Theodore Kaczynski** yê jêre *"Unabomber"* (1) tê gotin, bersiv gelek caran erênî ye. Bi her halî îro gelek dîrokzan û sosyolog vê teorîyê weke safik û bêbingeh dibînin. (2)

Dîsa jî cîhana malî her diçe bêhtir xwe disipêre pevguherînên xweber ên ku bi xêra algorîtmayên kompûterên bipêşketî wan hildiberînin pêk tên, ji van kompûteran tê ku guhertin û nirxgirtinên bazirganekî asayî bi wan jî nehise nas bike û wan bi kar bîne.

Yek ji weşanên malî yên herî bi nav û deng kovara ***Forbes*** berîya demeke kurt bang li şirketa ***Narrative Science*** kir da ku bi awayekî xweber gotaran bi awayekî *online* binivîse, hema berîya ku şirketên mezin encamên xwe yên malî bidin zanîn. Ji bo vê yekê têrê dike ku mirov bernameyeke kompûterê bi statîstîkan bar bike û ev bername di nava çend sanîyeyan de metnên ku dikarin bêqisûr bên xwendin, derdixe holê; li ***Forbes***ê ji me re vê mijarê weha rave dikin: *"bi xêra platforma wê ya aqilê çêkirî ê xwedî nav û marka,* ***Narrative Science*** *daneyan vediguherîne gotar û metnên ku dikarin werin fêmkirin"*

Heke hûn bi ber îronîya rewşê neketibin, em ji nû ve derbibirin: platformên xweber dixebitin, êdî raporan li ser şirketan "dinivîsin", ew şirketên ku bi xêra kompûterên di ***trading*** a xweber de pispor pereyan bi dest dixin.

Di dawîyê de ev belge ji nû ve dikevin nav pergala malî, lewra ew derfet û navgînên naskirina kirarîyên herî zêde kar tînin, ji algorîtmayan re dabîn dikin. Û bi vî rengî dewam dike: rojnamevanîya robotan ji bo robotan. Pere bi xwe her di destê mirovan de tên berhevkirin. Halê hazir şirketên ku bernameyên rojnamevanîya xweber berîya her tiştî di qad û sektorên pirr baş dîyarkirî – spor, fînans, milk – de bi pêş dixin ku gotarên wan para bêhtir li gorî heman pêşnûmaya ji statîstîkên pir zêde pêk tê, tên hûnandin. Lê belê ew herweha dest pê dike elaqedarî rojnamevanîya sîyasî bibe: *Narrative Science* xizmeteke nû pêşnîyaz dike ku li ser nirxandina hilbijartinên amerîkî bi rêya medyayên civakî yên mîna ***Twitter*** (kîjan mijar, kîjan namzet yê herî zêde/ herî kêm navbirî ye li filan eyaletê, li filan herêmê û hwd.) gotaran pêk tîne.

Ev xizmet herweha dikare *twittên* herî zêde parvekirî û yan jî yên herî balkêş jî ji ber bigire. Divê mirov lê mikur were: karê analîzkirina ***Twitter***ê kes nikare ji robotan çêtir bike. Mirov dikare bi hêsanî têbigihêje ka ji bo çi mişterîyên *Narrative Science* – şirket îdîa dike bi dehan hene – xizmet û karên wê diecibînin. Berîya her tiştî ev yek ji bo wan gelekî erzantir e ji muçedana rojnamevanên wê tevahîya rojê bixebitin, bi ser de jî ew carinan nexweş dikevin û dixwazin ku mirov rêzeke asgarî jî ji wan re bigire. ***New York Times***ê (10 îlona 2011ê) da zanîn ku mişterîyekî bi kêmtirî 10 dolaran gotareke ji pêncsed gotinî kirrîye bêyî ku kesek ji mêtingerîyekê gazinan bike. Û ev jî di nava demeke bi zor digihêje sanîyeyekê de.

Di rêza duyem a sedeman de ew heye, *Narrative Science* pesnê xwe pirr pê dide ku ew ji rojnamevanan hemûyan bêhtir ji navgînên xwe sûdê werdigire û taqetê bi kar tîne – û ji wan objektîftir e. Em rastîyê bibêjin, ma di nava rojnamevanan de kî bi rastî jî xwedîyê wê dema pêwîst e ji bo xwendin û analîzkirina bi milyonan *twîttan*? Ev ji bo robotan qet jî ne pirsgirêk e, ew di nava kêlîyekê de vî karî dibin serî. Hemin armanc ne bi tenê hêrana statîstîkan e, lê belê herweha ji nava wan neqandina maneyê ye da ku ragihîne xwendevanan. Gelo Narrative Scienceê wê karîbûya hetikîna ***Watergate*** derxista holê? Bi îhtîmaleke mezin wê nikarîya. Jixwe pirranîya gotarên mirovan nivîsî jî nagihêjin asteke ewqasî bilind, çarçoveyeke ewqasî berfireh...

Damezrênerên şirketan bê westan dubare dikin ku ew dixwazin "alîkarîyê" bikin bi rojnamevanan re û naxwazin wan tine bikin; û bêguman ew jidil rast dibêjin. Dîsa jî pirr muhtemel e ku qunciknivîs, nûçegihan û weqianivîsên din bi tenê wê pirr kêm hez ji vê vedîtina harîqulade bikin, lê belê karsazên wan wê gelekî hez jê bikin, lewra ew gelek caran ji ber mesrefan dibizdin. Bi her halî, di dema dirêj de, encamên sivîl ên teknolojîyên bi vî awayî – ku hê nû dest pê kirine – dibe ku pirr bi pirsgirêk derkevin holê. Li ser înternetê, tevahîya tevgerên me tê tomarkirin. Pêlkirinek, xwendinek, vîdeoyek, kirrînek, "ez hez dikim"ek, ev hemû di bîra dîjîtal de tên muhafezekirin, piştre ji nû ve tên bikaranîn da ku bi awayekî hosteyî û xasûkî ber bide wê tişta ku wê li ser bernameya me ya gera li ser tevna înternetê û li ser pêkanînên me xuya bike.

Ji niha ve gazinkerên ji înterne ditirsin ku ev şexsîkirina *Webê* bi tenê dikare bi dinyayekê bi encam bibe ku em lê bi tenê gotarên nêzî elaqeyên xwe bixwînin û di vê navê de em ê qet ji "qadên xwe yên rehetîyê" dernekevin nav serhatîyên din. Tevnên civakî û geşedana wan a dawî lê nayê ya girêdan û guftûgoyên piçûk qismî ev fikir demode kirin. Li hemberî vê derketinaholê ya "rojnamevanîya xweber" rewşeke nû dikare were afirandin ya ku hê berîya çend salan me nedikarî lê bifikirin: û heke bi pêlkirina heman girêdanê mumkin be ku du kes du metnên bi tevahî ji hev cihê re rûbirû bibin wê çi bibe? Em wisa bihesibînin ku ji dîrokçeya bernameya min a gera li ser înternetê tê fêmkirin ku dîplomaya min a dibistana bilind heye û ez gelek saetan li ser malpera *The Economistê* derbas dikim. Hingê gotara min wê ji ya cîranê min ê ku ji *New York Review of Booksê* bêhtir hez ji *USA Today* dike, bi gelekî hûrkolayîtir û vebirrîtir be.

Bi heman rengî, heke dîrokçeya gera min a li ser înternetê nîşan dide ku ez elaqedarî rojevê û edaleta navneteweyî me, gotareke li ser **Angelina Jolie** a ku kompûtera min derxe holê dibe ku behsa filmê wê yê li ser şerê Bosnayê bike; û cîranê min ê dildarê jiyana staran, di encamê de mafê wî wê hebûya ku gotegotên dawîyê yên li ser têkilîya wê ya bi **Brad Pitt** re bixwîne.

Nivîsandin û guherandina gotaran di kêlîya qewmînê de, şexsîkirina wan ji bo ku ew li berjewendî û adetên înntellektuel ên xwendevên werin: ev bi tevahî armanca rojnamevanîya xweber e. Reklamdêr û patronên çapemenîyê heyranên vê ferdîkirinê ne, lewra ew bikarhênerê înternetê her diçe bêhtir wext li ser malperên wan derbas bikin. Lê belê gelo ji bilî çend pêbûnên civakî ev beridîn bikêrhatî ye? Di rewşa herî baş de bikarhênerên înternetê wê di nava xelekê de asê bimînin, bi tenê nûçe û agahîyên erzan û bikêr bixwînin û êdî hew bibînin ku cîhaneke din a cuda jî heye. Xisleta civatî ya tevnên civakî a ku dike ku hîsa mirov timî hertiştî der barê hertiştî de dizanin peyda bibe, vê meylê xurttir dike. De vêca lê bifikirin çawa ku muhtemel e, heke dêwên teknolojîyên nûjen bi awayekî zêde pereyan li vê bazarê razînin û şûna lîstikvanê piçûk *Narrative Scienceê* bigirin ka wê çi biqewime? Em weke mînak rahêjin Amazonê: kompûtera wê ya tablet a bi navê **Kidle** destûrê dide bikarhêneran ku di ferhenga wê ya elektronîk de li peyvên nayên nasîn bigerin û binê hevokên wan ên hezkirî xêz dike; *Amazon* van agahîyan li ser serverên xwe tomar dike. (3) Ev tomarkirina agahîyan wê gelekî bi kêr bihata heke şirketê biryar bidaya ku xwe bi gurçûpêç bike bi hilberînereke xweber a agahîyên şexsîkirî. Bi her halî, Amazon pê dizane ez kîjan rojnameyê dixwînim, kîjan awayên gotaran bi kêfa min in, kîjan şêwazên hevokan bala min dikişînin ser xwe, kîjan peyv serê min tevlîhev dikin. Bi ser de jî kompûtera wê ya tablet jî bi min re heye, ya ku ez pê dikarim (belaş) gotarên bi vî rengî bixwînim. Û ma ***Google***? Motorê lêgerînê ji herkesî bêhtir bi adetên min dizane – nexasim jî ji pêkanîna sîyaseta wê ya veşartîbûnê ya nû û vir ve – lê belê ew herweha ***Google Nûçeyan*** jî bi rêve dibe, ew çavkanîyek e ku li şûna ku naverokan rojane bike, wan dineqîne û dabeş dike û ew pêre jî elaqeya min ji çi re heye jêre dibêje. Û bi xêra ***Google Wergêr*** ew ji niha ve dizane hevokan berhev bike... Fikra ku xweberkirineke xurttir dikare rojnamevanîyê rizgar bike kêm guncaw e, lê belê divê mirov mucîdên weke *Narrative Science*ê gunehbar neke. Heke ev teknolojî aqilane werin bikaranîn, hingê dikarin bikin ku dezgehên çapemenîyê teserufên bikêrhatî bikin û rojnamevan jî li şûna ku her hefte heman serhatîyê binivîsin, dikarin wext û enerjîya xwe li lêkolînên asta wan bilind xerc bikin.

Sedema tehlûkeya bi rastî ew e ku em red dikin meyildarî pêbûnên civakî û sîyasî yên cîhanekê bibin ku lê xwendina anonîm wê ji holê rabe. Cîhaneke ku reklamdêr, ***Google, Facebook, Amazon*** û hwd. pêkhatina wê texeyul dikin a ku têde fikra rexnegir, a haydar û ne konvensîyonel wê zehmettir were bipêşxistin û parastin.

* Rojnamevan, nivîskarê pirtûka The Dark Side of Internet Public Affairs, New York, 2011.

(1) Têbînîya redaksîyonê: mîlîtanê neoludît [dijberê tevahîya bipêşketinên teknolojîk, nota wergêr] û hawîrdorparêz ê ku rêzeêrîş (şanzdeh bombe) pêk anîn ku di encamê de sê kes hatin kuştin. Sedema van êrîşan danîşana "jirêderketinê" şaristanîya bipêşketinê bû. Federal Bureau of Investigation (FBI) hivdeh salan da ser şopa wî û sala 1996ê ew girt.

(2)Wiebe E. Bijker,Thomas P. Hugues û Trevor Pinch, *The Social Construction of Technological Systems : New Directions in the Sociology and History of Technology / Avakirina Civakî a Pergalên Teknolojîk: di Civakzanî û Dîroka Teknolojîyê de Îstîqametên Nû,*MIT Press, Cambridge, 1989.

(3) *Bi gire li ber* "La liseuse lit en vous comme dans un livre ouvert/serikê xwendinê yê kompûterê weke ku pirtûkeke devê wê vekirî bixwîne nava we dixwîne", *NRC Handelsblad,* Rotterdam, *Courrier internationalê* jî çap kir, Paris, 1ê tebaxa 2012ê.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Nivîskar û rewşenbîrê kurd Nebî Kesen, ku di adara 2010an de gotarek bi serenavê "YE û pirsgirêka kurd a li Tirkiyeyê" ji rojnameya me re nivisandibû, di 17ê îlonê de çû ser dilovanîya xwe. Xebatkarên Le Monde diplomatique kurdî ji bo Nebî Kesen rehmet, ji bo malbat û nasên wî jî sersaxî dixwaze.

Le Monde diplomatique kurdî (Çapa elektronîk)
Ji aliyê Independent Kurdish Media Group GmbH ve tê weşandin

INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP GMBH
Carnotstr. 4
10587 Berlin / Almanya

Lijneya Weşanê
Murad Satik
Riza Dînç

Le Monde diplomatique kurdî

Redaksiyona Zimanî
Mahmûd Lewendî
Remzî Kerîm

Koordînasyon
Yado Ciwan

Alîkarên vê hejmarê
Nedîm Baran
Semra Polat

Revîzyona Wergeran
Feryal Guladawîya

Berpirsê Hunerî
Hasan Huseyîn Devecî

Designer
Fabio Biasio

Web Developer
Erhan Yekta

Tel: 00 49 (0)30 330 990 420
Fax: 00 49 (0)30 330 990 429
info@diplo-kurdi.com
www.diplo-kurdi.com

ABONETÎ
Independent Kurdish Media Group GmbH

Berliner Volksbank
Konto: 2284 123 010
BLZ: 100 900 10
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 00
BIC/SWIFT: BEVODEBB

Abonetîya dîjîtal ya salane: 30 €

Le Monde diplomatique

Damezrîner
Hubert Beuve-Méry

Birêveberê giştî
Serge Halimi

Sernivîskar
Maurice Lemoine

Cîgirên Sernivîskarî
Martine Bulardi
Philippe Rivière
Anne-Cécile Robert

Redaksiyon
Alain Gresh
Mona Chollet
Pierre Rimbert
Dominique Vidal

Birêveberê hunerî
Alice Barzilay

Dokumantasyon
Olivier Pironet

Sekreter
Sophie Durand
Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon,
F-75013, Paris, France

www.diplo-kurdi.org

Sîyaseta kurdî ya amerîkî (Dewama rûpela 1)

Lewra hingê hem hebûneke eskerî ya xurt wê pêwîst bûya û hem jî eskerên amerîkî wê bibûyana armanca li pêş a êrîşên hêzên alîgirê Îranê û hêzên din ên tundrew. Şer û pirsgirêka Rojhilatê Nêzîk bêguman ji bo birêveberîya **Obama** rê li ber zor û zehmetîyan vekir. Fikra Obama rast bû dema ku wî jî ji derengxistina fermî ya sîyaseta bicihkirina cihuyan a Îsraîlê da rê. Lê belê Îsraîl ne hazir bû ku ji berê ve ji bo lihevkirinê gavan paş ve biavêje. Bi vê jî berîya hertiştî hewldanên amerîkî yên ji bo çareserkirina şer û pirsgirêka Rojhilatê Nêzîk têk çûn. Lihevnekirin û pirsgirêka elaqedarî bernameya sîlehên nukleer ên Îranê jî nehat çareserkirin. Dîyar e tu planên **Obama** ji bo destwerdaneke eskerî nebûn û nedixwest destwerdaneke eskerî ya bi destê Îsraîlê jî erê bike. Wisa dîyar e ku DYA bawer dike ku sîyaseta îranî wê piştî bidestxistina bombeya atomî nermtir bibe. Weke mînak piştî ku herdu dewlet bûn hêzên xwedî bombeyên atomî, mirov dikare hêsantir hesabên pirsgirêka di navbera Hindistan û Pakistanê de bike. (1)

III.

Weke ji bo birêveberîyên berîya niha yên amerîkî ji salên 80yî û vir ve, pirsgirêka kurdî ji bo birêveberîya Obama jî ne xwedî mane û girîngîyeke bi serê xwe ye. Rewşa herêma federe ya Başûrê Kurdistanê piştî ku Obama bû serokê DYAyê di çarçoveyeke heyatî de ji bo birêveberîya nû gelekî girîng bû. Obama dixwest di dema herî kin de eskerên amerîkî vekişîne. Bi dilê kurdên hevgirên dilsoz ên DYAyê bû ku çareserîyeke têde mayina eskerên amerîkî hebû pêk bihata. **Barack Obama** bi xwe, jixwe nedixwest vê yekê nîqaş jî bike. Vê yekê wê rê li ber rewşeke bi tehlûke vekira. Ji bilî kurdan, hêzên din ên ên sîyasî yên Iraqê û di serî de Îran hevgirên wan ên herêmî wê mayina eskerên amerîkî qebûl nekira. DYAya Obama serokê wê, bandora xwe li Iraqê ji dest da. Dîyar e berevajîyê kurdan, DYA bi îhtîmaleke mezin dikare li ber çavan bigire ku li vî welatî hew dikare tesîrê li bûyerên sîyasî bike. Alozîyên dewam dikin yên di navbera kurdan û hukûmeta **Nûrî el-Malikî** de dikarin veguherin şerên çekdarî. Ji ber ku di navbera herdu partîyên kurd ên li herêmê ango PDK û YNK de her diçe qelşeke mezin bêhtir darîçav dibe, tevahîya destketîyên kurdan ên ji sala 1992yê ve bidestxistî di tehlûkeyê de ne. Kurd wekî din jî nikarin pêşîyê lê bigirin ku DYA Iraqê bi çekan gurçûpêç bike. DYA divê pê zanibe ku hukûmeta navendî ya Iraqê bi hewldanên xwe yên mezin ên xwe çekdarîkirinê dixwaze di warê eskerî û sîyasî de zextê li kurdan bike.

Helwêsta Obama beramber ***pirsgirêka kurdî*** qet nebe bi awayekî sembolîk nuansên nû nîşan dide. Hevdîtina bi serokê koma parlemanê ya partîya kurd a li Tirkîyeyê **Ahmet Türk** re sala 2009ê bi awayekî *de facto* qebûlkirinek bû, DYAyê hebûna pirsgirêka kurdî li bakurê Kurdistanê bi awayekî zelal bihîstîye. Li vir dewamîbûneke dîyar heye ku mirov çavdêrîya wê dike. DYA ji du dehsalan û vir ve çareserkirina pirsgirêka kurdî di çarçoveya pergala sîyasî ya Komara Tirkîyeyê de diparêze. DYA di heman demê de bi awayekî zelal PKKê red dike. Gelek sedemên vê redê hebûn û hene. Li alîyekî DYA bawer dike ku PKK tevgereke terorîst e, ku di dehsalên bihurî de hevgirtin bi dijberên DYAyê re kirine. Li alîyê din DYA difikire ku bikaranîna sîlehan ji bo çareserkirina pirsgirêka kurdan li Tirkîyeyê ne pêwîst e. Helwêsta redkar a DYAyê kir ku **George W. Bush** generalekî amerîkî (United States Special Envoy for Countering the Kurdistan Worker Party General Joseph W. Ralston) bike koordînatorê tevgera amerîkî-tirkî ya li dijî PKKê. Di dawîyê de DYAyê hewce dît ku sala 2007ê PKKê qedexe bike.

Bihara erebî û çalakîyên PKKê û yên baskên wê Partîya Yekîtîya Demokratîk –PYD û PJAKê bûn sedema reaksîyonên zelal ên DYAyê. Wisa xuya ye ku ji destpêka berxwedanê û vir ve li Sûrîyeyê PKK bi blokeke alîgirê Iranê re (Îran, Sûrîye, Hîzbullah) hev girtibe. Êrîşên Îranê yên li dijî qadên PKKê yên li Herêma Federe ya Kurdistanê bihara 2011ê rawestîyan. Bi angajmana hukûmeta AKPê li dijî rejîma **Beşer el-Esed** angajmana PKKyê jî li rojhilatê Kurdistanê zêde bû. Bi veguhestina hêzên eskerî û sîyasî li rojhilatê Kurdistanê (Kurdistana Sûrîyeyê) PYD li herêmên kurdan belav bû. Hê di havîna 2011ê de PYDê li hersê herêmên kurdan Efrîn, el-Cezîra û Kobanîyê serdestîya xwe misoger kiribû. Bi ajîtasyona xwe ya hê bêhtir li dijî Tirkîyeyê PYD li herêmên kurdan bû sedema peydabûna tevlîhevîyê. Ji dawîya sala 2011ê ve li herêmên rojavayê Kurdistanê avahîyeke desthilatdarîyê ya duserî heye. Sazîyên ewlekarîyê yên rejîma Beşar el-Esed û hêzên PYDyê yên baş birêxistinbûyî û çekdar. PYDyê di warê sîyasî de kurdên Sûrîyeyê kirin "disiplînê". Ew hewl dide rojeva sîyasî dîyar bike; ew biryarê dide ka gelo berxwedan wê li dijî rejîma **Beşar el-Esed** bibe û wê kengî bibe. Ji bo ku pêşîyê li şerekî navxweyî yê kurdan bigire serokê herêma federe ya başûrê Kurdistanê bi rola navcîtîyê rabû. Partîyên kurdên Sûrîyeyê ên li başûrê Kurdistanê ku qels in û ji PYDyê tirsîyane li platformekê bi PYDyê re bûn yek, vê platformê divîyabû li rojavayê Kurdistanê pêşî li şîddetê bigirta.

Ji bo DYAyê tehlûkeyên PKK û hevgirên wê dikarin rê li ber wan vekin, dîyar bûn. Nexasim jî hukûmeta AKPyê "tehlûkeyên" ku PKK dikare rê li ber wan veke bi awayekî mubalexekirî bi DYAyê dide zanîn. Bêguman dewra PKKyê di çarçoveya bûyeran de tê dramatîzekirin. Lê belê dîsa jî heke herêmeke tampon ji bo penaberên Sûrîyeyê ya tirk têde serwer were avakirin, mirov nikare îhtîmala ku PKK û baskê wê bi awayekî eskerî bikevin nava tevgerê jî li derve bigire. Bi îhtîmaleke mezin şerê li Sûrîyeyê û bangên hukûmeta AKPyê li hukûmeta amerîkî ji bo ku tehlûkeyên PKKyê "rast" bibîne, bûn sedem ku hin endamên senatoyê qanûnekê (Condemning the PKK and expressing solidarity with Turkey) li dijî PKKyê amade bikin. Cewherê naveroka vê qanûnê derxistina pêş a hevgirtina bi Tirkîyeyê re û erka hukûmeta amerîkî ku bi Tirkîyeyê re li dijî PKKyê têbikoşe ye. (2)

DYAyê bi xwe bi îhtîmaleke mezin tu carî û bi tu awayî destwerdaneke eskerî li dijî rejîma **Beşar el-Esed** plan nekir. (3) Daxuyanîyên serokê DYAyê **Obama**, Wezîrê Bergirîyê **Panetta** û Serokê Fermandarîya Giştî ya artêşa amerîkî **Dempsey**, yên digotin, ew pêdivîya bi herêmeke tampon li Sûrîyeyê nabînin û bi tenê eskerên **Esed** sîlehên kîmyayî bi kar bînin ji bo wan xeteke sor e, bi serê xwe helwêsta DYAyê dîyar dikin. Ev daxuyanî bi zanîn yan jî nebizanîn qada tevger û operasyonê didin rejîma Beşar el-Esed.

IV

Bi hevgirtina "bi dizî" ya bi Îranê re û bi tevgera PYDyê li başûrê Kurdistanê PKK dike ku li alîyekî hukûmeta tirk ji serûbinîhevbûnên li Rojhilatê Nêzîk sûdê wergire da ku sîyaseta xwe ya kurdî ya heta îro dewam bike. Li alîyê din jî heke PKK-PYD rojeveke ku şert mercên li Sûrîyeyê heyî li ber çavan negire li rojavayê Kurdistanê ferz bikin, hingê sozên hukûmeta amerîkî yên dibêjin DYA mafên kurdên Sûrîyeyê rewa dibîne jî, îzafî dibin. Di van şertên heyî de û bi sîyaseta xwe PYD dikare bike ku hevgirên kurdên Sûrîyeyê yên bi rastî û yên potansîyel, yên hundir û yên ji derve helwêsta xwe biguherin. Sedema wê yekê ku kurd heta niha li derveyî Kongreya Neteweyî ya Sûrîyeyê mane ew e ku hin partîyên rojavayê Kurdistanê ditirsin ku PYD wan ceza bike.

Ji ber ku PYD ne rêxistineke bi serê xwe ye, mirov dikare bi rêya birêveberîya PKKyê bike ku ew sîyaseta xwe biguhere. Halê hazir li gorî agahîyên li ber dest, zelal nîne ka PKK ji vê lîstika hevgirtinan a di bin sîya şoreşên erebî de çi hêvî dike. Ew pêre rûbirû ye ku sîyaseta xwe ya hevgirtinê ya sala 2011ê destpêkirî ya bi Îranê û hevgirên wê re bi dawî bike, helwêsteke erênî û ji dil nîşan bide li beramber hêzên veguherîna demokratîk li Rojhilatê Nêzîk. Tevgera berxwedanê weke encama taktîkên PKK-PYDyê yên neşefaf de dibe ku çareserkirina pirsgirêka kurd li Sûrîyeyeke azad qet jî teşwîq nekin. Dibe ku garantîyên amerîkî yên neferz ji holê rabin, çawa ku gelek caran jî di dîrokê de xwe da der. (4)


(1) Waltz, Kenneth N.: Why Iran Should Get the Bomb / Çima dive Îran bibe xwedîyê bombeyê. In: Foreign Affairs, Tîrmeh/Tebax 2012.

(2) 112TH Congress 2D Session, S. RES 486, Condemning the PKK and expressing solidarity with Turkey.

(3) Ji bo vê mijarê binêre li Martin S. Indyk, Kenneth G. Lieberthal, Michael E. O'Hanlon: Scoring Obama's Foreign Policy / Mihiyana Sîyaseta Derve ya Obama. In: Foreign Affairs gulan/hezîran 2012.

(4) Bi vî awayî garantîyên Henry Kissinger û Richard Nixon salên 1972-75ê dayî bi trajedîya kurd a sala 1975ê bi dawî bûn.

Wergera ji almanî: Luqman Guldivê
















Kîto Sîno: Rêzewêneyên li ser bilêta trênê

Bozarslan (Dewama rûpela 1)

Ew girseyên ku demokrasî dixwestin mêze kirin ku daxwazên hikûmetên ku hatine ser kar û daxwazên wan ên demokrasîyê hev nagirin.

Di dawîya gotara we ya par de we bal kişandibû ser hin pirsan û we gotibû hîn bersiva van pirsan ne zelal in. We qala berpirsîyarîyên dewletên ewropî kiribû. Di nav vê dema derbasbûyî de gelo Ewropayê ev berpirsîyarîyên xwe çiqas bi cih anîn? Dema meriv îro li rewşê mêze bike meriv dikare bersivekê bide van pirsan an na?

Dewleten ewropî û Amerîkayê wexteke dirêj alîkarîya sîstemên otorîter kirin. Ji bo wan bi awayekî, ranteke ewlekarîyê peyda kirin û ew meşrû kirin. Sîstemên otorîter ji bo wan roleke muhafizîyê dileyist. Ji ber vê yekê, şoreşên Tûnis û Misirê ji bo Ewropa û Amerîkayê şoqeke mezin çêkir. Îro, ez pir ewle nîn im ku welatên Ewropa û Amerîkayê karibin bi awayekî erênî alîkarîya van civatan bikin. Ji alîyekî ve, krîza aborîyê destên wan girêdaye, ji alîyekî din ve jî hêvîya wan ew e ku karibin bi sistemên muhafezekar ên nû re îtifaqê çêbikin û bi vî awayî wan entegreyî sîstema cîhanê bikin. Bersivên wan ên li dijî zordarîya rejîmên nû bersivên gelekî şeklî ne.

Îro dema em lê dinêrin di navenda van guherînan de Sûrîye heye. Rejîma Beas gelo hîn dê çiqas bikaribe li hember raperînên hundirîn û zextên derveyî, li ber xwe bide. Dema îro meriv li Sûrîyeyê dinêre, bi çavê pisporekî, akademîsyenekî meriv wêneyekî çawa dibîne?

Tiştê ku meriv îro li Sûrîyeyê dibîne ew e ku hikûmet gelekî zeîf bûye. Rejîma **Beşar Esad**, gelekî qels ketîye. Ev rejîm, ne rejîmeke weke ya li Misir û Tûnisê ye. Wek rejîmeke çeteyî ye, rejîmeke milîsan e. Heta niha karî bi saya şidetê salek, sal û nîvekê li ser piyan bimîne. Stratejîya vê sîstemê stratejîyeke gelek orîjînal e. Ji ber ku ev rejîm, bi piştgirîya ***nûseyrîyan*** li ser piyan dimîne. Ev piştgirî, ne piştgirîyeke bi dilxwazî ye, lê belê bi zorê hatîye bi dest xistin. Meriv dizane ku li ser nûseyrîyan zoreke gelek mezin heye da ku piştgirîya xwe venekişînin. Heger rewş ne wisa bûna dê nûseyrîyan jî krîzeke mezin derxistana. Rejîm mentiqeke mezhebî bi kar tîne. Lê mixalefet, bi xwe jî xwedî helwêsteke mezhebî ye. Heta raperînên meha gulanê, mixalefet ne mixalefeteke mezhebî bû, lê piştî hezîran û tîrmeha 2011ê me dît, her ku çû helwêsteke hîn mezhebî wergirt. Dibe ku ev yek ji bo Sûrîyeyê û siberoja wê tiştekî pir xirab be. Ji ber ku piştî ku **Beşar Esad** biçe, ez bawer nakim ku Beşar Esad wextekî pir dûr û dirêj li ser kar bimîne, ew dê pir zehmet be ku wan çekan cardin ji destê gel bikaribin bigirin. Û dînamîkeke din jî dînamîka Kurdistanê ye. Herkes dizane ku hereketeke kurdî heye û herkes dizane ku di salên 70-80yê de, di navbera kurdan û dewletê de îtîfaqeke *de facto* hebû. Piştî 2000î ew îtîfaq hate xirakirin û li ser kurdan gelek zilm û tade hatin kirin. Pirsgirêkên di navbera ereban de heyî nehişt kes bibîne ku meseleyeke kurdan jî li vê derê heye. Û em îro dibînin ku ew dînamîk ne girêdayî Sûrîyeyê ye, girêdayî guherandinên herêmî ye.

Hûn dikarin ji kerema xwe meseleya 'guherandinên herêmî' hinekî vekin?

Taxa Kurdan a Sûrîyeyê her wext gelek bi doza Kurdistanê ve hatibû girêdan û di deh salên dawîn de tevgerên siyasî yên gelek xurt di navbera kurdan de hatibûn sazkirin. Civata kurdan ji alîyekî ve hate pelixandin, lê ji alîyekî din ve jî bi helwêstekê otonomîya civatê xistin destê xwe. Em karin bêjin ku, civata kurdan bu 'aktor'eke bi serbixwe, bi ditînek, bi çandeke siyasî ya serbixwe. Ev dînamîk e ku îro derfet dide, ku herêma kurdan bi awayekî giştî kete destên hêzên kurdan. Dawxazîyen van hezan û daxwazîyên hêzên ereb û leşkerên Cêşa Azad a Sûrîyeyê ne wek hev in. Di nav berxwedana eraban de, fikir û hereketên îslamî gelekî xurt in û armanca wan tenê ketina rejîmê ye. Lê ji bo kurdan fikra kurdayetîyê faktora herî girîng e.

Hûn pozîsyongirtina tevgerên kurdî a li hember rejîma Beas û mixalefeta ereb nîşan didin çawa dinirxînin?

Pir zehmet e ku meriv bikaribe tenê sedemekê ji bo vê yekê nîşan bide. Meriv nikare bêje, ji ber vê yekê ye, an ji ber wê yekê ye. Wezîyet pir tevlîhev e. Û bawer im, di destpêkê de stratejîya dewleta Sûrîyeyê ew bû ku, qet nebe di salên 2011 û 2012ê de li Kurdistanê zilmeke pir mezin çêneke. Ji ber ku nedixwestin gelê kurd ê Helebê û gelê kurd ê Şamê jî di nava mixalefetê de cîh bigirin. Lewra, di sala 2011ê de li Kurdistanê gelek numayîş çêbûn, lê qetlîamên weke li Hema û Loqumçayê çênebûn. Û ya diduyan; di ilmê siyasetê de tiştekî gelek naskirî heye: Wextê dewletek nikaribe gel kontrol bike, menfeeta wê ew e ku cihên ku nikaribe kontrol bike dev jê berde. **Îbnî Xaldûn**, di qirnê 15ê de dibêje, *"dewlet ne mecbûr e ku her derê kontrol bike, hin cîh hene cihên staretejîk in. Paytext cîheke stratejîk e. Rê cihên stratejîk in. Rêyên ku bajaran bi hev ve girêdidin stratejîk in. Çendîn bajar stratejîk in. Meriv heger nikaribe kontrol bike, meriv xwe vedikişîne..."* Û ev vekişandin ji bo Sûrîyeyê qerareke stratejîk e. Ji ber ku bi vî awayî dikare hîn rihettir qewetên xwe li bajarên din bi kar bîne. Û me ev yek li Helebê dît. Dibe ku sibê Sûrîye mecbûr bimîne ku hinek cîhên din jî biterikîne, wek jêra Sûrîyeyê, Dêrazor û hwd. Zehmet e ku meriv ji îro ve texmîn bike. Û faktoreke din jî ew bû ku bawer im Sûrîyeyê xwest bi vî awayî wezîyeta Tirkiyeyê gelek zeîf bike. Tirkîyeyê heta hezîrana 2011ê piştgirîya **Beşar Esad** kir. Piştî hezîran û tîrmeha 2011ê stratejîya Tirkîyeyê ji binî ve guherî û bawer im îro rejîma Sûrîyeyê bi vekişandina ji bajarên kurdan dixwaze gelek zerarê bide Tirkîyeyê, an jî Tirkîyeyê bitirsîne. Li vê derê aktorên kurd, PYD û yên din nexwestin bi temamî bibin parçeyeke mixalefeta Sûrîyeyê. Bawer im hinek ji wan ji mixalefeta Sûrîyeyê qismen ditirsin. Ew mixalefet, mixalefeteke sunî ye û bawerîya xwe jî bi wan naynin. Ji alîyekî din ve mixalefeta Sûrîyeyê pir caran dubare kir ku, li Sûrîyeyê pirsgirêka kurdî nîne, Kurdistanek tune ye û pirsa kurdan jî tune ye. Van xalan bawerî neda kurdan ku bi mixalefeta Sûrîyeyê re yekîtîyekê çêbikin. Sedemeke dawî jî ew e ku dibe ku kurd xwe wek parçeyeke Sûrîyeyê dîbînin, lê di heman demê de xwe kurd jî dibînin. Weke li Îraqê. Gelê kurd, li Îraqê tenê xwe wek îraqî hesab nakin. Xwe kurd hesab dikin. Û ev yek ji bo kurdên Sûrîyeyê jî derdikeve meydanê. Şerê ku heyî di navbera ereban de ye, ne şerê me ye. Lê belê em dikarin ji vî şerî îstifade bikin, îdareya xwe bigirin destê xwe, yan jî otonomîyeke *de facto* çêbikin.

Tam min dixwest werim ser wê xalê. Hêzên kurdî qala xweserîya demokratîk dikin. Li gor we çareserîya herî îdeal a ji bo kurdên Sûrîyeyê çi ye gelo? An jî kîjan faktor dikarin şekil bidin pêşeroja Sûrîyeyê?

Ew jî pir zehmet e ku meriv bikaribe bibêje. Ji ber ku tirsa min ew e ku di hemû herêmê de em bikevin pêvajoyeke dûr û dirêj a şidetê. Salên 1980yê wusa bûn. Di sala 1980yê de şerê Lubnanê hebû, yê Afganistanê hebû û şerê Îran û Iraqê hebûn. Di wê perîyodê de dînamîka herî girîng dînamîka şidetê bû. Tu bingeheke makro tesîr li ser balansên îktîdarê nekir. Lê belê hemû aktoran li Rojhilatê Navîn şidet bi kar dianîn. Û îtifaqên ku wê demê dihatin çêkirin îtifaqên zeîf bûn. Hinek caran heman aktoran di nava du sê rojan carekê de îtifaqên xwe diguherandin. Wextê ku meriv

Hamit Bozarslan

Hamit Bozarslan, di 11ê cotmeha 1958ê de li navçeya Licê ya Dîyarbekirê hatiye dinê. Di sala 1982yê ji bo perwerdahîya bilind berê xwe daye Fransayê û di 1986ê de ji Zankoya Lêkolînên Zanistî û Civakî, ji EHESSê (École des Hautes Études en Sciences Sociales) mezûn bûye. Hîn li heman zankoyê di beşên tarîx û sosyolojîyê de wek perwerdekar dersan dide. Dîrokzan û polîtolog Bozarslan, li ser pirsgirêka kurd, şideta siyasî, îslamîzm, dîroka Tirkiyê, Kemalîzm, dewlet û mînorîteyan û pirsgirêkên li Rojhilatê Navîn gelek makale û pirtûk nivisandine. Pirtûkên wî herweha li gelek zimanên cîhanê hatine wergerandin.

Hin pirtûkên Bozarslan ku hatine weşandin ev in:

-1997 La question Kurde (Pirsgirêka Kurd)

-2004 Histoire de la Turquie contemporaine (Dîroka Nûjen a Tirkiyê)

-2005 100 Mots pour dire la violence dans le monde musulman (100 peyvên ku di cîhana îslamê de şidetê îfade dikin)

-2007 L'Irak (Iraq)

-2008 Une histoire de la violence au Moyen-Orient (Li Rojhilatê Navîn mêjûya şidetê)

-2009 Le conflit kurde, Le brasier oubliée du Moyen-Orient (Pirsgirêka kurd, li Rojhilatê Navîn bizota jibîrkirî)



Kîto Sîno: **Kurdek di xewê de**, li ser textê boyaxa akrîlîk

li Sûrîyeyê mêze dike, di salên 1980yê de meriv şaş dibe. Hin caran bi şiîyan re ne, hin caran bi sunîyan re ne û hin caran jî bi xirîstyanên Lubnanê re ne. Ji ber ku ew bêîstiqrarî ewqas xurt e ku tu aktorek nikare staretejîyekê ji bo demên dirêj derxîne meydanê. Îro dibe ku em cardin bikevin wê wezîyetê. Û heger rejîm bikeve û wezîyeteke wisa derkeve meydanê, dê dînamîkên ku derkevin meydanê dînamîkên şer û yên şidetê bin. Dibe ku hemû aktor wê demê bikevin arenaya şidetê û şidetê bi kar bînin. Ez bawer nakim ku problemên sîstemê bi rêyên demokratîk hal bibin.

Gelo îhtîmalek bi wî rengî heye ku rejîm bikaribe xwe biparêze?

Ez pir bawer nakim. Lê belê meriv nikare paşerojê bibîne. Mesela, di sala 1991ê de tu kesî texmîn nedikir ku Sedam bikaribe li ser kar bimîne. Lê piştî wê demê hîn 12 salên din li ser kar ma. Li Sûrîyeyê stratejîyeke ku dewleteke nûseyrîyan çêbikin heye. Heger dewletek wisa çêbibe, dê dengeyên îqtidarê çawa derkevin meydanê, dê dengeyên nû çi bin? Meriv ji niha ve van tiştan nizane. Îro ne li Sûrîyeyê, ne li Îranê, ne jî li Lubnanê qetlîamên mezin hîn bi kar neanîne. Yanî meriv dikare texmîn bike, sibê heger wezîyet pir xerab bibe, wê çaxê Hizbullah, Musteza el Sadr an jî Malikî dest bavêjin rêya şidet ê. Hîn em di destpêka vê prosesê de ne. Gelek zehmet e ku meriv bibêje, dê ev pirsgirêk çawa pêş de biçin an neçin. Pir berbiçav e ku faktora şidetê û parçebûnê dê roleke mezin bileyizin

Di nav mehên derbasbûyî de tevgerên kurdî di nava xwe de Konseya Bilind a Netewî ava kirin û bêyî ku pevçûnek biqewime li Kurdistana Sûrîyeyê hin bajar xistin bin kontrola xwe. Rejîma Beasî li hember vê pêşveçûnê reaksîyon nîşan neda. Hûn vê yekê çawa dinirxînin?

Faktora girîng ew e ku heger dewlet nikaribe hemû niqteyan kontrol bike, wê demê dev ji hin mintiqeyan berdide. Yanî stratejîya împaratorîya osmanî jî ew bû, ya Fransa û Cezayîrê jî wisa bû. Stratejîya Îraqê ya li hember Kurdistana Başûr a di salên 90î de wisa bû. Çavtirsandin û êxistina zorê ya Tirkiyê, ne faktora sereke bû, ya biçûk bû.

Ev pêşveçûnên li Kurdistana Sûrîyeyê qewimîn li parçeyên din yên Kurdistanê zêde deng venedan, hûn vê rewşê çawa dinirxînin gelo?

Hem ji ber nezelalîya rewşê ye û hem jî 2-3 meh berê tişteke weha tune bû. Wezîyet hîn gelek nû ye û zelal nîn e. A duwem bawer im çavê herkesî li ser wê yekê ye ku, ka gelo dê li Helebê çi biqewime, li Şamê dê çi biqewime. Ji ber vê yekê, gelek kes ewle nîn in ku dê wezîyeta îro an ya sibê çi nîşanî wan bide. Û sedema sêyem jî ew e ku, li Kurdistana Tirkîyeyê gelek hedîse çêbûn, kurd bi van mijaran mijûl in. Hedîseya Îranê, wezîyet gelek xirab e û li alîyê din jî îmkanên kurdan ên ku li ber xwe bidin zêde nîn in. Bi awayekî giştî li Kurdistanê tirseke mezin heye. Îro wextê ku meriv li Îranê, Lubnanê, Îraqê û Kurdistanê mêze dike, bi awayekî giştî tirseke mezin heye. Û herkes dizane ku siberoj hîn zelal nîn e. Lê dîsa ez bawer im li Kurdistana Tirkiyê tesîreke gelek mezin çêkir. Gelek kesan li ser nivisandin, çûyîn û hatin hene, ez bawer nakim bi temamî bêdengîyek hebe. Li Kurdistana Başûr şabûnek çêbû. Yanî heyecanek ewqas mezin tune, lê bi tevahî meriv nikare qala bêdengîyekê jî bike. Di bînî de kêfxweşîyeke mezin heye

Li Kurdistana Sûrîyê jî weke ku li Başûrê Kurdistanê qewimî gelo dikare rewşeke de facto pêk were?

Li başûrê Kurdistanê hikûmeteke meşrû ya federe, ku hemû dewletên cîhanê (Tirkîye û Îran jî tê de) wê wek parçeyeke Iraqê nas dikin heye. Li Sûrîyeyê dibe ku ev yek zehmet be. Lê belê, li gelek cîhên din ên dinyayê hêzên *de facto* yên wekî hikûmetan hene. Mirov dikare texmîn bike ku li Kurdistana Sûrîyeyê jî herêmeke ku *de facto* xwedî îqtîdarê be peyda bibe.

Gelek caran tê gotin û nivisandin ku pevçûnên li Sûrîyeyê dikare bibe sedem ku gelek welatên din jî tevlî vî şerî bibin û îhtîmal heye ku rewş ber bi şerekî herêmî ve biherike. Hûn di vê der barê de çi difikirin? Rewşeke weha dikare balansên Rojhilatê Navîn çawa biguherîne?

Pir zehmet e ku meriv zanibe dê di demên pêş de çi biqewime. Lê belê, îro tu dewleteke Rojhilatê Navîn an jî dewletên din nikarin yan jî naxwazin rizîkoya şerekî mezin bidin ber çavên xwe. Lê belê weke min got, dibe ku hedîseyên biqewimin (wek şerekî li hundirê Lubnanê, li Iraqê, yan jî şerek bi Îranê re) karibe statûkoya îroyîn bişkîne.

Ev qewimîn û pêşveçûn dikare li ser pêşîdema pirsa kurdî tesîreke çawa çêbike? Ji bo çareserîya pirsa kurdî dikare çi fersend an xetereyan derxîne meydanê?

Ez di wê qenaetê de me ku tu planeke Amerîkayê ya ji bo Rojhilatê Navîn tune ye. Planên dawîn planên Bush bûn, ew jî têk çûn. Bawer im, Amerîka, Îsraîl, Fransa û Almanya ne li benda van guhertinên dawîn bûn. Planên wan weha bûn; heger rojekê Husnu Mubarek bimire, em ê çi bikin? Nizanim kî bimire em ê çi bikin? Dîtineke pir dirêj tunebû û xwuya ye rêveberîya Obama pir jî pêşîya xwe nabîne. Di vî warî de dişibe dema Clinton. Xwuya ye li gel Demokratan problemek heye. Dîtina wan a ji bo demên siberojê pir kurt e. Û ji bo Kurdistanê jî eynî tişt e. Îro herkes dizane ku Tirkîye nikare bikeve Kurdistana Sûrîyeyê. Heger biketanayê dê hem ji bo Tirkîyeyê hem jî ji bo Sûrîyeyê pir xerab bibûya. Meriv nizane heger rewşeke *de facto* çêbibe dê sibê Amerîka piştgirîya kurdan bike an neke. Ez bawer nakim tu dewleteke ku di van meseleyan de xwedî stratejî be nîne. Ne ji bo kurdan û ne jî ji bo Rojhilatê Navîn .

Baş e mamoste, kurdên Sûrîyeyê an PYD çima xweserîya demokratîk dixwazin, ne federasyon, ne tiştekî din. Li gor we heger meriv îro şert û mercên kurdên Sûrîyeyê bide ber çavan, çareserîya herî maqûl ev e gelo?

Ev pirs pir siyasî ye, loma naxwazim bersiva pirseke pir siyasî bidim. Baş dikin an nakin, li ser wê fikreke min tune ye. Tenê niqteyek li ber çavan e, ew e ku di şertên îroyîn de bawer nakim îmkan hebe ku kurdên Sûrîyeyê ji Sûrîyeyê veqetin. Dikarin weke ku li Îraqê statûyeke formel bigirin. Ango zimanê kurdî zimanê kurdî be, mintiqeyên kurd mintiqeyên kurd bin, kurd xwe bi xwe biparêzin… Pir ne bawer im ku li gor îmkanên îro veqetîna ji Sûrîyeyê mimkun be. Îcar ez nizanim dê demên pêşî çi nîşanî me bide. Heger sibê mesela dewleteke nûseyrîyan bê çêkirin, ew ê bê wê maneyê ku şerê di navbera sunî û şiîyan de dê berdewam bike.

Li gor we heger pêvajo ber bi wir ve here, dê rayagiştî ya navneteweyî dewleteke nûseyrîyan çiqas hezim bike?

Wê qebûl bikin an jî nekin, loma ez dibêjim demên pêşî zêde zelal nîne. Ez bawer nakim ku cemaeta navneteweyî dewleteke nûseyrîyan qebûl bike. Di fiîlîyatê de dê çi biqewimin, fikreke me li ser vê yekê nîne. Heger îro dewleteke nûseyrîyan çêbibe, bawer im dê ji bilî Îran û Rusyayê kes wê qebûl neke. Dê Çîn jî qebûl neke, ji ber ku ji bo Çînê jî xeter e. Lê meriv dema li Lubnanê mêze dike, dewlet li beşek Lubnanê nîne, Hizbullah li wê derê ye. Lewra ji bo rewşên weha dibêjin, *'quasi state'*, yanî *hema hema dewlet*. Tiştekî resmî nîne, lê fiîlî ye. Meriv nikare bê vîzeya Lubnanê biçe wir. Lê belê hêzên ewlekarî yên Lubnanê jî hema hema li wê derê nînin. Dema mirov li wezîyeta Malîyê mêze dike, hema hema eynî tişt e. Dikare guherandinên fiîlî çêbibin û bingehên wan ên hiqûqî jî tune bin. Dibe ku li gor hiqûqa navneteweyî neyên qebûlkirin, lê belê wezîyeteke bi vî rengî jî ne zêde dûr e. Ji bo Kurdistanê jî wisa ye. Herêma kurdan di destê wan de ye...

Çareserîya maqûl...

Çareserîya maqûl ew bû ku li Sûrîyeyê rejîm biketa û Sûrîyeya sibeyîn ne li ser bingehên mezhebî, lê li ser bingehên demokrasîyê bihata avakirin. Lê îro perspektîvên wê guherandinê ji min re pir ber bi çav nînin. Yanî belkî em bikevin perîyodeke pir xirab. Perîyodeke ku deh salan bidome û meriv nikaribe pêşîya xwe bibîne. Dengeyên makro neguherin, yan jî bi şeklekî mezin neguherin. Wê demê herkes dê di arenaya şidetê be. Salên 80yî wisa bûn, Yanî tirsa min ew e ku careke din jî em bikevin wê perîyodê.

Mamoste dema meriv îro li balansên navneteweyî dinêre, têkilîyên siyasî dinêre, kîjan dewlet dikarin bibin mutefîkên xwezayî yên kurdan?

Ew jî pir zehmet e meriv cewaba wê bide. Dema ku meriv salên 2000î bigre dest, wê demê sîstemek hebû. Rol û îtîfaqa Sûrîyeyê, Tirkîyeyê û Îranê li ber çavan bûn. Amerîkayê li ser mesela kurdan geh destûr dida Tirkîyeyê geh jî nedidayê. Roleke pir muhîm ya Ewropayê li Rojhilatê Navîn tune bû. Li ser Îsraîlê tu tesîra dewleteke mezin tune bû. Û Amerîka çi bixwesta Îsraîl dikir. Meriv dikare bêje, sîstemeke mehellî hebû li Rojhilatê Navîn. Îro meriv dibîne ku ew sîstem têk çû. Îtifaqa Tirkîye û Sûrîyeyê, Tirkîye û Îranê xilas bû. Polîtîkaya Misirê ya li hember Îsraîlê dê sibê çawa be kes nizane. Gelek kevir ji cihê xwe leyistin. Meriv nizane dê piştî van çi biqewime. Û îro ez ne bawer im ku tu dewletek amade be ku Kurdistanê nas bike. Û ez bawer nakim tu dewletek dîsa rasterast li dijî kurdan derkeve. Ji ber ku kurdan di meseleya Iraqê de alîkarîya Amerîkayê kirin, prestîja wan di çapemenîyê de gelek zêde ye û meseleya kurdan herkes pê dizane. Lewma ez bawer nakim dewletek rasterast karibe di nav dewletên mezin de li Kurdistanê xwedî derkeve. Û ez bawer nakim ku yek jî bikaribe rasterast piştgirîya wê bike.

Îro li başûr dewleteke kurdî bê ragehandin dewletek nîne ku wê nas bike?

Nexêr, tevî Amerîka ti welatek tune ye. Lê belê gelek tişt dikarin di pêşedemê de biguherin. Ez bi wê yekê nizanim. Yanî îro-sibê li Başûr dewletek bê îlankirin, ez bawer nakim tu kes wê nas bike. Ew nayê wê wateyê ku hin kes bikaribin bi rihetî jî êrişî Kurdistanê bikin. Meriv vê yekê dikare li Sûdanê jî bibîne. Çêkirina Sûdana Jêrîn 20-30 sal girt. Û îro mirov li Malîyê heman tiştî dibîne. Di gelek cîhan de wisa kirine. Li gor hiqûqa navneteweyî, dewleteke piştî ku *de facto* çêbibe, wê çaxê meriv wê nas dike. Heta ku ew rewşa *de facto* çênebû û ***heta ku dewleta jê hatî veqetandin wê nas neke, ew dewlet nayê nas kirin***. Sûdana Jêrîn hate naskirin ji ber ku Sûdanê bixwe ew nas kir. Tenê li Malîyê wezîyet eynî nîne. Îstîsnaya vê yekê tenê Kosova ye. Ew jî ji ber ku hema hema wezîyeteke jenosîdê hebû. Yan jî tirsa jenosîdê hebû. Loma li Yûgoslavyayê xistin û loma deh sal paşê Kosova hate naskirin.

Zor spas.



Kîto Sîno: **Acizî**, li ser kartonê, boyaxa akrîlîk

www.chiyanarchive.com

Tevî ku gihîştina deverê bi tehlûke ye, gelo mirov dikare çawa agahdar bibe ji serhildaneke ji hijdeh mehan û vir ve dewam dike? Erê şik û guman ji hovîtîya rejîmê nayên kirin, lê belê awayê ku hin sazîyên çapemenîyê bêyî ku piştrast bikin daxuyanîyên filan û bêvan koma mixalif belav dikin û dikin ku lîstîkên hêzên mîna Erebîstana Suûdî, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê yan jî Tirkîyeyê xuya nekin, ev yek jî ji agahdarîyê bêhtir propaganda ye.

Tevlîhevî û dezînformasyon

Sûrîye, qada şerê çapemenîyê

Marc de Miramon û Antonin Amado *

Le Figaro agahdar dike ku li Sûrîyeyê "*çekên kîmyayî di kontrola hêzên taybet ên amerîkî yên ji bo pêşîgirtina belavkirina wan wezîfedarkirî de ne*" (22yê tîrmeha 2012ê). Dîplomatekî li Urdunê wezîfedar jî hişyar dike: "*ya ku dikare rê li ber destwerdaneke amerîkî ya bihedef veke, tehlûkeya sîlehên kîmyayî ye*." Va ye ji nû ve li Şamê bi çend guhertinên piçûk ên bêqîmet em noqî nav heman senaryoya berîya bi deh salan li Bexdayê nivîsandî dibin. Gelo **Beşar El-Esed** wê çekên xwe yên tunekirina girseyan li dijî muxalifên xwe bi kar bîne? Ev gunehbarî bi xwe ji gelek mehan û vir ve darîçav e. Hê di meha îlona sala 2011ê de malpera **Bernard-Henri Lévy** ev nûçe dinivîsî: "*kujerên Esed li herêma El-Restan a nêzî bajarê serhildêr Humisê operasyonên hewayî dan destpêkirin û pêre jî gazên jehrî bi kar anîn.*" (1)

Ajansa nûçeyan bi dîqeteke îstîsnayî 27ê tîrmeha 2012ê weha nivîsî: "*AFPyê li herêma Hemayê ev îddîa ji bi dehan kesên pêre peyivî bihîst. Lê belê tevî lêkolîneke hefteyekê ajotî jî tu mezinê serhildêran, tu serekeşîrî, tu şervanê ji rêzê yan jî sivîlî nikarîbû delîleke nikare were pûçkirin nîşan bidin.*" Encama ku ev nûçe gihiştîyê digot, şerê li Sûrîyeyê "*herweha şerekî agahdarkirin û dezînformasyonê ye*".

29ê çileya 2012ê, bi belavkirina agahîyên beredayî û şaş bandorkirina li ser mejîyan ji hesabekî Twitterê (@Damascustweet) yê ser bi "*milîtanên nêzî muxalefetê*" (2) derket: li gorî gotinan El-Esed ji Sûrîyeyê revîyaye, *Artêşa Azad a Sûrîyê* (AAS) dor li qesra serokdewletîyê girtîye û dîktatorê çîzkirî hewl daye xwe tevî jina xwe û zarokê xwe, tevî bar û bagajên xwe bigihîne balefirgeha navneteweyî ya paytextê da ku penaya xwe bigihîne Moskovayê. Mirov nikare li rastîya wê bipirse, lê belê dîsa jî malpera *Nouvelle Observateur*ê dibêje "*gotegot bêbingeh nîne*": "*li gorî nûçegihanê BBCyê yê li Rojhilatê Navîn* ***Jeremy Bowen*** *AAS bi tenê sîh deqîqeyan dûrî qesra serokdewletîyê ya Beşar El-Esed e. Ev rewşeke eskerî ye ku dikare zextê li dîktator bike da ku bireve...*" (3)

18ê tîrmeha 2012ê, di heman demê de ku êrîşeke nû ya serhildêran rê li ber vekir ku li Şamê şer bigihêje asteke berê nedîtî, bombeyek li Navenda Konseya Neteweyî ya Ewlekarîyê ya Sûrîyê teqîya. Di êrîşê de wezîrê bergirîyê **Asif Şewket**, ku di heman demê de zavayê El-Esed e, hat kuştin. Li ser kanalên televizyonê yên fransî nûnerên muxalefetê, nexasim jî yên ji Konseya Neteweyî ya Sûrîyeyê (CNS) bûyerê di weşana zindî de şîrove dikin. Ew wisa bawer dikin ku ev saetên dawîyê yên rejîmê ne. Seroka koalîsyona laîk û demokratîk a Sûrîyeyê û endama CNSyê Randa Kasîs dibêje "*belê, em dikarin bibêjin ku ev destpêka dawîyê ye*" (4) Çavkanîyên anonîm ên ku rojnameya *The Guardian* ji ber wan girtîye, îddîa dikin ku El-Esed bi xwe di êrîşê de birîndar bûye. Jina wî careke din bi balefirê çû Moskovayê. AASyê û herweha komikeke îslamî berpirsîyarîya êrîşê girtin ser xwe, rejîm bi xwe destên *"hêzên bîyanî*" têde dibîne yên ku destekê didin muxalefeta çekdarî (Tirkîye, Qetar, Erebîstana Suûdî...).

El-Esed ê sax filitî wê qebûl bike du rojên din paşê "biçe", "*lê belê bi awayekî medenî*". Ev nûçeyeke ajansa nûçeyan a fransî ***Agence France Presse***ê (AFP) ye ku roja 20ê tîrmehê hema berîya saet 9ê belav dike. Piştî bi sîh deqîqeyekî reqîba wê yê brîtanî ***Reuters***ê ev nûçe piştrast kir, ku ev agahî xwe disipêre hevpeyvîneke *Radio France internationale* (RFI) bi sefîrê Rûsyayê yê li Fransayê re. Ew qet behsa çûna El-Esed nake, lê belê qîma xwe tîne pê ku angajmana Sûrîyeyê roja 30ê tîrmehê li Cenevreyê girtî ser xwe ya çûna "*ber bi rejîmeke demokratîktir ve*" bi bîr bixe ...

Ya ku xelkê Sûrîyeyê ji bo wê ji adara 2011ê ve şer dike demokrasî ye û ji ber vê yekê jî serhildana gel bi hovîtîyeke xedar a têra xwe belgekirî tê tepisandin. (5) Lê belê şer herweha li qada çapemenîyê jî diqewime; şerekî ku pirranîya sazî û dezgehên çapemenîya rojavayî behsa wî nakin. Bêguman, rastîya li cihê cih bi taybetî jî zehmet e mirov lê serwext bibe. Rejîm bi xwe vîzeyên xwe bi hesabê daneyan dide. Yên ku canê xwe dixin tehlûkeyê û di gihîştina serhildêran de bi ser dikevin, tevahîya wan yan jî hema hema tevahîya wan heman tevnên AASyê bi kar tînin; gotina wan berîya her tiştî piştgirîya *storytelling* a AASyê û herweha parêzvanê wan ên tirk, suûdî û qetarî bipêşxistî dike: rejîmeke hov xwepeşandanên aştîyane di nava xwînê de diperçiqîne, milîtanên hevalbendê demokrasîyê van xwepêşandanan diparêzin, ew diwêrin, wêrek in, xwedî cesaret in, lê belê hertiştê wan ê din kêm e: sîleh, cebilxane, derman...

Herçî çendek rojnamevanên vexwendina rejîma El-Esed qebûlkirî ne (6), bêyî ku me matmayî bihêlin ew behsa serhatîyên bi tevahî guhertî dikin: serhatîyên cendekê eskeran ê bi tevahî hatin parçekirin yên ku li morgên nexweşxaneyan di ser hev de kom dibin, hindikahîyên (xirîstîyan, elewî, û hwd.) ku rastî terora çeteyên çekdarî tên û ev çete şerekî azadîyê bi rêve nabin, ew bi alîkarîya monarşîyên petrolê yên Kendavê şerekî gerîla yê mezhebî bi rê ve dibin.

Di navê de hinekên xwe weke ***El-Qaîde***yê jî didin nasîn jî hene, hebûna komên cîhadîst li Sûrîyê êdî piştrast bûye û ev yek muxalefeta çekdarî fihêtkar dike. Rojnameya *La Lîberation* kite bi kite dinivîse ku ev yek jî sedemeke ji bo "*alîkarîya sîyasî û eskerî*" ya bi serhildêran re "*wê qet nebe ji ber wê sedemê be da ku qadê vala nehêlin û serketina dawîyê ji îslamîstan re nehêlin*".
Cihêkirina genimê baş ê şoreşgerî ji gîyayê bêkêr û bizirar ê cîhadîst carinan karekî zor û nazik e. "*Mucahidê berîya bi çar mehan ji bo tevlî serhildana li dijî rejîma Beşar El-Esed bibe ji herêma derdora Parîsê da rê*" Abou Hajjar xwe weke "*çalakgerekî îslamî, lê belê ne weke cîhadîstekî nêzî El-Qaîdeyê*" terîf dike. Ew ji rojnameya *Le Figaro* re dipeyive û sûnd dixwe ku "*hindikahîyên xirîstîyan û elewî*" yên ku bi piranî destekê didin rejîmê li Sûrîyeya siberojê "*wê di parlemanê de nûnerîya wan hebe*". (7) *Le Fîgaro* herweha îşaret pê dike ku "buroyeke waezan" li gundê Serceh hatîye vekirin da ku "pirtûkên qedexe" yên **Ibn Taymîyya** "*teorîsyenekî mezin ê cîhadê*" werin belavkirin, dema vê bi bîr dixe qet behs nake ku ev nivîskar herweha nivîskarê fetwayekê ye ku banga cîhadê li dijî elewîyan dike.

Lê belê ev çend îfade dramatîk bûbe jî, bûyerên li ser dikê diqewimin kêm nakin: ji hewayê bombekirina Humsê, komkujîya Hûlayê, kuştina rojnamevan Marie Colvin, Rémi Ochlik û Gilles Jacquier – ê ku îro weha dîyar e ew bi guleyên ji kozik û çeperên serhildêran hatîye kuştin. Komek sazîyên çapemenîyê li ser gotin û derbirrîna serhatîya şerî serwer in. Di nava wan de kanalên sereke yên satelîtî yên Rojhilatê Nêzîk ango ***El Erebîya*** û ***El Cezîre***, ku milkên du hêzên herî xurt ên lîga ereban in ango hoparlorên nû yên dîplomasîya Kendavê ne: Erebîstana Suûdî û Qetar. Ev monarşîyên mutleq ên ku xwe nasipêrin tu rewabûna demokratîk, bi ser de jî "azadîyê" li cem cîranên xwe teşwîq dikin, "şerekî sar ê herêmî" bi rê ve dibin li dijî Sûrîyeya ku li gorî wan rejîma dawî ya ereb e ku beşek ji "tewereya şîî" ye ew tewereya ku êdî ji Beyrûdê heta bi Bexdayê diçe, hemin di Bahreynê re jî derbas dibe.

Herçî bawerîanîna bi agahîyên weşanên wan in, ev kanalên televizyonê ji serî ve ji xêrxwazîyekê îstîfade dikin, ev agahî çiqasî xeyalî dibin bila bibin jî. Nivîskara ceribandinan **Caroline Fourest** bi vî rengî di *Le Monde*ê (25ê sibata 2012ê) de dinivîse: "*li gorî El-Erebîyayê muxalifên rejîma Îranê îdîa dikin ku hukûmeta wan firineke şewitandina laşê mirovan daye hevgira xwe Sûrîyê. Li gorî îdîayê ev firin li qada pîşesazîyê ya Helebê hatîye bicihkirin û bi tevahîya lez û kapasîteya xwe dixebite... da ku cendekên muxalifan bişewitîne?*"

Dîktatorîya ragihandina kêlîyê

Ji bo ya mayî, çapemenî xwe disipêre Şopandina Mafê Mirovan a Sûrîyeyê (ŞMMS), sazîyeke ku bi rêya ajansên çapemenîyê AFP, AP û ***Reuters***ê bîlançoyên şer û daxuyanîyên muxalefeta çekdarî radigihîne. Damezrênerê wê **Rami Abdel Rahman** dibêje ew sala 2000î koçberî Melîktîya Yekbûyî bûye, li wir ew xwedîyê dikaneke firotina cilûbergan e. Ji mala xwe ya li ***Coventry***, ew îddîa dike, dibêje "*yekane endamê rêxistina xwe ya li Ingilîstanê me. Lê belê dused agahîdêrên min ên bi dil dixebitin li Sûrîyeyê, Misirê, Tirkîyeyê û li Libnanê hene. Ev esker in, bijîşk in, milîtanên muxalefetê ne*". Ew îddîa dike ku bi tevahî serbixwe ye: "*tu kes min fînanse nake. Min ŞMMS sala 2006ê damezrand, lewma min dixwest tiştekî ji welatê xwe re bikim.*" Bi alîkarîya sekreterekî asayî, ew çawa dikare hejmarên (ên kuştî û birîndaran) şerên eskerî li çar alîyên welêt di dema diqewimin de bi dest bixe û kontrol bike?

AFPyê bi xwe statûya çavkanîya destjênabe da ŞMMSyê, çawa ku **Îzedîn Seîd** kite bi kite dibêje: "*yekemîn bikaranîna ŞMMSyê diçe heta bi çirîya paşîn a sala 2006ê. Vê rêxistinê di rabihurîyê de piştrast kir ku bawerî pê tê, ji ber vê yekê jî em wê hê bi kar tînin.*" Serredaktorê buroya ajansê ya li bajarê Qibrisê Nîkosayê, li cihê ku nûçeyên ji Rojhilatê Nêzîk lê dicivin, weha li xwe mikur tê "*li cihê cih tu pêwendîya rojnamevanên me bi nûçegihanên vê rêxistinê re nîne. Yên ku li Şamê ne, nikarin serbest bixebitin. Ji wan nayê ku dîmenekî giştî yê rewşa li seranserê welêt ragihînin. ŞMMSya ku di danezanên xwe de qet bi awayekî sîyasî angaje nabe, çavkanîyeke bêqisûr nîne. Lê ya ku li ser hejmarên kuştîyên li cihê cih agahîyên herî kêm xeyalî û lihevçêkirî dide ew e*". AFP nerehetîya xwe venaşêre, nûçegihanekî mezin ê beşa navneteweyî weha gazinên xwe dike: "*em baş pê dizanin ku bawerî bi ŞMMSyê nayê. Lê belê dîsa jî em weşana hejmarên wan dewam dikin. Dema ku em ji birêveberîyê dipirsin, bersiva wê qet naguhere: 'bi îhtîmaleke mezin xebera te ye, lê ajansên din jî heman tiştî dikin. Û sektora me sektorek e ku reqabet lê gelekî xurt e.* "

Awayê ku weke mînak ŞMMSyê komkujîya li Hûlayê veşart, dike ku mirov gumanan bike ji bêalîbûna wê ya ew îddîa dike heye û heta ji bawerîanîna bi nûçegihanên wê bi xwe jî. Di gulana 2012ê de li Hûlayê 108 kes hatibûn qetilkirin. Bedenên 49 zarokan û 34 jinan li erdê dirêjkirî bûn li vê devera ku gelek gundan dihewîne û li bakurê bajarê Humsê ye. Di danezaneke roja 26ê gulanê de ku AFPyê jî belav kir, ŞMMS pêşî radigihîne ku 90 kes di bombebaranê de hatine kuştin. Çavdêrên wezîfedar ên Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (NY) û Lîga Ereb 29ê gulanê îdîa kirin ku piranîya kuştîyan bi sîlehên asayî hatine kuştin. Neteweyên Yekbûyî heman rojê eşkere kir ku devera komkujî lê pêk hatî di destê hêzên serhildêr de bû.

Tu çavkanîya serbixwe û hêjayî bawerîpêanînê nikare îro bibêje ka bi rastî li Hûlayê çi qewimî. Lê belê ev yek li pêşîyê nebû asteng ku danezana destpêkê ya ŞMMSyê bi awayekî berfireh were weşandin û ji alîyê dîplomatên fransî ve ji bo li Konseya Ewlekarîyê ya NYyê serîtewandina li Rûsyayê were bikaranîn, wezîrê karê derve **Laurent Fabius** di hevpeyvîneke bi *Le Monde*ê re hêvîya xwe derdibirrî: "*komkujîya li Hûlayê dikare bike ku mejî û aqil serwext bibin*" (29ê gulana 2012ê).

Donatella Rovera ya ku ji bo ***Amnesty Internationalê*** dixebite, nîsan û gulana bihurî bi awayekî qaçax çû Sûrîyeyê û sê hefteyan lê ma da ku bîlançoyeke insanî ya şerî amade bike. Ew îşaret bi zorî û zehmetîya vî karî dike: "*nexweşxane ne ew çavkanî ne ku mirov karibe bawerîyê bi wan bîne, lewra birîndar nikarin biçin nexweşxaneyan bêyî ku hêzên ewlekarîyê wan rawestînin. Di dema operasyoneke pir mezin de ez li Helebê bûm. Malên tenduristîyê yên xizan û lihevçêkirî min di apartimanan de dîtin ku bijîşkên malzemeyên wan kêm hewl didin êşên birîndaran sivik bikin û wan derman bikin. Di van şertan de amadekirina bîlançoyan hêsantir e. Dema ku mirov piştî bûyerê digihêje deverê divê îfade û şahidîyên kesên saxfilitî, cîranan kom bike, şûn û şopên li devera bûyerê hatî hiştin yên weke teqînên topên obus yan jî şûna guleyan li ser dîwaran tesbît bike.*" Û divê were binxêzkirin ku "*mumkin e mirov ji derveyî welêt ve bixebite, lê belê hingê zehmetîyên din jî li zehmetîyên heyî zêde dibin. Nexasim bawerîanîna bi çavkanîyên ku mirov baş nas nake û dibe ku hewl bidin me manîpule bikin*". Dawîya tîrmehê Amnesty Internationalê hejmara kuştîyan weke 12 000 dîyar kir, li hemberî vê, hejmara ŞMMSyê 19 000 e. Teqezîya ku NGOya navbirî îddîa dike bi hejmarên Abdel Rahman derdixe pêş re li hev nakin. Berîya her tiştî ev teqezî li hev nake bi dîktatorîya hejmarên di cîh de diyarkirî re ku êdî li ser aborîya medîyatîk û nexasim jî ya tevnên wê yên dîjîtal ferz e.

* Rojnamevan

(1) "Syrie : la révolution s'arme et a besoin de l'OTAN/Sûrîye: şoreş xwe çekdarî dike û pêdivîya wê bi NATOyê heye", 30yê îlona 2011ê, www.laregledujeu.org

(2) "Bachar Al-Assad s'est enfui... sur Twitter/Beşer El-Esed revîya ... li ser Twitterê", 30yê çileya 2012ê, www.lepoint.fr

(3) "Bachar Al-Assad a-t-il tenté de fuir la Syrie vers Moscou?/Gelo Beşer El-Esed hewl da ku ji Sûrîyeyê bireve Moskovayê", 30ê çileya 2012ê, tempsreel.nouvelobs.com

(4) "Bataille de Damas : les jours d'Assad sont-ils comptés?/Şerê Şamê: gelo rojên Esed jimartî ne?", "Le Débat", France 24, 19ê tîrmeha 2012ê.

(5) "L'archipel des tortures/koma giravên êşkencê", Human Rights Watch, New York, 3yê tîrmeha 2012ê.

(6) Weke mînak *bigire li ber*hevpeyvînên Patricia Allémonière kirî û meha tîrmehê li ser ekranên TF1ê hatin weşandin.

(7) "Abou Hajjar, combattant français en Syrie/Ebû Hecer, şervanê fransî li Sûrîyê", *Le Figaro,* Paris, 4 û 5ê tebaxa 2012ê.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Van dehsalên derbasbûyî ji bilî navendên hêzê yên dîrokî, hêzên nû derketin holê, û ev yek birêvebirina dosyayên navneteweyî hê bêhtir zehmet dike: bazirganî, hawîrdor, tewazunên stratejîk, hwd. Ji G20ê heta bi konferansên li ser bahewayê, civînên piralî zêde dibin. Lê belê ew encamên hêjayî dîtinê dernaxin holê...

Dîn û harbûneke cîhanî ya civînan

Zêde civînên bilind, civînên bilind dikujin

Jonas Gahr Støre *

Nakokîyeke ecêb a sîyaseta navneteweyî heye. Em di serdemeke hevkarîyê û pevguherînê ya berê nedîtî de ne: dîplomat, pispor û biryardêr fikr û projeyan ji her demê bêhtir parve dikin. Birêveberê hê nû ji wezîfeyê veqetîyayî yê Bankeya Dinyayê behsa nîzama nû ya navneteweyî weke tevahîya "girêdanên zirav ên pergaleke piralî ya ku dewletên hikimran bi hev ve girêdide" dike. Em rêxistinên nû yên piralî [ji ber ku pir zêde ne] êdî hew dihejmêrin, û êdî bi me weha ye ku li ser hertiştî û çi dibe bila bibe civînên bilind tên lidarxistin. Dîsa jî heke em encamên bidestketî li ber pirbûna çalakî û enerjîya lêçûyî bigirin, ew ê bi tenê me ecêbmayî bihêle bi qelsîya xwe: heyfa me pê were yan jî kêfa me jêre were ne xem e, xeleka Dohayê ya ku Rêxistina Bazirganîyê ya Dinyayê (RBD) ew angaje kirîye, xetimîye û asê maye; bi tenê bipêşketinên piçûçik di reforma Konseya Ewlekarîyê ya Neteweyên Yekbûyî de hatin biserxistin (1) û em hê gelekî dûr in ji bersivdayîna çend pirsgirêkên mezin ên roja me ya îro yên weke guhertina avhewayê yan jî kêmkirina çekan.

Evqas hewldan ji bo encamên evqas kêm û qels... Ev semptoma "birêverîyeke global" a ketî nava serdemeke serwerîya civînan e. Tevî ku divê sazîyên liserxwetir û bêhtir gerdûnî werin avakirin, ma ji bo çi evqas tevnên navneteweyî yên ewqasî ji hev belav û xirab koordînekirî werin avakirin?

Rêxistinên neguncaw

Serwerîya civînan hemin xwedî avantaj e jî. Cîhaneke di nav xwe de bi hev ve girêdayî lê belê jinavendîbûnêkirî, pêdivîya wê heye bi parastina asteke baş a dîyalogê, bi hebûna mekanên hevdînê û bi çerxên koordînasyonê. Mirov bicive baş e, lê belê mirov zêde bicive ev vediguhere tiştekî dijhilberîner. Pir zêde civîn dibe ku îşaret bikin bi pir kêm bipêşketinê, lewra di dawîyê de mirov ê tevlîbûnê bi tenê weke têrker bibîne. Bi tenê hazirbûn wê di dawîyê de bike ku em ji peydakirina çareserîyan mehrûm bimînin. Serwerîya civînan dike ku em bêhtir bixebitin, lê belê maneya vê ne ew e ku em ji sedî sed aqilanetir dixebitin.

Çawa di dawîyê de em gihiştin vê rewşê û ev rewş wê çawa were rastkirin? Rêxistina navneteweyî ya herî kevin sala 1815ê hat damezrandin: Komîsyona Navendî ya ji bo Kêştîajotina li ser Renê. Di sedsala 19ê de bi tenê wê çendeke din bihatana damezrandin, piranîya wan xwedîyê erkên pir bisînorkirî bûn. Kontrasta bi rewşa heyî re hêjayî dîtinê ye: ji du sed û pêncîhî bêhtir rêxistinên nav-hukûmetî û herweha bi sedan civînên bilind ên navneteweyî û konferansên asayî hene, piranîya wan di nava bîst salên derbasbûyî de derketin holê.

Di nîvê yekem ê sedsala 20ê de yên ku reng dan mîmarîya sîyasî ya dinyayê û ew veguherandin, şer û guhertinên sîstemîk ên desthilatdarîyê bûn. Piranîya sazîyên girîng ên qanûn û rejîmên niha heyî, yekser encama hevdîtin û muzakereyên piştî du şerên cîhanê ne: Neteweyên Yekbûyî, Fona Pereyan a Navneteweyî (IMF), Bankeya Dinyayê, Danezana Gerdûnî ya Mafê Mirovan...

Di nava sê dehsalên bihurî de dinyaya me bi bûyerên herî kêm bi qasî qelşên sedsala 20ê girîng, hejîya. Beridîna bazirganîya navneteweyî, awayên serfkirinê, navgînên ragihandinê; deregulasyona [xirabûna nîzamê] aborî ya bazaran û herikîna sermayeyê; lê belê herweha dawîhatina li dinyaya duqutbî û derketina holê ya aborî û sîyasî ya welatên mîna Çîn, Hindistan û Brezîlyayê...

Encamên van serûbinîhevbûnan hem ji bo welatîyan û hem jî ji bo hikûmetên wan yan jî cîhana karsazîyê kûr û girîng in. Ew pêdivîya bi koordînasyoneke xurtkirî lezgîntir dikin. Ew xwe bi qelş û qutbûnên pir mezin yan jî darîçav ên mîna şer û felaketan îfade nakin: ew pir bêhtir her bi pêş ve diçin; "civaka navneteweyî" jî bi qasî ku diviyabû bi lez bersiv neda ji bo ku amûr û nîzamên guncaw biafirîne.

Li şûna ku li amûrên saxlem û daîmî bifikirin, weke ku biçin hawarê, dewletan çerxên adaptasyonê pêk anîn. Ji mîmarîya navneteweyî nehat ku xwe ji bo rûbirûbûna bi pêvajoyên aborî û civakî yên globalbûnê re biguhere. Bi awayekî din em bibêjin, dinyaya me bi mesafeyeke her diçe mezintir a di navbera pirsgirêkên aborî, dîplomatîk, çandî yên globalbûyî û nîzameke jeopolîtîk ya nazikbûyî de terîf dike. Pevguherîn bi pêş dikevin, ev fenomeneke girîng û bikêr e, lewra ev pevguhertin destûrê didin bipêşketinên qada aborî, ya tenduristîya giştî û ya çareserîya pasîfîk a pirsgirêkan. Lê belê ya ku wê koordînasyona ji bo birêkûpêkkirina vê bipêşketinê pêwîst dabîn bike, ne zêdekirina civînên bilind e.

Civîn biha ne, em gelek caran vê ji bîr dikin. Lêxerckirina evqas dem û enerjîyê ji bo sazkirin û dewamkirina tevnên di navbera hikûmetan de û pêkanîna civînan bivênevê îşaret pê dike ku dema me ji bo em bi pirsgirêkên kilît re bilebikin û biryaran bidin, kêm e. Ha ji ber vê yekê civînên me yên pirhejmar encamên evqasî kêm û xirab didin.

Di nava pergaleke evqasî belav û beşbeşî de rêxistinên sereke û civînên girîng bi erkên diyar û zelal ên ku wê destûrê bidin wan bi awayekî bibandor berê xwe bidin pirsgirêkên mezin, nayên wezîfedarkirin. G20 a ku pirî caran weke navenda nû ya sîyaseta cîhanê behsa wê tê kirin, ne xwedîyê erkeke diyar e, çerxên wê yên biryardayîna kolektîf û berpirsîyarkirinê jî nînin. Gelek rêxistinên ku meyildarê serwerîya civînan in wekî din jî bi awayekî ciddî rewabûna wan kêm e.

Di dinyayeke dewletên serbixwe de para bêhtir li gorî hebûna derfeta welatan a ji bo ku fikra xwe ya li ser mijarê bidin bihîstin, hikmê rewabûna biryareke sîyasî tê dayîn. G20 mînakeke baş a lawazîya strukturel a sazî û dezgehên bi vî rengî ye. Tevî ku endamên wê % 80yê Hilberîna Hundir a Nesafî (HHN) ya dinyayê pêk tînin, ew bi tenê % 60ê nufûsa dinyayê û kêmtirî % 15ê dewletên dinyayê pêk tînin. Ev nebûna demokrasîyê îşaret pê dike ku piranîya dewletan tu sedema wan a ferzker nîne ji bo ku xwe li van înîsîyatîfan bînin, ew ê xwe li wan bînin bi tenê heke di dema kurt de ev înîsîyatîf bi kêrî berjewendîyên wan werin. Pirengkirina forumên bi kêrî dîyalogê tên bêguman heyatî ne ji bo bersivdayîna pêdivîyên çêkirî, lê belê di heman demê de ev ajîtasyon pêşîyê li dîtina çareserîyên hevpar û çareserîyên dikarin ji bo gelek pirsgirêkên girîng ji nû ve werin ceribandin, digire.

Em dikarin çi bikin ji bo ku ev rêxistin û bûyerên nû bikêrbûn û bitesîrbûnê çêtir bikin, li şûna ku wê asteng bikin?

Nîzama me ya pevguherîn, bazirganî û veguhêzbarîyê, dewlemendîya me ya aborî û şertên aştîya îzafî yên pêre pêk tên, wê qet nikarîya pêk werin heke dezgehên Bretton Woods û ajansên herî girîng ên Neteweyên Yekbûyî nebûna. Heke Konseya Ewlekarîyê ya Neteweyên Yekbûyî dixwaze li dinyaya me ya êdî pirnavendî ye bi rola xwe rabe, divê ew navgînên xwe biafirîne ku xwe li ber dewletan hemûyan rewa bike. Ew divê nexasim girîngîya dewletên mezin dibin li ber çavan bigire û wan baştir temsîl bike.

Baştir kanalîzekirina enerjîyan

Heke G20 bi vê koma piçûk a endamên xwe bi xwe destnîşankirî sînordarkirî bimîne, îhtîmala wê kêm e ku bibe rêxistineke gerdûnî ya ku lê biryar tên dayîn. (2) Li beramberî vê, ew dikare xwe weke mekaneke nîqaşên destpêkê bibîne ku lê aktorên global ên bibandor dikarin bihizirin, guftûgo bikin û li hev bikin li ser tewereyên stratejîk û nexşerêyan yên ku paşê wê ji alîyê sazîyên mîna Neteweyên Yekbûyî ve werin bicihanîn. Ev biryar wê ne ferzker bin û mirov dikare hêvî bike ku ev biryarên nefermî (û armanca wan diyar) weke ku karibin astengîyên sereke ji holê rakin xwe îsbat bikin û mijarên girîng jî bigihînin encamê: xeleka Dohayê, guherîna bahewayê, kêmkirina sîlehan.

Ji bo gihiştina vê armancê, ferz e ku G20 struktura xwe ji binî ve reform bike da ku temsîlkarîya xwe û pêre jî rewabûna xwe çêtir bike. Serokatîya fransî sala 2011ê soz da ku ew ê xebitîna wê ji binî ve biguhere. Gava pêşî ew bû ku welat û aktorên din werin vexwendinî hin civînan: G20 veguherî hema hema G30ê.

Pêkanîna van guhertinan wê hêsan nebe. Bi şîddeta krîza aborî, ji sala 2007ê û pêve li ser wan lihevhatinek çêbû. Reforma Konseya Ewlekarîyê ya Neteweyên Yekbûyî jî xerabûyî ye. Tu tişt bêyî nîqaşeke zêde xurt a hêzên mezin ên ji rêûresmê welatên "piçûk" û dewletên mezin dibin, naqewime. Bi kêrî berjewendîya herkesî tê ku nîzameke navneteweyî ya bêhtir yekbûyî were avakirin.


Ev tedbîr bi serê xwe wê pir zêdebûna civînên bilind ji holê raneke... Lê belê dibe ku ew gaveke pêşî pêk bîne ya ku li şûna ku mirov timî rêwîtîyê bike, mumkin e enerjîyê baştir kanalîze bike ji bo bipêşxistina sîyasetan û nîqaşkirina wan.

* Wezîrê karê derve yê norwêcî

(1) Samantha Powers, "Réformer les Nations unies / Reformkirina Neteweyên Yekbûyî", Le Monde diplomatique, îlona 2005ê.

(2) Bernard Cassen, "Dernier quadrille dans le ballet des 'G' / Di baleya 'G'yan de Alaya Dawî", Le Monde diplomatique, octobre 2009.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê



Kîto Sîno: **Don Kîşot**, li ser kartonê boyaxa akrîlîk

www.erevakurd.org

Di demeke li jidilîyê vekirî de, serokê Konseya Îtalyayê Mario Monti poşmanîya xwe derbirî û bi awayekî ku li zirara Ewropayê be, got "hukûmet destûrê didin ku biryarên parlemanên wan, wan bi tevahî û şidandî gem bikin" ("Der Spiegel", 5ê Tebaxa 2012yê). Di vê rewşê de ma mirov çawa ji ber serketinên hilbijartinan ên komedyen Giuseppe ("Beppe") Grillo û tevgera wî ya bi navê Tevgera 5 Stêrkan matmayî nemîne?

Serketina ne li bendê ya Tevgera 5 Stêrkan

Zilamekî din ê xwedê bijartî ji bo Îtalyayê

Raffaele Laudani *

Tevgera 5 Stêrkan (Movimento 5 Stelle, M5S) bi serketina xwe ya di hilbijartinên herêmî yên gulana 2012ê de li paytexta pîşesazîya xwardemenîyê û cihê şirketên pirrneteweyî yên mîna Parmalat û Barillayê ango li Parmayê xurt bû; bi vê xurtbûna xwe jî dirûvê sîyasî yê ji Alpan û wê de serûbinî hev kir. Hê nû ev du sal çêbûn ku komedyenê cenewîzî Giuseppe ("Beppe") Grillo - li gorî Financial Timesê ew "Jiminy Cricketê îtalî ye (1)" - M5S damezrand, û ji niha ve sê bajar feth kirin û di meclîsên şaredarîyan û yên herêman de du sed û pêncî hilbijartîyên wê hene. Heke di hilbijartinên neteweyî de heman rêjeya dengan bi dest bixe (ango % 18) hingê ew ê bibe duyem hêza xurt a sîyasî ya li welêt hema piştî Gelê Azadîyê (Popolo della libertà, PDL) - halê hazir rewşa wê nebaş e - ya kevneserokê konseyê Silvio Berlusconi. (2)

Çapemenî bi awayekî bi rêkûpêk M5Syê bi populîzmê û helwestên dij-sîyasî gunehbar dike, M5S bi xwe hem di nava dînamîkeke navneteweyî de ye û hem jî di nava nifşekî xwerû îtalî de cihê xwe digire. Weke guhertîbûna avakirina Partîya Korsanan li Almanyayê û Tea Party li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, ew pesnê beşdarîyeke girseyê, bihurîna ji cudatîya di navbera sîyaseta çepgir û ya rastgir û devjêberdana partîyên ji rêûresmê yên ku mohra bertîlxurîyê li wan ketîye, dide. Û weke girotondi - "yên ku li dora" cihê sazîyan di vê rewşê de "weke xelekekê digerin" - ya derhêner Nanni Moretti, weke Îtalyaya nirxan (Italia dei valori) yên dozgerê kevin ê operasyona dijbertîlxwurîyê a bi navê Mani Pulite (destên paqij) (3), weke Antonio Di Pietro yan jî weke Miletê Xemrî (yên ku tevahîya rengên sîyasi red dikin), M5Sê jî têkoşîna li dijî bertîlxwurîyê kire stûna şerê xwe yê sîyasî.

Derxistina pêş a van mijaran bêguman ji slogana wî ya xwedî îdîaya ekolojîk baştir serketina tevgera Grillo rave dike; ev slogan weha ye: "av, hawîrdor, çûnûhatin û barbirin, pevgirêdayîbûn, bipêşketin - pênc stêrk. Çawa ku mirov dikare li ser malpera danasînê ya yekê ji komîteyên wê yên herêmî jî bixwîne M5S xwe weke "tevgereke herikbar", "komeleyeke azad a welatîyan" a ku ji struktûrên hîyerarşîk, şax yan jî kartên endaman şûştî ye ku "yekane referansa wê bloga Beppegrillo.it" ye. Sempatîzanên wê cihêreng in: yên nû ketî nava sîyasetê ku piranîya wan ne girêdayî îdeolojîyeke dîyar in; milîtanên çepgir ên ku hêvîyên wan nehatine hiştin; û heta kevnepartîzanên sîyaseta rastgir ên neofaşîst û postfaşîst jî.

Ev têkelhevî nexasim li herêmên "sor" ên Îtalyayê yên weke Emilie-Romagne darî çav e, herêma navbirî cihê ku tevger halê hazir herî zêde lê serketî ye. Xala hevpar a van hatinên cem hev ên sosret ew e ku tevahîya grillinîyan di Grillo de ango di yekane rêya li raya giştî vedibe ya tevgerê de nûnerê xwe yê bi rastî dibînin. Qaîdeyên hin komîteyên herêmî li milîtanên xwe yên asayî bi xwe jî qedexe dike di çapemenîyê de xwe îfade bikin.

Komedîyen Grillo bi xwe gavên xwe yên pêşî bi rêya hicvê avêtin. Kanalên televîzyona dewletê di nîvê salên 1980yî de lê hatin qedexekirin, lewra wî birêveberên Partîya Sosyalîst a Îtalî weke "diz" nîşan dan, piştî vê wî berê xwe da şanoyan û dest bi karîyereke nû kir. Ji bêhtirî bîst salan û vir ve rexneyên wî yên tûj û hişk ên li ser lihevhatina bi dizî ya di navbera desthilatdarîya sîyasî û holdîngên mezin ên taybet de girseyên dilsoz dikişîne salonên şanoyê, holên sporê û stadyûman. Bi ser de jî bi înternetê re ew hoparlorekê peyda dike ya ku destûrê dide wî ku hem yekser ji "rûvîyên" temaşevanên ku ew xwe lê datîne ku nobeta hêrs û acizîya wan digire, hem jî bi sazîyên çapemenîyê yên mezin bilîze yên ku bi lez ji daxuyanî û pêşnîyazên wî yên ji hed dibihurin, dixeyidin, ev jî bêyî ku ew bixwazin reklama wî dike.

Grillo û tevgera wî xwe weke xwedîyê çareserîyên bikêrhatî û darîçav - li ser mijarên enerjîyên alternatîf, çûnûhatin û barbirina "biaqil" û hwd. - nîşan didin, lê belê naveroka axaftinên wî di stratejîya wî ya danûstendinê de xwedî kêm girîngîyê ye. Çawa ku bi awayekî pir di cîh de rojnamevanekî rojnameya îsraîlî Yediot Aharonotê 25ê hezîrana bihurî îşaret pê kirî "Grillo şanogerekî baş e ku bi hêvîyên temaşevanên xwe dizane". Zêde xuyakirina wî di çapemenîyê de destûrê dide wî ku têkilîya tevgera xwe bi wê tiştê re ku ew weke meyl û hîsa rast a gelêrî dibîne, xurt bike. Grillo bi awayekî birêkûpêk daxuyanîyên homofob yan jî dijminê bîyanîyan dide, weke mînak serokê herêma Apûlyayê û damezrênerê Partîya Çep, Hawîrdor û Azadîyê Nicola ("Nichi") Vendola yê ku homoseksuel e, weke buson (bi zaravayê cenewîzîyan "nêremo") bi nav dike, yan jî difikire ku rêjeya dana zarokên koçberan a welatîbûna îtalî ne "xwedîyê tu maneyê" ye. Berîya demeke hê kurttir bi helwêsta Lîga Bakur re hemfikir bû, li ber "lawazbûna" jîyana şevê ya havînî rabû ku li gora wî rehetî û ewlekarîya malbatan"bi her halî" xira dike.

Seferberîya hestyarî

Modela ku Grillo pêşnîyaz dike gelekî deyndarê şexskirina pir zêde ya sîyaseta salên Berlusconi ye. Di vê navê de hêza karîzmatîk a "Cavaliere ["Suwaro" nasnavê li Berlusconi kirî, nota wergêr]" di tevlîbûna wî ya yekser û dagirker a hevrikîya hilbijartinan de be jî, M5S bi xwe serokatîyeke bê serok pêşnîyaz dike: Şefê wê çiqasî li derveyî qada hilbijartinê tevbigere ewqasî jê tê raya giştî qanî bike û bi roleke ji bo sîstemê pêşbîner û exlaqparêz radibe. Têkilîyeke milkîyetî ya bi sîyasetê re jî alîyekî hevpar ê M5Syê bi modela Berlusconi re ye. Lê belê di vê qadê de jî ji Grillo hat ku şêwazê xwe nû bike. Forza Italia ("Bimeşe Îtalya" yekem partî bû ku Berlusconi damezrand) peydebûneke yekser bû ji Publitalia. Publitalia jî şirketa ji reklam û bazarkirinê berpirsîyar a holdînga bi navê Mediasetê bû. Dema partî nû hat damezrandin, di destpêkê de namzet û milîtanên wê para bêhtir mûçegir û birêveberên holdînga Berlusconi bûn. M5S bi xwe bi rola "bayîtîdêrê" sîyasî radibe. Navê fermî û herweha logoya wê milkê şefê wê ye, lê belê destûra bikaranîna wê ji herkesî re heye ku "ne-destûra" wê ya li ser bloga wê weşandî qebûl bike û hez bike komîteyeke herêmî ava bike. Ev komîte jî weke li restoranên McDonald'sê ji alîyê milîtanên di kirin û rêxistinkirina xwe de xwedîyê xweserîyeke hema hema mutleq ve tê birêvebirin. Ev xweserî dîsa jî pêşîyê lê nagire ku Grillo - bi awayekî veşartî û li gorî dilê xwe - milîtanên ku li gora wî ji rêya "fikra" tevgerê derketine ji civaka xwe bike der; çawa ku 5ê adara bihurî endamê meclîsa şaredarîyê ya Ferrareyê Valentino Tavolazzi bi daxuyanîyeke li ser bloga Grillo kirin der.

Demokrasîya tevlîbûnê ya M5Syê carinan dadikeve asta sêwirandineke xeyalî ya xwe disipêre seferberîya hestyarî ya milîtanên kulta wan a înternetê ew kor kirî. Li gorî fîlozofîya M5S wê bi kar tîne - nexasim di vîdeoyên "pêxemberane" yên pisporê ragihandinê û hevdamezrînerê V-Day (Vaffanculo-Day, roja "korîma te kirî") Gianroberto Casaleggio, yê ku tevger bire ser dika sîyaseta neteweyî -, înternet ji navgîneke ragihandinê û wêde ye: ev şertê hewce ye û asoyê demokrasîya nû ya cîhanî ye ku divê sala 2054ê pêk were di encama serketina cîhana rojavayî (gihiştina wê ya serbest a înternetê) li dijî trîptîka tarîgir a Rûsya-Çîn-Rojhilata Nêzîk de. (4)

Li navenda vê "demokrasîya dîjîtal" de meetups hene, ango forumên nîqaşê yên ku têde milîtan "hev dibînin" da ku çareserîyên "herî baş" ji pirsgirêkên bajarên xwe yan jî welatên xwe re parve bikin. Ji bilî vî, alîyê elektro-xeyalî - "teledengdan" a gelekî populer di kêf û şahîya televîzyonî û tevnên civakî yên înternetê de bi bîr dixe ku di wan de elaqeya ji tişta gelemperîyê re tê tevlîhevkirin bi pêdivîya "gotina tişta mirov difikire" û guhdarîbûnê re - tevlîbûna milîtanên M5Syê sînordar e bi avakirina komîteyên hilbijartinê û neqandina namzedên ku wê nûnerîya tevgerê bikin. Ev jî modelek e ku pir cihê nîne ji ya partîyên sîyasî ya ku Grillo wê gelekî rexne dike. (5)...

Li hemberî vê - heke mirov endametîya demî ya hejmareke mezin a milîtanên ciwan ên xwedî zêde dîplome nehesibîne - di navbera M5Syê û tevgerên "nerazîyan" yan jî Wall Streetê Dagir Bike re xal û xisletên hevpar kêm in; hêjayî gotinê ye ku Grillo pir caran hewl da, xwe bişibîne Wall Streetê Dagir Bike û îdîa kir ku yekane cihêtîya di navbera tevgera wî bi xwe û wê de ew e ku tevgera wî "hê bi hêzên nîzamê re nehatîye dijberî hev". Di slogana xwepêşandêrên arjantînî ya sala 2001ê "bila hemû biçin!" ("¡Que se vayan todos !") de û îro di daxwaza "nerazîyan" a "demokrasîya bi rastî, niha!" ("¡Democracia real ya!") de ya ku li kolanên Madrîdê deng vedide mirov rûbirû dibin bi bertîlxwurîya sîstemê ya rastî re di maneya xwe ya sîyasî ya yekem de: jitaqetketin û lawazbûna partîyên sîyasî - yên ku veguherîn qayîşa ragihandina globalbûnê - û fîksîyona demokratîk a sîstema nûnerîyê. Berevajîyê ve, nerazîbûna grillini parastineke bi heraret a vê sîstemê ye û qaşo sîyasetvanên bêexlaq ev sîstem ji rê derxistine.

Ji bilî referansên wê yên şîlo yên li mijara "piçûkbûna aborî", bi tenê hindik - heta belkî tiştekî bibêje nebe - tiştan dibêje li ser krîza aborî, bandora deynan û deyndêran yan jî mexdûrî û mehrûmbûna her diçe zêde dibe. Dema ku jê pirsîn ka ew li ser derketina ji herêma euroyê li çi difikire, wî xwe siparte weczekê: "ez nizanim, em ê li pirsgirêkê bikolin". Li ser vê mijarê û li ser mijarên din ew qîma xwe pê tîne ku helwêstên di nava îtalîyên "navînî/asayî" de mode biafirîne bêyî ku van helwêstan di nava projeyeke civaka alternatîf de bi cih bike.

Tevî deng û rengê wê yê tundrew jî M5S heman têgeha sîyasî ya ku salên 1980yî îlham da bernameyên sererastkirina strukturel li Amerîkaya Latîn û êdî li Ewropayê bicihkirina hukûmetên "teknîk" rewa dike, bi kar tîne. Di herdu rewşan de jî sîyaset îdare û îcraya zanîneke bêalî û pêkanîna armanceke bi rûmetbilindî û nîyeta baş e. Şaredarê nû yê Parmayê Federico Pizzarotti yê ku bi awayekî kes ne li bendê heta bi birêveberîya yek ji bajarên herî dewlemend bilind bû, ku bi awayekî dîrokî timî di destê "kooperatîfên sor" û Yekîtîyên Pîşesazan de bû, îdîa dike ku nîyeta wî jî baş e; wî biryar da ku endamên kabîneya xwe bêyî pêşhukman bi tenê li gorî Kurteya Jînegerîya (curriculum vitae) wan bineqîne. Gelek meh bihurîn koma wî ya xebatê hê jî ne temam e...

Zehmet e mirov hê berîya wê bibêje ka wê çi ji vê ezmûna sîyasî ya nîvtarî û nakok were. Gelo M5S çawa ku grillini dixwazin wê bibe aktorê sereke yê nûbûneke demokratîk a tundrew a sîyaseta îtalî? Yan jî gelo weke rêxistinên berîya xwe wê di nava sîstemê de vehewin? Gelo weke ku hinek li bendê ne, ew ê veguhere tevgereke otorîter weke hin rêxistinên sedsala 20ê yên ku bi redkirina sîstemê pêk hatin û paşê veguherîn partîyên nîzamê? Tiştek heye vebirrî ye: têkilîyên wê yên pêşî yên bi desthilatdarîyê re dek û dolabên sîyaseteke qaşo "xwerû" ya ku qaşo bi tenê exlaq rêberê wê ye, lê eşkere kirin. Di meclîsa şaredarîya Bolonyayê de du komên reqîbên hev her gefan li hev dixwin ku ew ê "dosyayên hetikanînê" li çapemenîyê eşkere bikin. Li Parmayê alîkarê şaredarê nû yê ji M5Syê yê li ser mijara bajarbûnê yê ku ji ber jêhatîbûn û profesyonalîzma xwe hatibû neqandin, hê berîya ku dest bi wezîfeyê bike neçar ma îstîfa bike: ew hat gunehbarkirin ku di rabihurîyê de hin nerêkûpêkîyên piçûk ên li ser milkan kiribin û heta kiribe ku şirketa wî îflas bike. Şîroveya wî kesê nehat fêmkirin, weha bû: "ji mirov ve ye ev lîstikeke talankirinê ye. Weke ku em dixwazin bi şer bilîzin; de rabin". (6) Çawa ku moralîzatorekî baş tê nasîn ê ku Grillo di filmekî Luigi Comencini (Hîlekar, 1982) de rola wî dikir, gotî: bila yê ku qet gunehên wî nebin, kevirê pêşî biavêje...

* Li Unîversîteya Bologneyê lêkolînerê dîrok û çandê. Nivîskarê pirtûka Disobbedienza, Il Mulino, Bologne, 2011.

(1) Beppe Severgnini, "The chirruping allure of Italy's Jiminy Cricket / Cezba çîzçîzokî ya Jiminy Cricket ê Îtalyayê", Financial Times, London, 5ê hezîrana 2012ê.

(2) Di hilbijartinên adara 2012ê de PDLyê hema hema tevahîya bajarên mezin ên di destê xwe de ji dest da. Vê gotarê bixwîne: Carlo Galli, "M. Berlusconi, théoricien de la 'débrouille' / Berlusconi, teorîsyenê 'jêhatîbûna ji bo xwe xilaskirina ji belayê' ", Le Monde diplomatique, îlona 2009ê.

(3) Francesca Lancini, "La grande désillusion des juges italiens / ji xewê hişyarbûna mezin a dadgerên îtalî", Le Monde diplomatique, hezîrana 2010ê.

(4) "Gaia: The future of politics / Gaia: siberoja sîyasetê", www.youtube.com

(5) Edoardo Greblo, La Filosofia di Beppe Grillo. Il Movimento 5 Stelle, Mimesis, Roma, 2011.

(6) Gazzetta di Parma, 21ê hezîrana 2012ê.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Ji civîneke bilind a krîza li ser euroyê ber bi yeka din ve, Konseya Ewropayê her li ser rûpela sereke ya çapemenîyê ye. Di vê navberê de ji bilî baleya wesaîtên fermî û xirecira civînên çapemenîyê, di rastîyê de haya me hema hema ji nîqaşekê jî nîne, ew nîqaşên ku holên kulavîn ên ku li wan bîstûheft serokdewlet û serokwezîr dicivin, dihejînin. Bi tenê çendek kesên ji hundirê vê derdorê dikarin bikevin wir.

Li kûlîsên Konseya Ewropayê

Siberoja Ewropayê li derî raya gişti, sergirtî tê nîqaşkirin

Christophe Deloire û Christophe Dubois *

Serokdewlet û serokwezîrên ewropî ji gulana 1995ê û vir ve li avahîyeke girîng a ku navê fîlolog û humanîstê sedsala 16ê Justus Lipsius ê li Brukselê xwendî lê hatiye kirin, dimînin. Hema li cem çaryana Robert-Schuman, li hemberî meqamê dîrokî yê Komîsyona Ewropayê, avahîya Justus-Lipius hem mêvandarîya civînên Konseya Yekîtîya Ewropayê û hem jî ya civînên Konseya Ewropayê dike. Di her civîna Konseya Ewropayê de serokdewlet û serokwezîr ji dikeke ku dişibe pêlikeke "suwarbûn û peyabûna wê kêlîyê" ya li pişt avahîyê ve dikevin hundir. Bi wê armancê hatîye çêkirin ku ger û teftîşa wesaîtên fermî mimkin û hêsan bike, û derîyeke veşartî bi bîra mirovan dixe. Li hola civînan a hejmara 50.1 serokê daîmî yê Konseyê (1) kevneserokwezîrê belçîkî Herman Van Rompuy mêvandarîya bîst û heft birêveberan dike. Serokê Komîsyonê José Manuel Barroso jî amade ye. Li pişt, mafê nûnerên daîmî yên welatan - "sefîrên" li Brukselê - heye ku rûnin. Kamerayên bi asraxê ve ên ku bi kêra qeydkirina rûniştinên qanûnçêkerîyê yên Konseya Yekîtîya Ewropayê (ya ku bêhtir weke Konseya Wezîran tê nasîn) tên bi xwe dema civîna bilind a jin û mêrên herî hêzdar ên parzemînê de vemirandî ne. Bi vî awayî biryarên li ser siberoja Ewropayê ji bo raya gişti bi awayekî sergirtî tên dayîn. Birêveberên mîmarîya sazûmanîyê ya ewropî bi xwe misoger dikin ku di van civînan de bi tenê birêveçûneke pir normal heye û tu tiştê din nîne. Civînên konseya wezîran a li Elyséeyê li dor serokkomarê Fransayê weke bernameyeke tele-realîteyê nayên weşandin, ne wisa? Ê baş e, nexwe çima divê li Brukselê bi rengekî din ev civîn pêk werin?

Belê, dîsa jî cudatîyeke herduyan heye. Tevahîya civînên aktorên sereke yên çarşeman li Elyséeyê pêk tê, li beramberî welatîyên ku wê ji ber biryarên wan mexdûr bibin yan jî razî bibin, berpirsîyar in. Hinekî berpirsîyar, ne gelekî, lê belê bi her halî xwedî rewatîyekê ne ku Parlemana Neteweyî bi erêkirinê daye wan. Li Konseya Ewropayê tiştekî bi vî rengî tune. Ne mimkin e mirov zanibe ka birêveberekî helwêstên xwe li parastina wan datîne bi rastî parastine yan na, ka gelo di doza xwe de ew bi ser ketîye yan jî li hemberî bayên dijber serê xwe tewandîye. Mimkin nîne mirov li ser wî ferz bike ku hesab bide.

Ji bo mirov hewl bide zanibe ka di van civînan de çi tê gotin, mirov dikare beşdarî civînên çapemenîyê bibe û ev civîn li derketina avahîyê tên lidarxistin. Her birêveberek ya xwe li dar dixe. Pirsgirêk ew e ku çapemenîyên neteweyî ne xwedîyê wan derfetan in û bêguman ne jî dixwazin ku bi axaftinên serokdewlet û serokwezîran têderxin ka çi qewimîye. Rojnamevan wê têde wêneyekî nû yê "îzafîyeta şahidîya mirovî" bibînin, nexasim jî ya wan aktorên sereke ku dixwazin bi rolên baş rabin. Reklam ne şefaf e. Bi vî rengî mirov dikare ji nava daxuyanîyên çapemenîyê hin agahîyan bi dest bixe, lê belê ew bi tenê rastîya fermî jinûve dinivîsin û ev rastîyên fermî jî ne bi tenê rastî ne.

Bicihkirina mîkrofonên-sîxur wê bibe rêyeke din. Bi anekdotekê em behsa meseleyekê bikin, sîstemên guhdarîkirinê yên qaçax ên girêdayî kabîneyên wergerê sala 2003yê li holên civînê yên Konseyê hatibûn dîtin. Di encama lêkolîneke polîsî û hiqûqî ya hêzên ewlekarîyê yên belçîkî de guman ji ofîseke xebata zanistî ya îsraîlî hat kirin, tê fikirîn ku girêdayî Mossadê ye. Ev bûyer bê şer û xirecira sîyasî weke razekê hat veşartin û nehat şopandin.

Hişkbûna budceyî, gelo mafekî mirovan e?

Ango yek derfet bi tenê dimîne: têbînî û notên Antici. Navê dîplomatekî îtalî, prokursorê salên 1970yî Paolo Antici (1924-2003) li wan hatiye kirin, ev not nivîsandinên daktîlografîyê yên bê sernivîs in, ku qeydkirineke hema hema bêqisûr a axaftin û dîyalogên birêveberên ewropî yên dema civînên bilind e. Karmendekî sekreterîya gişti a Konseyê yê navê debriefer lê tê kirin, di nava hola 50.1ê de her diçe û tê, û li odeyeke li kêlekê ew bi dîplomatên neteweyî tişta tê axaftin kite bi kite dide nivîsandin. Ev têbînîyên Antici li raya gişti nayên eşkerekirin. Yên ku salên 2010 û 2011ê hatin nivîsandin û me bi dest xistin, dikin ku em karibin panîka birêveberan li hemberî bahoza krîza malî bibînin û di niyetên wan ên sîyasî derxin. Di vekirina Konseya Ewropayê ya 16ê îlona 2010ê de ji ber "encama qanîker" a tedbîran û ji nû ve pêkanîna mezinbûna aborî Van Rompuy xwe bi xwe pîroz kir. Pişti bi du salan ev gotin pir bê dîqet xuya dikin. Krîza deynên dewletê her dewam kir çong li parzemîna ewropayê şikandin. Di nava sir û raza Konseyê de hin birêveber ketin nav xeyalên kêm demokratîk. 14ê hezîrana 2010ê serokkomarê franseyê Nicolas Sarkozy bû hevalbendê fikra Angela Merkel ya dibêje bila welatên ku Peymana Îstîqrar û Mezinbûna aborî (PÎM) ya hezîrana 1997ê li Amsterdamê hatî qebûlkirin bin pê dikin, werin cezakirin: betalkirina mafê wan ê dengdanê li Konseya Yekîtîya Ewropayê, ev ceza dewleta "binketî" dike weke mandayeke dewletên din.

Di civîna Konseya Ewropayê ya 28ê çirîya pêşî ya sala 2010ê de serokwezîra alman dest bi dijminatîyan dike: "xala 7ê ya peymanê di rewşên pir ciddî de derfeta şûnvekişandina mafê dengdanê dide". Di rastîyê de ev amûr "binpêkiririneke cidî û dewamî" ya nirxên Yekîtîyê, ya elaqedarî rêzgirtina ji rûmeta mirovan re, elaqedarî azadî, demokrasî û wekhevîyê ceza dike. Ango tu elaqeya wê bi jirêderketineke malî re nîne, lê belê ev cihêtî qet nake ku birêvebera alman rabe ser piyan; "me xala 7ê di rewşa binpêkirina mafê mirovan de qebûl kir û divê em ciddîyeteke di heman astê de nîşan bidin dema ku em behsa mijara euroyê bikin." Pêşî serokdewletê Romanyayê Traian Basescu ("ev rewş ne di çarçoveya binpêkirina mafê mirovan de ye") piştre jî serokdewletê Luksembûrgê Jean-claude Juncker û hevpîşeyê wî yê spanî José Rodriguez Zapatero li ber helwêsta herdu hevalan ango "Merkozy" rabûn. Li hemberî van protestoyan Sarkozy hevkarîya xwe ya vî gunehî bi maneyeke nuansê ku me timî didît wî bi kar dianî, parast: "betalkirina mafê dengdanê di peymanê de heye, ji ber vê jî ne derî aqilan e." Maneya wê jî ev e, mirov dikare ji bo dizekî asayî li cezayê muebedê bifikire, ev ê ne derî aqilan be lewma ev ceza di Qanûna Ceza de heye. Di dawîyê de kevne parêzvanekî lîderê komunîst ê bulgar Todov Jivkov ê bi navê Boïko Borissov ê ku di vê navê de pistî ku koma kareteyê ya welatê xwe bi rê ve bir, bû serokwezîrê welatê xwe, wê weke zaneyekî bêqusûr tê qebûlkirin derketa pêş: "divê em li ser çareserîyekê bixebitin, lê belê ne li ser çareserîyên ku rûmetê dişkînin ên mîna betalkirina mafê dengdanê." Di danezana encamê de wê hîç behsa van dîyalogan nehata kirin.

24ê adara 2011ê birêvber qala bicihkirina Çerxa Ewropî ya Îstîqrarê (ÇEÎ) dikin ku wê şûna Fonên Ewropî yên Îstîqrara Malî (FEÎM) bigire. ÇEÎ ya ku divê 700 milyar euroyan seferber bike, berîya wê bi pênc mehan hatibû ragihandin, lê belê bicihkirina wê her dereng dimîne. (2) Van Rompuy axaftineke alîgir dike: "bi rastî jî girîng e ku em bi awayekî erênî bi hev re bidin û bistînin û rê nedin guman ji biryardarîya me werin kirin". Dewletên endam li ser razandina sermayeyeke 80 milyar euroyî li hev nakin. Serokê koma Eurogroupeyê Juncker wan hişyar dike: "divê mirov ji vê yekê temaşayekê çêneke. Ez vê weke pirsgirêkeke piçûk nîşanî çapemenîyê didim." Hingê serokê Bankeya Navendî ya Ewropayê Jean-Claude Trichet lê mikur hat: "em gelekî dereng mane (...) ez fêm dikim ku divê em bi awayekî erênî ragihînin, lê belê di nava xwe de bila em rohnîker bin, me panzdeh meh dan pêşîya xwe da ku em sozên xwe bigirin." Heyf bû ku welatîyên ewropî ji vê jidilî û samîmîyetê sûd wernegirtin.

"Delaletên xirab ên proteksîyonîst"

Ji pirsgirêka euroyê û wêde têbînîyên Antici destûrê didin ku mirov bi awayekî bêhêzîya gelemperî bihise. 29ê çirîya pêşî ya sala 2010ê serokê Konseya Îtalyayê Silvio Berlusconi behsa kakûnî û tirsên xwe dike ku ji plankirina civanên wî yên kêf û şahîyê cidîtir in. Ew behsa fikarên xwe yên li hemberî cihguhertina veberhênanan dike: "karsaz dibêjin ku ew naxwazin li Ewropayê bi cih bibin, ku ew diçin Hindistanê, ango wê devera ku mirov bi Îngilîzî dipeyivin û hindik pereyan bi dest dixin, ew dibêjin nufûsa Çînê hersal bîst milyon û sêsed hezar kes zêde dibe û nufûsa çalak a Fransa û Îngiltereyê bi tevahî bîst milyon û sêsed hezar e". (3) Vê rojê Berlusconi ji kesayetîya xwe ya mîna henekekê dibihure: "Şirketên ewropî her diçe bêhtir zor û zehmetîyê dikişînin di reqabetê de. Divê tiştek were kirin, divê em li çareserîyan bihizirin, bi pisporên xwe re rûnin û ji nêz ve li van pirsgirêkan binêrin. Şirketekê ji min re got, halê hazir ew li Ewropayê pêncsed hezar kesî dixebitîne û ew ê vê hejmarê daxîne sedûpêncî hezarî."

Tevî cîddîyeta axaftinê jî Van Rompuy bi lez û bez mijareke din a guftûgoyê dide destpêkirin. Serokwezîrê sosyal-demokrat ê awusturyayî Werner Feymann li mijarê vedigere û ji Komîsyonê dixwaze lîsteyeke tedbîrên wê reqabetkarîya welatên ewropî xurt bikin, çêbike. Barroso hişyar dike: "Divê em peyamên xirab ên proteksîyonîst nedin." Sarkozy bi heraret bersivê dide wî: "Divê êdî em dev ji safdilîyê berdin: divê em bi hevkarên xwe re hinekî bêhtir rasterast bin û heke hevkarên me fêm nekin ku pêdîvî bi muteqabilbûnekê heye di têkilîyên bazirganîyê de, hingê em dikarin li çareserîyeke weke mafê gumrukê vegerin." Pir zivêrbûyî Barroso bi bîr dixe ku Komîsyonê tedbîrên antidomping li dijî Çîn û Vietnamê pêşnîyaz kirine û "zehmet bû ku ew Konseyê bi van pêşnîyazan razî bike". Ew ji bîr nake û "muxalefeta Komîsyonê li dijî proteksîyonîzmê" dugêsinî dike. Komîsyon nobedara peymanên ewropî ye, ew tabloyên qanûna hevalbenda pevguherîna-serbest kontrol dike û kirin û jestên serokdewlet û serokwezîran dixe nava çarçoveyekê. Têbînîyên Antici destûrê didin ku mirov vê rastîyê bi bîr bîne ku berpirsîyarên sîyasî yên neteweyî para bêhtir tercîh dikin veşêrin.

* Rojnamevan, nivîskarên Circus Politicus, Albin Michel, Parîs, 2012

(1) Peymana Lîzbonê wezîfeya serokê Konseya Ewropayê yê Daîmî afirand. Ji alîyê serokdewlet û serokwezîran ve ji bo du sal û nîvan tê hilbijartin û dema wî ya wezîfeyê dikare were dirêjkirin. Ew karên xwe bi koordînasyona bi serokatîya dorveger a ku her serê şeş mehan welatekî endam wê misoger dike, dimeşîne. Van Rompuy 1ê çileya 2010ê hat hilbijartin.

(2) Raoul Marc Jennar, "Deux traités pour un coup d'Etat européen / Du peyman ji bo darbeyeke ewropî", Le Monde diplomatique, hezîrana 2012ê.

(3) Di rastîyê de hejmar li derdora 60 milyonan e.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Tevlîhevnekin...

Em ji ber hevdengîyê wan li hev babidin jî, Konseya Ewropayê û Konseya Yekîtîya Ewropayê li heman cihî bicivin jî du sazîyên cihê ne. Konseya Ewropayê ya navdar a ku civînên wê di çapemenîyê de pir zêde cih digirin, bi awayekî nefermî sala 1974ê hat damezrandin, paşê pêre pêre bi xêra peymana Maastrichtê (1992) û peymana Lîzbonê (2008) veguherî sazîyeke fermî. Ev civînên serokdewlet û serokwezîran "ajoyên pêwîst dide Yekîtîya Ewropayê û meyla wê ya sîyasî ya gişti diyar dike". Kurt û kurmancî ev meqamekî biryardayînê ye weke Konseya Wezîran a li Fransayê.

Konseya Yekîtîya Ewropayê, ku bêhtir weke Konseya Wezîran tê binavkirin, çawa ku navê wê jî îşaret pê dike wezîrên bîstûheft welatên endam di qadên pisporîya wan wezîran de dicivîne: karên derve, aborî û civakî, dad û karên hundir... Bi vî awayî ew beşdar dibe li bêqusûrkirina nivîsên qanûnçêker ên ku Komîsyon wan pêşnîyaz dike û wan para bêhtir bi hevbiryardayîna bi Parlemana Ewropayê re qebûl dike. Di Konseya Wezîran de guftûgoyên li ser qanûçêkerîyê divîya bo raya gişti vekirî bin. Kamera divê wan bi awayekî zindî biweşînin, lê belê pirsgirêkên teknîkî carinan dîmen xira dikin. Bi herhalî ev guftûgo di rastîyê de berhemên hevdîtinên pêş in ku dûrî tevahîya mirov û çavên ji derve pêk tên. Ew di nava çarçoveya civînên Komîteya Nûnerên Daîmî (KONÛD) de pêk tên, KONÛD jî "sefîrên" welatên endam û cîhgirên wan dicivîne. Karên wan ji alîyê komîteyên karmendên payebilind ve û herweha ji alîyê komên "teknîk" ên ji "pisporan" pêkhatî ve, tên amadekirin; bawerî carinan bi wezîfedarkirina van "pisporên" navbirî nayê.

C.De. û C. Du

www.kurdishglobe.org



ADAR 1999

Bêdadîya li hember kurdan

Kendal Nezan

Piştî ku **Abdullah Ocalan** çar mehan li Ewropayê der bi der bû, ew li dawîyê, 15yê meha sibata 1999ê, li Kenyayê dan destê hikûmeta Enqereyê û şandin Tirkîyeyê û avêtin zindana Îmraliyê. Ew girtîgeha li ser girava Îmraliyê bi giştî ji bo mehkûmên îdamê ye û serokwezîrê berê yê ji Partîya Demokrat **Adnan Menderes** bi du wezîrên xwe re li wir hatibû daleqandin û rêberê Partîya Karkerên Kurdistanê (PKK) jî dê li wir were mehkemekirin.

Ji bo piranîya Kurdan, rêberê PKKyê yê ku bûbû armanca nêçîrê, bûye qurbanîyê «komplo»ya tirk û amerîkî û îsraîlîyan a bi hevkarîya hikûmetên Yûnanîstan û Kenyayê.

Kurd bi giştî xwe şikestî, herişandî û bêsîyanetkirî hest dikin û dîsa wê gotina xwe ya rojên tarî vedibêjin: ***"Kurd bêdost û bêkes in."*** Ji bo piranîya kurdan, rêberê PKKyê yê ku bûbû armanca nêçîrê, bûye qurbanîyê «komplo»ya tirk û amerîkî û îsraîlîyan a bi hevkarîya hikûmetên Yûnanîstan û Kenyayê. Ew hêrsa kurdan û pêla berfireh a xwepêşandan carna bi tund û tûjî li dijî nûnertîyên dîplomatîk ên wan welatan li Ewropayê, li Rojhilatê Nêzîk û Kafkasyayê ji ber vê yekê ye. Dibe ku ew xwepêşandan hê berdewam bin û tundtir bibin. Bi navê "pêşîlêbirînê", Enqereyê di nav hefteyekê de nêzîkî du hezar militanên mafên mirovan yên kurd û tirk girtin û çûyîna Kurdîstanê ji medyaya navneteweyî re qedexe kir.

Ew Ewropaya ku gelek dîktatorên xwînmêj û bertîlxur ên başûr dihêwîne, di bin zora Amerîkayê de û bi tirsa tolhildaneke bi rêya aboriyê ji Tirkîyeyê, wek nimûne derbarê firotina çekan de, derîyê xwe ji serokê kurd re girt.

Ew Ewropaya ku gelek dîktatorên xwînmêj û bertîlxur ên başûr dihewîne, di bin zora Amerîkayê de û bi tirsa tolhildaneke bi rêya aboriyê ji Tirkîyeyê, wek nimûne derbarê firotina çekan de, derîyê xwe ji serokê kurd re girt. Bireveberên Kenyaya li ber îflasê ku Amerîkayê piştî êrişa li ser balyozxaneya amerîkî li Naîrobîye di meha tebaxa 1998ê de bi sistîyê gunehbar dikirin, ji bona alîkarîya aborî û sîyasî, karê ku amerîkîyan da wan qebûl kir.

"Gelê min dê heyfa min hilîne."

Raya giştî ya yûnanî ku alîgirê Kurdan e bi vê xiyanetê tevlihev bû û serokwezîr Constantin Simitis naçar bû ku wezîrê karûbarên derve Thédore Pangalos û du wezîrên din feda bike û ji kar derxe.

Di vê mijarê de pişka Atînayê gelek şêlû ye. Raya giştî ya yûnanî ku alîgirê kurdan e bi vê xiyanetê tevlihev bû û serokwezîr **Constantin Simitis** naçar bû ku wezîrê karûbarên derve **Thédore Pangalos** û du wezîrên din feda bike û ji kar derxe. Desthilatdarên yûnanî heta niha jî mijar bi rengekî wisa rave nekiriye ku mirov pê qayîl bibe ka wan çima **Ocalan** 2yê sibatê şand Kenyayê, ku wek qada dezgehê agahîyên nepenî yê Îsraîlê tê zanîn û her weha di bin zexta Amerîkayê de ye. Yûnanîstanê herweha zelal nekiriye ka dîplomatên wê **Ocalan** di nav kîjan şertan de da destê rayedarên Kenyayê. Li gorî hinek rojnameyên Tirkan, Atînayê qebûl kiriye **Ocalan** "bide" Tirkiyeyê, di berdêla razîbûna Amerîka û Tirkiyeyê de ku ew fuzeyên bi navê ***SS-300*** ên ku Qibrisê ji Rûsyayê kirîbûn li Gîrîtê bi cîh bike. Lê aqlê mirovî jê nabire. Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, ku piştî têkçûyina kiryarên wê yên nepenî li dijî Iraqê sala 1996ê ji bo rûxandina rejima Iraqê li rêyeke pêşxistina stratejîyeke nû digerîya, tu car hewqas pêwistî bi hevkarîya Tirkiyeya endama Rêxistina Peymana Bakurê Atlantîkê (NATO) nebûbû, bi taybetî ji bo bikaranîna bingeha Încîrlîkê. Tevî ku PKKyê heta niha li dijî Amerîkayê tu êriş nekirine, Amerîkayê ji bo ku dilê Enqereyê xweş bike, PKK kir nav lîsteya rêxistinên terorîst. Lê ma gelo **Yaser Erefat,** kevneterorîstê ku heta van demên dawîyê nefret jê dihat kirin, nebûbû dostê serok **William Clinton**?

Tevî ku PKKyê heta niha li dijî Amerîkayê tu êriş nekirine, Amerîkayê ji bo ku dilê Enqereyê xweş bike, PKK danî nav lîsteya rêxistinên terorîst. Lê ma gelo Yaser Erefat, kevneterorîstê ku heta van demên dawîyê nefret jê dihat kirin, nebûbû dostê Serok William Clinton?

Ji bo Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, di rêya bicîhanîna pêymana aştîya ku her du partîyên sereke yên kurdên Iraqê îlona 1998ê bi navberîya **Madeleine Albrightê** girêdabû, PKK astengeke mezin bû ji ber ku Sûrîye û Îranê ew partî li dijî "Pax americana"yê (Aştîya Amerîkî) bi kar dianî. Washingtonê li hember sîyaseta xwe ya alîkarîya demokratîzekirin û bi Yekîtîya Ewropayê ve girêdana rejima tirkan, PKK û rêberê wê wek dijmin, dijminên ku "nedihatin rê û rêçê" dihesibandin.

Îsraîl dibêje ku ew rasterast tekilî kiryara li dijî Ocalan nebûye. Lê belê, yê ku cara yekem Enqere agahdar kir ku rêberê kurd çirîya pêşîn a 1998ê gihîştîye Moskovê, dezgehê wan ê agehîyên nepenî «Mossad» bû û şewirmendên îsraîlî hêzên taybetî yên tirk ji şerê li dijî PKKyê re amade dikirin.

Îsraîl dibêje ku ew rasterast tekilî kiryara li dijî Ocalan nebûye. Lê belê, yê ku cara yekem Enqere agahdar kir ku rêberê kurd çirîya pêşîn a 1998ê gihîştîye Moskovayê, dezgehê wan ê agehîyên nepenî «Mossad» bû û şewirmendên îsraîlî hêzên taybetî yên tirk ji şerê li dijî PKKyê re amade dikirin. Di 4ê sibata 1999ê de, di rojnameya *New York Times*ê de, nivîskarê gelek xwedîtesîr **Willam Safire** qala hevkarîya serbazên amerîkî û îsraîlî ji bo girtina wî «Kurdê xirab, Ocalan» kir.

Birêveberên Tirkan ne wekî pêşîyên xwe yên osmanî ne. ***Osmanîyan rêz li dijminên xwe digirt, hema rêberên kurd nefî dikirin û hew, lê birêveberên tirk hemî rêberên serhildanên Kurdan ên sedsala XX. bi îdamê ceza kirin û ew bi dar ve kirin.***

Birêveberên Tirkan ne wekî pêşîyên xwe yên osmanî ne. Osmanîyan rêz li dijminên xwe digirt, hema rêberên kurd nefî dikirin û hew, lê birêveberên tirk hemî rêberên serhildanên kurdan ên sedsala XX. bi îdamê ceza kirin û ew bi dar ve kirin. Li gorî wê kevneşopa ku ji alîyê Kemal Ataturk bi xwe ve hatiye danîn, Ocalan dê piştî dadgeheke formalîte meha nîsana 1999ê li gorî benda 125ê ya qanûna ceza bi tawana xiyaneta li welatî bi îdamê were mehkûmkirin û ew ceza bê înfazkirin. **Ji bilî zexta navneteweyî ya nedîtî yan jî teslîmbûna rêbêrê kurd di bin tesîra dermanan de ku kesayeta wî ji nav biribû, ew ji ber westa rêwîtîyên xwe yên mehên dawîyê jî hesas bûbû.**

Gelek welatên rojavayî ji Enqereyê xwest ku dadgeha Ocalan rewa be. Lê li welatê ku rewşenbîrê tirk **Îsmaîl Beşîkçî** ji ber nivîsên wî yên li ser kurdan bi du sedsalên zindanê (!) mehkûm kiribû û ku daxwazên ji bo dadgeheke rewa ji parlamenterên kurd re tu tesîr lê nekiribû û ji ber hizr û bîrên wan panzdeh sal cezayê zindanê li wan birîbû, ew hêvîyeke vala ye… Ji xwe, dozger û dadyarên heman Dadgeha Ewlehîya Dewletê yên ku berpirsîyarên mehkûmkirina parlementerên kurd in, dê bi qanûn û rêbazên li dijî peymana mafên mirovan a Ewropayê **Ocalan** mehkeme bikin. Bila em bi bîr bînin ka rêbêrê efsanewî yê serhildana kurdan a 1937ê, **Seyîd Riza**, ku di 5ê îlona 1937ê de ketibû destê leşkerê tirk, çawa hatibû îdamkirin. Ji bo pîrozkirina wê bûyerê, lê bi awayekî fermî ji bo vekirina pireyeke li ser rûbarê Firatê, **Atatürk** biryar da ku di 30ê meha çirîya paşîn de biçe wê herêmê û **Îhsan Sabrî Çaglayangîl**, ku di dawîya salên 70yî de bû serokkomar, bi rêya xizmetkarên xwe pê hesîya ku rîspîyên herêmê dixwazin bi wê firsendê «bavê neteweyê tirk» «nerehet bikin» û jê bixwazin ku mehkûman efû bike. Wî di nav «Bîranînên» xwe de jî nivîsandiye (1) : *«Min lezand ku ez bigihîjim herêmê da ku ew kesên divîya ku bihatana daleqandin berîya hatina Ataturk werin daleqandin."*

Çaglayangîl êvara înîya 27ê çirîya paşîn hat û çû cem dozgerî. Lê dozgerî got ku dadgeh nikare roja şemîyê, roja tehtîlê, bicive. Li ser peşnîyaza cîhgirê dozgerî, ku hevalekî wî yê fakulteyê bû, **Çaglayangîl** çû û bi walî re axivî ku dozgerî bişîne tehtîlê. Bi dû re çû û bi dadyar (hakim) re biaxive, lê dadyarî jî got bi awayekî qanûnî ne mimkûn e ku ew dadgehê berîya duşem a 30ê çirîya paşîn bicivîne. Lê wî dadyarî dîsa jî dadgeh şeva yekşemê di bin ronahîya lambeyên gazê de civand. Li gorî fermanan, dadgehê biryara îdama serokê kurd û şeş hevkarên wî da.

Biryar biryara dawîn e û birêveberê leşkerîya bilind a herêmê **Abdullah Paşa** ji berê de li ser kaxizeke vala ew biryar ji xwe pejirandibû: heft mehkûm saet 3yê spêdê birin ber sêpêyên îdamê yên li ber ronahîya lambeyên erebeyên polîsan. Pêşengê kurd yê heftê û pênc salî derket ser sêpêyê, celladê xwe def da, bi xwe bend kir stûyê xwe û qîrîya: «Ya we û kurdan xilas nebûye. Gelê min dê heyfa min ji we hilîne!» Roja din Ataturk hat seredanê. Dad û edalet bi cîh hatibû, rêz ji qaîdeyan re hatibû girtin û serhildana Kurdan «bi temamî hatibû vemirandin».

Zora ji bêhêvîtîyê

PKK balê dikşîne ser gotina Ocalan, «mirina min dê ji hebûna min bêhtir xizmeta doza kurdî bike», û mîlîtanên xwe ji bo mirinê amade dike. Civata serokatîyê ya PKKyê – ku ji endamên wek kesê duwem ê rêxistinê **Cemîl Bayik, Osman Ocalanê** birayê "Apo" û **Murat Karayilan** pêk tê- di 18ê sibatê de, li ser kanala kurdî MED-TVyê daxuyanîyek da û «berfirehkirina şerî li ser hemû armancên sîvîl û leşkerî li Tirkiye û Kurdîstanê» û « domandina xwepêşandanên aştîyane li Ewropayê » daxwaz kir.

Li gorî vê birêveberîya nû, «hemû endamên PKKyê dê ji vir pê de wek fedayîyan bijîn û şerî bikin», «Tirkiye bi wê quretîya xwe şaş e» û «ew ê di demeke nêzîk de poşman bibe û têbigihîje ku **Ocalan** ji bo ku şerê piştevanên wî yê li dijî artêşa Tirkiyeyê nequlipe ser şerekî di navbera tirk û kurdan de her tiştê ku ji destê wî hat kir». Çapemenîya PKKyê di nivîsarên xwe de her tim bi vî awayî daxwaza gurkirina şerî dike: Ji ber ku dunya ji kurdan re bû dojeh, bila em wê ji bo tirkan û hêvkarên wan ên rojavayî jî bikin dojeh; bila her kurdek bibe bombayek heta ku ev qurbanîya me çavên mirovahîyê li malwêranîya kurdên Tirkiyeyê vedike!

Ew ê çewtî be ku mirov pûtê bi van gefên ji bêhêvîtiyê nede. Dibe ku bi hezaran, heta bi dehhezaran kurd, xwe di nav zor û şîdeta ji neçarîyê de winda bikin. Lê belê, Tirkîye xwe ji daxwazên herî bingehîn ên weke naskirina mafên zimanî re ker dike. Serokkomar **Suleyman Demîrel** di beyaneke di rojnameya ***Milliyet***ê ya roja 19 sibatê de, her gaveke lihevhatinê ber bi kurdan ve red kir û got ku dayîna mafên dibistanên kurdî û dezgehên ragihandinê yên bi zimanê kurdî dê rê bide "parçebûna welatî." Li gor serokwezîrê wî, **Bulent Ecevît**ê neteweperestê "çepgir", ku berpirsiyarê dagirkirina Qibrisê ya sala 1974ê bû, girtina **Ocalan**, dê "xwedêgiravî pirsa kurdî ya ku ji alîyê navendên bîyanî ve hatiye afirandin bi temamî ji holê rake.»

Nêzîkî 850 000 Kurd li welatên cuda yên li rojavayê Ewropayê dijîn û hatina berdewam a penaberan, ku ji ber şerî ye, roj bi roj gefeke mezintir li nîzama giştî ya li wan welatan dixwe. Îcar ew bi berjewendîya hikûmetên rojavayî ye ku xwe têkilî Enqereyê bikin. Bi tenê ew dikarin Tirkîyeyê tengav bikin da ku statûyeke cîhê qebûlê bide 15 mîlyon kurdên wê derê, statûyeke bi rêza ya ku Koma Welatên Peywendîdar ji bo parastina 1,8 mîlyon albanîyên Kosovoyê li ser Sirbîstanê ferz kir. Kurdan bi têra xwe ew sîyaseta rojavayî ya durû dîtîye. Ma ew ê di destpêka sedsala 21ê de jî her weke berê bin, ew ê wek bi tenê gelê ku bi vê hejmara mezin a bê hebûneke bi pênasîneke qanûnî bimînin?

(1) Ihsan Sabri Çaglayangil, *Anilarim* (Bîranînên Min), Weşanxaneya Yilmaz, Stenbol, 1990.

Wergera ji fransî: Bêrîvan Kilic Tugan

www.kurdishmonde.org







Kîto Sîno: **Jin û mêr**, Enstalasyon

Wênesazê vê hejmarê



Kîto Sîno

Hunermendê kurd Kîto Sîno li Kurdistana Rojava ji dayik bûye.

Kîto Sîno 1988ê de ji bo perwerdeya bilind çûye Rûsyayê. Perwerdeya xwe ya hunerê li Moskovayê li Akademîya Huner a Stroganov di beşa abîde û dekorasyonê de temam kirîye. Di navbeyna salên 1995-2004ê de wek gestvanekî hunerê li welatên Rûsya, Almanya, Polonya, Holanda, Belçîka û Sûrîyeyê gerîyaye. Hunermend berhemên xwe yên ku li geştvanîyê afirandine li wan welatan hiştiye.

Hunermend Kîto 10 sal e li Belçîkayê dijî. Di destpêka li Belçîkayê bicihbûnê de hunermend bi gelek destengîyan re rûbirû maye lê di demeke kin de bi hêza hunera xwe, xwe daye pejirandin û ji desttengîyan xelas bûye.

Hunermend Kîto Sîno bi hunera xwe ya mozaîkê û bi workshopan li Belçîkayê bi nav û deng bûye. Bi teknîkeke cihê ya mozaîkê li ser navê "Kîtomozaîk" patent wergirtiye. Hunermend di warê hunera mozaîkê de bi performanseke pir baş projeyên gelek girîng çêkiriye û çêdike.

Ji xebatên Kîto Sîno tê dîtin ku hunermendekî pir alî ye. Di warê wênesazî, peyker, mozaîk, nîgar û enstelasyonê de berheman diafirîne. Hunermend hin wêneyên xwe jî bi boyaxa ku bi destê xwe û li gor konsepta xwe hildiberîne, çêdike.

Taybetmendîyek din ya Kîto Sîno ku wî ji hunermendên din cihê dike jî xebatên wî yên li ser bilêtên trênê ne. Hunermend li ser bilêtên trêne xwedîyê konsepteke balkês e.

Kîto Sîno nêzîkî 13 sal e li ser bilêtên trênê wêneyan çêdike. Heta niha 200 car rêwîtîya bi trênê kiriye û koleksîyoneke wî ya ji 200 wêneyên li ser bilêtên trênê hatine çêkirin heye. Dema rêwîtîyê dike li ser bilêtên xwe wêneyan çêdike, xem û xeyalên xwe li ser van bilêtan dinexşîne.

Êdî Kîto Sîno, trên û bilêt bûne hevparçeyek. Ev konsept bûye îşareta hebûn, hest û ezmûnên wî.

Hunermend Kîto Sîno bi van parçeyên bilêtê ji alîkî ve demê, evînê, azadîyê û aştîyê bi motîfên xwe derdibire, ji alîyê din ve jî me dibe rêwîtîya navbeyna raborî û dahatûyê.

Di derheqê hunermend de ji bo agahdarîyên zêdetir li malpera http://www.kito.be binêrin.

www.kurdi.se

Çîn, desthilatdarî û hêz

«Piştî kongreya 18ê»… Her daxwaza hevdîtina bi birêveberên Partîya Komunîst a Çînî (PKÇ) re rê li ber vê bersivê vedike. Heta yên herî zarxweş jî bi awayekî adetî îhtiyatê tercîh dikin, li benda daxuyanîya Kongreya çirîya paşîna bê dimînin. Û heke hin kes bi wêrekî li ber lihevkirinan rabin, hingê jî ew tercîh dikin li restoranekê yan jî qehwexaneyekê randevûya xwe bidin û ne li buroya xwe. Bi rastî çi diqewime li rojavayê Bajarê Qedexe, li pişt dîwarên sor ên Zhongnanhai li navenda PKÇyê?

Ji bo ku bibe duyemîn hêza aborî a cîhanê, Pekînê sîstemeke hilberîner a pêdivîya wê pir e bi çavkanîyên aborîyê bi pêş xist û xwe berdaye nav çûyîneke bê-frên di warê madeyên xav de. Erê ew xwe jê dûr digire, lê belê dîsa jî Çîn dikare bi vî rengî bikeve xefika neokolonyalîzmê. Haya Çînê ji cihê wê di nav globalbûnê de heye, ew hewl dide tesîra xwe ya îdeolojîk bi qîmetpêdana ji nû ve ya fîgurê Konfuçyus zêde û berfireh bike. Vegera li hosteyê kal a ku desthilatdarî ji nû ve lê dihizire, civaka Çînê jî eleqeder dike. Li erefa kongreya xwe ya 18ê, Partîya Komunîst ji derxistina pêş a vîzyoneke nûkirî ya marksîzmê bêhtir hewl dide hêrsa civakî kontrol bike.

Cîhana veşartî ya Partîya Komunîst a Çînî

Martine Bulard *









SHANGHART GALLERY

HU YANG. – « Jîyana Shanghai » (Vivre à Shanghaï), 2005

Li taxa Weigongcunê li ser peyarêya fireh a ku Renmin Daxueyê - Zanîngeha Gel, yek ji yên herî kevin ên Pekînê - bi rawestgeha Metroyê ya bi heman navî ve girêdide, şaredarîyê mekîneyeke elektronîk a bi ekraneke destpêdanê û sîstemeke înteraktîf bi cih kirîye, ev makîne destûrê dide ku mirov cihê xwe û rêya xwe li bajêr bibîne. Li herdu alîyên vê makîneyê afîşên sor hene yên ku li ser wan nivîsên Partîya Komunîst a Çînî (PKÇ) xwe nîşan didin, das û çakûç tevî karkerên hêja û birêveberên model li pêş baş xuya dikin. Amûra pir zêde bipêşketî ya teknolojîyê ji bo ku mirov rêya xwe bibîne di nava sîyaseta komunîst de? Weke îhtîmaleke kêm xuya dike ku lekên xwendekaran, para bêhtir cilûbergên modeya herî dawî li wan in - di vê meha hezîranê de şortên seksî yan jî dawên (dêre) pir kurt li keçan in, gomlegên bi tevahî rûniştî yan jî tee-shirt ên ku nivîsên bi ingilîzî li ser wan jî li xortan in - ji vê peyamê fêm bikin. Rewş li Çînê ev e, li devera ku modernîteya bêgem û bêsînor û rêbazên herî kevin bi hev re dimeşin.

Kongreya 18ê ya PKÇyê ku li gorî daxuyanîya fermî wê di "somestra duyem a sala 2012ê" de pêk were, vê nakokîyê nîşan dide. Yek partîya ku ji sala 1949ê ve Çînê li gora dilê xwe bi rê ve dibe sîstemeke nûkirina birêveberîyên navendî sêwirand. Berpirsîyarên herî payebilind ên rêxistin û dewletê (sekreterê giştî yê ku herweha serokdewletê komarê ye, serokwezîr û serokê Meclîsa Neteweyî ya Gel) neçar in bi du dewrên wezîfeyê razî bibin û nikarin ji dehsalan bêhtir birêveberîyê bikin. Temenê herî jor ji bo endamên sazîyên neteweyî (komîteya navendî, mekteba sîyasî, komîteya navendî) weke 68 salan hat dîyarkirin.

Sala 2012ê wê şahidîyê bike li yek ji mezintirîn guhertinên birêveberan ku li welatekî îdîa dike komunîst e, berê qet nehatîye dîtin. Ji neh endamên Komîteya Daîmî ya Mekteba Sîyasî (KDMS) (1) ku navenda desthilatdarîya çînî ye, şûna heftan wê were girtin; ji % 60 ta % 65ê endamên di Komîteya Navendî de wê her weha cihên xwe ji hinên din re bihêlin. Gelo yên ku payeya wan bilind bibe wê li gorî kîjan pîvanan werin eşkerekirin? Li dinyayê girtî ye, tu kes rastîya wê nabêje. Dewra wezîfeyê û bilindkirina payeyan di nava PKÇyê de bi awayê ku adetên serdema Bajarê Qedexe bi bîr bixe, bi awayê sirra herî mezin tên amadekirin, bi navgîna lîstikên tarî yên desthilatdarîyê, bi bêbextîyên makyevelîst, bi kirinên dilsozîyê û bi dekûdolabên xiyanetê.

Bêhtirî duhezar kîlometreyan dûrî wir li Cantonê, Yuehui (em ê vî navî lê bikin da ku tu bela neyê serê wê) shortekî jean, kembereke fireh a hevrîşim lê ne, porên wê dirêj in û bi hûrgulî bi dermanan rûyê xwe xemilandîye, dişibe ciwanên ji çîna navîn hemûyan, li bajêr aram e, di nîqaşan de rehet e. Heke hevalên wê nexwazin behsa sîyasetê bikin, Yuehi pêşî dudilî dibe, piştre bi dilê vê mijarê şîrove dike.

Dayika wê mamoste ye, bavê wê karmendê dewletê ye, wê mastera xwe ya hiqûqê li zanîngeha xwedî prestîj Sun Yat-senê, cihê ku me ew dît, çêkir. Weke dê û bavên xwe ew jî komunîst e. Bi carekê rave dike: “Partî awayekî derdorekê, tevnekê ji bo serketinê pêk tîne. Hinekî weke komeleyeke pîşeyî ye.” Em dikarin wisa bibêjin, yanî ev weke sîgorteyekê ye ku wê alîkarîyê bide da ku mirov karê baş peyda bike, pêre jî wê bilindbûna payeyan misoger be. Piştî navberekê ew sor dibe û rave dike: “ji ciwanîya xwe ve xewna min bû ez bibim komunîst.” Weke piranîya ciwanên çînî ew jî endama rêxistina ciwanan bû. Bi çavên diberiqînin ew dibêje: “dema ku birêveberîya Partîyê ez neqandim ji ber ku ez xwendekareke pir baş bûm, ez pir şa bûm. Ev weke xelatekê bû. Weke cejnekê.”

Pênc salan piştre dildarî nema: “heke careke din were pêşîya min, ez ê careke din nekim. Vê yekê gelek ferz jî bi xwe re afirandin. Divê ez biçim, tevlî gelek civînan bibim, gelek wext li van diçe, lê ya rastî gelek elaqeyên min ên din hene.” Rêxistinên bingehê yên ku di rewşa adetî de betal in, van çend mehên dawîyê gelekî serî li wan hat dayîn; sedema vê jî agirpêketina ji ber ji wezîfeyê dûrkirina birêveberekî navdar ê bi navê Bo Xilai bû. Bo Xilai kir ku cudatîyên di nava PKÇyê de eşkere bibin. Yuehui weha bi axaftina xwe de diçe: “lê belê nexasim divê ez bersivên Partî dide, bidim. Ez azad nînim ku tişta difikirim bibêjim. Ev bi min zehmet e, lewma serxwebûneke min a mezin a fikrê heye.” Bêguman tu kes lê qedexe nake ku derkeve derveyî zimanê weke daran hişk ê fermî. Lê belê ew ê neçar bimîne helwêsta xwe rewa bike, û bi “hevrêyên” xwe re rûbirû bibe ku wezîfeya wan razîkirina wê û anîna wê ya ser rêya rast e. Dibe ku ew karibe xwe piçekî dûr bike heke ji wê taxê bar bike: ji bo wê bes e ku êdî xwe bide jibîrkirin. Lê belê heke ew wezîfeyeke dewletê bike yan jî di şirketeke dewletê de kar bike, hingê ew ê nikaribe ji fermanan xwe xilas bike. Çawa ku dinyadîtîyekî sîstema çînê ê heyfa xwe bi rewşê tîne rave dike: “em ne mecbûr in bawer bikin: em diçin civînan, em çavekî xwe digirin û em dewam dikin...”

Ya rastî ketina nav partîyê ji derketina jê zehmettir e. Para bêhtir sekreter (ê dibistanê, taxê, şirketê, gund) e yê ku wan kesan dineqîne yên li gora wî hêja ne bikevin nav refên partîyê. Heke li hev nehat û mirovek ji qonaxa lîse, yan jî fakulteyê bimîne û heke mirov difikire ku ji bo karîyera wê/wî libakirina ala das û çakûç li serê bi kêr tê, hingê mirov dikare serlêdaneke endametîyê bi şertê destbirayekî partîyê yê mirovî hebe û qebûl bike ku gelek lêkolîn li ser çalakîya wî ya pîşeyî û jiyana wî ya şexsî werin kirin.

Di navbera 2007 û 2012ê de bêhtirî deh milyon kesî tevlî PKÇyê bûn. Hejmara endamên vê struktura derveyî pîvanan bi awayekî fermî 80.6 milyon e - hema hema bi qasî serjimara Almanyayê. Li gorî statîstîkên fermî temenê çaryeka wan di bin 35 salan de ye, û temenê nîvê wan jî di navbera 36 û 60 salan de ye. Nakokî: tevî ku birêveberên komunîst (nexasim ên xwecihî) hê tu caran ji alîyê xelkê ve bi awayekî evqasî eşkere nehatibûn rexnekirin, hê qet evqas zêde namzetên endametîyê çênebûbûn. Sedema vê jî ew e ku karta endametîyê kilîteke bi qîmet e ji bo ciwanan (qet nebe ji bo wan ên ne dewlemend in) û garantîyeke aramîyê ye ji bo Partîyê ku hêvî dike bi vî awayî civakê hêsanîtir kontrol bike.

Kur û keçên komunîst weke întellektuel û ciwanên xwedî dîplome xwedîyê cihekî misoger in, doh muameleya “bûrjûwazîya piçûk” bi wan re dihat kirin, îro bi xwe tejik û berikên sor li ber pîyên wan tên raxistin. Mesele li gorî îfadeya bi dehan caran hatî bihîstin, avakirina “partîya bêqusûr” e. Partî û dewlet herdu yek in, pêdivîya welêt bi personelê perwerdekirî heye. Avakirina elîta xwedî îmtîyaz, peydakirina endaman ji zanîngehên çînî yan jî ji yên biyanî - parkûrek e ku her diçe bêhtir tê tercîhkirin. Lê belê dîsa jî perwerdeya li dibistanên partîyê ferz e.

Hema ku mirovek wezîfeyên girîng li herêman yan jî li asta navendî bigire, derbasbûna di endametîya vê dezgeha sîyasî ya bilind re ferz e. Mandarînên (çînîyên) nû wê xwe fêrî kitekitên marksîzma bi awayê çînî û qurnazîyên sîyaseta kêlîyê bikin û di heman demê de di mijara birêveberîya dewletê de jêhatîbûnên mezin bi dest bixin. Çawa ku li Şangayê jî wisa ye, dibistana sor a bi şoreşê re ava bû û dibistanên îdarî yên ku bi reformên salên 1980yî ava bûn û hemkufên Dibistana Neteweyî ya Îdarî (ENA) ya fransî ne, bi hev re di heman avahîyê de ne. (2) Profesorên çînî û bîyanî yên herî navdar tên vexwendin da ku li wan dersan bidin; dibistana Cantonê pesnê xwe dide bi anîna aborîzanên herî mezin ên amerîkî. Danîşanên Powerpointê ên ku bandorê li tevahîya teknokratên qedrê xwe digirin dike, her zêde dibin. Gihiştina înternetê serbest e. Tu pirtûka bîyanî heta ya herî zêde rexnegir jî ne qedexe ye. Kurt û kurmancî dema mesele perwerdekirina elîta birêveber e, Partî qet texsîr nake, çi jê tê wê dike.

Tevî daxwazên me jî mimkin nebû ku em bikevin hundirê dibistana navendî ya Pekînê, ya ku Xi Jinping, kesê herî girîng ê siberojê, wê bi rê ve dibe. Lê belê du rojnamevanên China Dailyê yên bi navê Chen Xia û Yuan Fang (3) ketin nava vê cîhana taybet ya ku lê giregirên komunîst ên ji wilayetan, ji herêman û ji Pekînê tên, hatine cem hev. Hefteya pêşî xwendekarên ji dinyayê qut - nivîskar wisa dinivîsin “heta bi sekreter û şofêr jî divê li derveyî hemîyên dibistanê bisekinin” - “di ezmûnên ji bo nirxandina zanîna wan a teorîk - di navê de hîmên maksîzmê jî” re derbas dibin. Paşê li koman tên dabeşkirin ku wê dersên li ser mijarên cihê bibînin: dîroka Partîyê, dîn, pirsgirêka hindikahîyan, şerê li dijî bertîlxwurîyê, pêşîgirtina li HIV-Aidsê... Ev hemû wê ji bo guftûgoyan bên cem hev, di van guftûgoyan de ji herkesî tê xwestin ku fikra xwe bi awayekî bi tevahî azad derbibire. Lê belê hîyerarşî dimîne: xwendekarên ji wîlayetan bi yên li herêman yan jî li paytextê wezîfedar re naxwînin, naxwin û ranazên.

Chen û Yuan dinivîsin ku li dibistanê çîneke taybet heye ku ji kadroyên temenê wan di navbera 45 û 50 salî de pêk tê, ku wê “pişta hukûmeta siberojê” pêk bînin û bi giştî salekê diçin dersan. Hersê mehên pêşî ji bo xwendina klasîkên mîna Das Kapital a Karl Marks yan jî Anti-Dühring a Friedrich Engels re hatibe veqetandin jî, xwendekarên dibistanê perwerdeyeke kûr û bi bingeh a li ser tevahîya mijarên birêveberîyê dibînin: pergala qanûnçêkerîyê, çêkirina budceyekê, kontrola malî, sîyaseta derve, birêveberî, îdareya personel, lê belê herweha tinekirina bertîlxwurîyê, rêbazên çareserkirina pirsgirêk û lihevnekirinan... Bi vî awayî em şahîdîyê li pisporkirineke birêkûpêk û cidî a birêveberan dikin.

Belê dibistan herweha weke bêjingeke neqandinê jî bi kêr tê. Herdu rojnamevan kite bi kite dibêjin, beşa zêde xurt a rêxistina navendî ya ku serwerê karûbarên partîyê ye, wezîfedarkirinên li hukûmetê, li çapemenîyê (bi beşa propagandayê re), li zanîngehan, li şirketên dewletê, “pir caran qasidan dişîne da ku bikevin dersan û tevlî nîqaşan bibin,






armanc jî ew e ku xwendekarên herî baş ên sinifê ji bo payebilindkirineke siberojê, nas bikin. Profesorekî ji me re got, rojekê xwendekarekî, ji ber cirnexweşîyê ji dersê hatî derxistin (...), dît ku karîyera wî bi dawî dibe". Em evqasî bibêjin, dildarên ku dixwazin bibin xwedîyê berpirsîyarên bilind berîya ku sêwirandina fikreke rexnegir ji devê xwe derxin divê zimanê xwe di nava devê xwe de gelekî bigerînin.

Kadroyekî PKÇyê yê wezîfedar ê ku berîya bi çend mehan qebûl kir bi me re bipeyive, di bin perdeya anonîmtîyê de di ber xwe re bi gazin dibêje "ev ne şans e, ev timî prîma sernermîyê ye". Ew bi bîr dixe ku pîvanên bipêşketinê bi awayekî fermî hatine dîyarkirin: ne kêmî heftêyî (4) ne, di nava wan de asta xwendinê, dinyadîtîbûn û heke mirov xwedîyê erkekê ye hingê jî encamên bi dest xistî; weke mînak di mijara veberhênanan yan jî qalîteya hewayê de. Em "îstîqrar"a navdar jî ji bîr nekin: tevahîya acizîyên li nîzama dewletê ya li asta neteweyî deng vede dibe sedema notên xirab û karîyerê frên dikin. Di rewşekê de ku şefafî nîne, keyfiyet serdest e ... û çêkirina elîteke perwerdekirî dewam dike.

Aborîzan, kevne-birêveberê ajansa Xinhau (Çîna Nû) ji bo mijarên hundir Yang Jisheng misoger dike ku "piştî pêşîlêvekirinê û heta bi nîvê salên 1990î mirovekî li asta jêr, heke karekî wî hebûya dikarîbû di erka xwe de bilind bibe. Lê belê îro êdî ev ne mumkin e". Li qahwexanyeke hinekî kevin ji derdora keviya çarem a Pekînê û wêde ew ji me re behsa serhatîya pirtûka Analîza tebeqeyên civakî yên Çînê (5) dike, ev pirtûk li Hongkongê hat weşandin (û bi dizî hat belavkirin), paşê li parzemînê hat weşandin, li wir ew berîya çapa heyî ya sala 2011ê du caran hat qedexekirin. Nivîskarê hê jî komunîst tu carî netirsîya, tevî ku wî tilîya xwe danî ser yek ji birîn û derzên sîstemê jî: avakirina sinefeke/çîneke warîs.

Li gorî wî "êdî cihguhertina civakî nemaye. Bi piranî cih ji zarokên kadroyan re ên ku baştir perwerdebûne, hatine veqetandin. Ji bo nifşê piştî reforman hatî dinê em dikarin bibêjin, yek awayê çêkirina tebeqeyên civakî heye: zarokên kadroyên partîyê û/yan jî yên erkên dewletê dibin kadro; zarokên dewlemendan dibin dewlemend; zarokên xizanan jî xizan dimînin". Ya ku li Rojava dikare banal xuya bike, li welatekî îdîa dike ku "desthilatdarîya gel" û "sosyalîst" be gelek caran ezmûnek e ku mirov nikarin xwe lê ragirin, her çiqasî ev yek bi rengê çînî bibe jî.

Ya rastî, "kurên mîran" - zarokên birêveberên dîrokî yên partîyê (taizi dang) - xwedîyê erkan in di nava çerxa (çaryeka mekteba sîyasî ya niha), lê belê nexasim jî li serê şirketên mezin ên dewletê yan jî yên nîv-dewletî. Dibêjin ku ew reqabetê dikin bi wan birêveberan re ku ji malbatên mutewazîtir tên, karîyera xwe di nava rêxistina ciwanan de kirî ên bi navê tuanpai ên ku serokdewletê niha Hu Jintao û serokwezîrê wî Wen Jiabao nûnerîya wan dikin. Serokdewletê siberojê Xi, kurê milê rastê yê Zhou Enlai ji koma yekem e, li hemberî vê talibê meqama serokwezîrîyê Li Keqiang bi xwe ji koma duyem e. (6)

Gelo ev şerekî çînan e di nava PKÇyê de? Heke tevgerên fikrê - ên fermî nehatî qebûlkirin - hebin jî, cudatîyên diyar ên di nava Partîyê de ne girêdayî kokên birêveberan in. Berîya ku ji dika dewletê wî bikin der, Bo yê hingê patronê bajar-herêma Chongking (nufûsa wê 32.6 milyon e) û kurê yek ji birêveberên dîrokî yên şoreşê, pêşengîya mafên civakî ji bo karker-gundîyan (mingong) û dijminê eşkere yê promotoran [kesên gava pêşî diavêjin; nota wergêr] bû, lê belê ew herweha şampîyonê dozên belawela ye yên ku kêm girîngîyê bi mafê mirovan didin. Hezar û pênc sed kîlometreyan di hewayê re dûrî wir, mezinê Guangdongê, cihê ku şirketên mezin ên îxracatê lê bi cih bûne, Wang Yang ê ku ne bi das û çakûçekî di dev de ji dayik bûyî, bi dilsozî lîberalîzma aborî dişopîne, pêre jî pesnê pêşîlêvekirina sîyasî û azadîyên gelemperîyê dide. Em li vir dibînin ka çiqasî bi tehlûke ye mirov civaka Çînê bi referansên sîyasî yên Rojava analîz bike: reformator yan muhafezekar, rastgir yan çepgir - tevî ku di nava wan de nostaljîkên Mao Zedûng, întelektuelên parastvanê mafên civakî jî hin kes hez dikin xwe weke "sîyaseta çepê ya nû" bi nav bikin.

Cudatî dikarin bi şîdetê (sembolîk) jî werin çareserkirin, çawa ku di bûyera Bo de qewimî. Sekreterê komunîst ê Chongqingê yê navdar e bi dijberîya xwe ya bertîlxwurîyê, bi bertîlxwarinê û nostaljîya maoîst hat gunehbarkirin û Pekînê ew hema ji wezîfeya wî dûr xist. Serokwezîr Wen bi girîngî ev peyv derxistin pêş: "rîska vegereke li Şoreşa Çandî heye".

Di nîqaşên şexsî de ev versîyona fermî gelek caran dikeve ber lêpirsînê. Hema ku Partî be ya ku belgeya gunehbarîyê amade dike - û ne dadgerîyeke serbixwe -, hingê zehmet e mirov şaşî û rastîyê ji hev derxe. Bi herhalî bertîlxwarin li Çînê ewqasî kok û rehên xwe kûr berdane, ne dûrî aqilan e ku birêveberê Chongqingê ji bo berjewendî û kara xwe hiştibe klanek şûna ya din bigire. Bi heman awayî mirov nikare li ber rabe û înkar bike ku wî "stranên sor" li gorî tahm û modeya îro vejandin. Lê belê ji vir mirov bigihêje wê encamê ku wî dixwest li kêlîyên herî xirab ên moîzmê û muhafizên sor vegere, ev gavek e ku ji bo wî bi tehlûke ye biavêje. Yek ji serredaktorên rojnameya Cantonê Nanfang Zhoumo meseleyê ji hev derdixe: "Tu maneya vê nîne." Ev teqawidê şêst salî, lê belê hê jî çalak ê ku mêvandarîya me dike li buroyên şirketeke çapemenîyê ya ku bi lêkolînên xwe yên qirêjjêbir tê nasîn, vê îdîayê dike: "Hin şêl û helwêst dikarin serdema Şoreşa Çandî bi bîr bixin. Lê belê ji hingê ve xelk fêr bû; xelk bêhtir perwerdebûyî ye, fikra wan vekirîtir e. Vegereke ber bi paş ve nabe ku bibe."

Dîrokzanê mîmarîyê li zanîngeha Sun Yat-senê, pisporê danasînên elaqedarî Şoreşa Çandî, profesor Feng Yuan ê ku sala 1964ê di serdema dînûharbûna maoîst e ji dayik bûyî, diyar e lê nafikire çi dibêje: "dibe ku di nava yên herî kevin de nostaljîk jî hebin. Lê belê ev marjînal e. Li hemberî vê, li cem ciwanan referansên li Mao îşaret bi du heqîqetan dikin: nerazîbûna ku rêya ne ji bo xweîfadekirinê ne jî ya çareserîyê nabîne, tevî hisa ku doh civak bêhtir wekhevîxwaz bû û kêmtir çor û qebe; û bandora awira rexnegir a li vê demê." Hukmê fermî yê li ser Mao Zedûng û serdema hukimdarîya wî hê jî bi formulê cewherî bi kurtî tê îfadekirin: "% 70yê baş, % 30ê xirab" û lêkolînên rexnegir jî zehmetîyê dikişînin ku ji xwe re rêyekê peyda bikin. Feng der barê vê de bi hin tiştan dizane, hê nû ji sê gotarên wî yên li ser mijarê ku diviyabû di berhemeke dersên wî têde bên weşandin, didu jê hatin qedexekirin. Em fêm dikin ku ew doza karekî dîrokî yê hevgirtî, yê ji tevahîya bikaranîn û îstîsmaran - yên ji bo doza baş jî di navê de - parastî, dike...

Hetikîna Bo wê bêguman wisa bi encam nebûya heke nîqaş serbest bûna û tevgerên fikrê bihatana qebûlkirin, çawa ku serokdewlet Hu jî di destpêka dewra serokatîya xwe ya duyem de soz dabû. Ev angajman hat jibîrkirin, lê belê hatina hember hev a îdeolojîk di nava çerxa desthilatdarîyê de li gorî berê hindiktir li ber teqînê nîne. Ev hatina hember hev di naverokê de parabêhtir li ser dewra dewletê (û Partîyê) û herweha li ser naveroka reformên civakî û sîyasî ye.

Û di nava vê hemûyî de cihê sosyalîzma bazarê ya bi şêwazê çînî çi ye? Di broşura fermî ya bi navê Hûn der barê partîya komunîst a çînî de bi çi dizanin? de em dixwînin: "ev bikaranîneke afirîner a sosyalîzma Marks û Engels damezrandî ye. (...) Sêwirandina sîstema wê şahidîyê dike li marksîzmeke li ser rêya bipêşketinê". Bêguman tu komunîst wê bi xwe ranehêje vê fikra fosîlbûyî. Lê belê pirsgirêk sihê weke xwe li




ber me dimîne. Pisporê têkilîyên civakî di şirketê de profesor He yê ku di navbera Canton û New Yorkê de diçe û tê, qebûl dike ku "di navbera kapîtalîzma amerîkî û ya çînî de cudatîyeke bi rastî nîne." Ew dibêje, lê belê li Çînê "em hewl didin çarenûs û rewşa karker û gundîyan baş bikin - ev ji cewherê wê ye". Ev zêde beloq nîne û bi herhalî, ev ji bo terîfkirina sosyalîzmê hinekî kurt e. Bêguman ev yek nirxpêdana îdeolojîyeke şûngirtinê rave dike: konfuçyanîzm.

Kevnecîgirê şaredarê Cantonê yê ji fînansan berpirsîyar Liu Jinxiang pêre li hev dike. "Heke tiştê em ji sosyalîzmê fêm dikin bêhtir wekhevî be, hingê Swêd ji Çînê sosyalîsttir e. Li vir gelek alîyên civaka kevin dewam dikin. Mirov êdî baş pê nizanin ka bi ku de biçin. Pîvanên me êdî nînin. Modela me êdî nîne. Em çawa sîstema xwe binirxînin û terîf bikin? Aborîya bazarê, sosyalîzm, kapîtalîzma dewletê... Yek ji van têgehan jî bi rastî destûrê nade danasîna wê; Ji ber vê yekê sergêjîyeke bi vî rengî serdest e li ser rîya ku em bidin ber xwe. Divê em xebateke mezin a teorîk bikin. Em dikarin wisa bifikirin ku em li qonaxa kapîtalîzma dewletê ne weke navgîneke avakirina civaka sosyalîst ku lê her ferd wê xwedîyê bêhtir cihî be." Ev armanc hemin hêja ye mirov pesnê wê bide, lê em di xebatên amadekar ên kongreya PKÇyê de havênê sêwirandina guhertineke rêya sîstemê dayî ber xwe nabînin.

*Nûçevanê *Le Monde diplomatique*ê

(1) Piştî kongreyê KDMS êdî wê ne ji neh endaman belê ji yanzdeh endaman pêk were.

(2) Emilie Tran, "Ecole du parti et formation des élites dirigeantes en Chine / Dibistana Partîyê û Perwerdekirina Elîtên Birêveber li Çînê", Cahiers internationaux de sociologie, hejmar 122, Presses universitaires de France, Parîs, 2007.

(3) Chen Xia û Yuan Fang, "Inside the Central Party School / Nava Dibistana Partîyê ya Navendî", China Daily, Pekîn, 5ê gulana 2011ê, www.china.org.cn.

(4) Richard McGregor, The Party, HarperCollins, New York, 2010.

(5) Bi tenê bi çînî.

(6) Laurent Ballouhey, "Fils de prince et président/Kurê mîr û serokdewlet" û "Le plus jeune des hauts dirigeants / di nava birêveberên payebilind de yê herî ciwan", di "Chine, état critique / Çîn, dewlet, rexne" de, Manière de voir, hejmar 123, hezîran-tîrmeh 2012.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê






Hê tu caran pevguherînên bazirganî yên di navbera Çîn û Afrîkayê de negihiştibûn rekoreke bi vî rengî; di nava du salan de % 89 zêde bûn. Pekîn bazarên parzemîna reş bi berhemên xwe xerk dike û mînaralên jê re pêwîst jî jê peyda dike. Împeretorîya Navîn [Çîn] li dûv çavkanîyên enerjîyê veberhênanên xwe yên li welatên başûr zêde dike. Lê belê ew hez dike ku têkilîyên kolonyal bi wan dewletan re daneyîne ku madeyên wê yên xav dabîn dikin. Lê di vê mijarê de ew hê jî bi ser neketîye...

Pekîn, desthilatdarîya nepenî, hêza cîhanî

Gelo Çîn emperyalîst e?

Michael T. Klare *

Lîderên çînî di danûstendinên xwe yên dualî yên bi cîhana li ser rêya bipêşketinê re timî îdîa kirin ku welatê wan jî neteweyekî li ser rêya bipêşketinê ye û Çîn wê tu caran texlîda helwêstên neheq, mêtinkar ên hêzên împeryal ên kevin neke. Serokdewletê Çînê **Hu Jintao** di foruma Hevkarîya Çîn-Efrîkayê ya li Pekînê de 19ê hezîranê got "*Çîn welatê herî mezin ê dinyayê yê li ser rêya bipêşketinê ye, Efrîka jî mala hejmara herî zêde ya welatên li ser rêya bipêşketinê ye. Gelên çînî û yên efrîkî timî bi jidilî û dostanî muameleya hevtayên hev bi hev re kirin, alîkarîya dualî berfireh kirin û bipêşketina hevpar dewam kirin.*" (1)

Hêsan e ku mirov daxuyanîyên bi vî rengî weke qalibên standart ên dîplomatîk, ên ku di rasthatinên fermî yên bi vî rengî de bi awayekî pêwîst tên dubarekirin, kêmnirx bike. Lê belê tu sedem nîne ku mirov li jidilbûna lîderên Çînî bipirse, yên ku bi tevahî haya wan ji gelek piçûkxistinên welatê wan bi destê hêzên împeryal ên ewropî û Japonyayê, heye. Dîsa jî, lîderên niha ên Çînê di nava neçarîyekê de asê mane û bist bûne: ji bo ku rêjeyeke bilind a mezinbûna aborîyê li welatê xwe dewam bikin – mijara wan a herî li pêş e – divê ew mîqdarên her zêde dibin ên petrolê û madeyên din ên xav ji dabînêrên bîyanî peyda bikin. Û ji bo ku gihandina jihevqutnebe ya van çavkanîyan misoger bikin, ew jî ketin xefka heman çarenûsa têkilîyên patronmişterî yên bi hukûmetên welatên dabînêr re – gelek ji wan bertîlxwur û nedemokratîk in – ev têkilî ji mêj ve ji alîyê hêzên sereke yên rojavayî ve hatibûn hûnandin û parastin.

Ev mijareke tercîh û îdeolojîyê nîne, lê belê bêhtir ji mentiqê pêşî lê nayê girtin ê girêdana bi çavkanîyan ve tê. Çawa ku dewletên xizan ên xwedîyê rezervên mezin ên petrol, sifr û madeyên din ên xav ên giranbiha dibin qurbana "boşîya çavkanîyan" a ku di bin barê wê de ew êşa peydabûna rejîmên her li karê digerin ên otorîter ên hêzên ewlekarîyê yên mûçeyên wan baş wan diparêzin dikişînin, welatên sereke yên îtxalker jî pirî caran derdekî dikişînin ku mirov dikare weke "boşîya berevajî ya çavkanîyê" bike têgeh, bi vê belayê ew dibin hevkarê saxmayîn û dewamkirina van rejîman bi xwe. (2) Û çiqasî girêdayîbûna bi maddeyên xav ên ji van rejîman dabînkirî ve zêde bibe, ewqasî gavên xurt dikarin biavêjin da ku saxmayîna hevkarên xwe yên ji deryayê û wêde misoger bikin.

Ev motîf weke mînak di girêdanên Amerîkayê bi meliktîyên petrolê yên li Kendava Farsî ve piştrastkirî ye. Serokê DYAyê **Franklin Delano Roosevelt**, weke lîderên çînî yên roja me ya îro, li dijî împeretorîyan û feodalîzmê di hinavên xwe de xwedîyê kînekê bû. Bi herhalî, di dema şerê Cîhanê yê Duyem de şêwirmendên wî ew agahdar kiribûn ku erdên petrolê yên amerîkî hatibûne ber miçiqînê, di asteke hewarê de bûn ku ji bo Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê wê pêwîst be çavkanîyeke mirov dikare pê piştrast be ya bîyanî peyda bike – tercîh meliktîya Erebîstana Suûdî bû, yekane hilberînerê mezin ê petrolê yê Rojhilatê Navîn ku hingê ne di bin kontrola Brîtanyayê de bû. Ji bo bigihêje vê armanca xwe, Roosevelt bi melik **Ebdul Ezîz ibn Saûd** re sibata 1945ê rûnişt û bi wî re bi awayekî nefermî li hev kir, li gora vê lihevkirinê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê wê meliktî di warê eskerî de biparasta û di berdêla wê de jî ew ê bibe yekane dewleta ku wê karibe bigihêje petrola suûdî. (3) Sal derbas bûn û pêre pêre şertên vê lihevkirinê hatin guhertin – malbata meliktîyê ya suûdî niha xwedîyê erdên petrolê ye û ne şirketên amerîkî – lê belê ew dîsa jî birêveberê sereke yê sîyaseta DYAyê ye li herêmê.

Heke di vê mijarê de wan bikarîya tercîhek bikiraya, lîderên amerîkî wê bixwesta îtxalata petrolê ji neteweyên dost, biîstîqrar û mirov dikare xwe bisipêre wan ên weke Kanada, Meksîka, Meliktiya Yekbûyî û endamên din ên Rêxistina ji bo Hevkarî û Bipêşketina Aborî (OECD) bike. Lê belê rastîyên jeolojîya petrolê dikin ku ev yek nemimkin be. Erê, welatên endamê OECDyê hê jî miqdarên mezin ên petrolê hildiberînin, lê belê petrola herî zêde ya dinyayê ya mayî li welatên li derveyî OECDyê ne, li Afrîka, Rojhilatê Navîn, Yekîtîya Sovyetê ya berê û niha êdî bi keşfên xwe yên "pre-salt [berî xwêyê]" yên li peravan Brezîlyayê ne. Li gorî şirketa dêw a petrolê BPyê ji sedî 86ê rezervên petrolê yên dinyayê yên piştrastkirî li welatên derveyî OECDyê ne. (4) Tercîhên Washingtonê çi dibin bila bibin, hingê ew neçar bû girêdayî petrola ji welatên nedost, nebiîstîqrar û bawerî bi wan nayê be – û vê yekê kir ku DYA bi kûrahî bikeve nava sîyasetên van welatan bi avakirina hevgirtinên bi lîderên tercîhkirî û bi gurçûpêçkirina wan bi bêhejmar şewazên eskerî.

Rêyeke dişibe vê mirov dikare di rabihurîya hêzên din ên mezin û elaqedarî çavkanîyên din ên heyatî de jî bibîne. Berîya û piştî Şerê Cîhanê yê Yekem hêzên împeryal ên ewropî tevî Japonyayê ji bo kontrolkirina erdên li Asya, Afrîka û Rojhilatê Navîn şer kirin, ew difikirîn ku ev erd di warê petrol, komir, lastîk û gelek şiklên mîneralan de dewlemend in; di rastîyê de ev cewherê kolonyalîzmê bi xwe bû. Ji bo mimkinkirina derxistina çavkanîyên giranbuha, hêzên mezin yekeyên bihêz ên anonîm yan afirandin yan jî bi wan re li hev kirin da ku li van erdan bixebitin – carinan bi destê şirketên dewlet xwedîyê wan, carinan bi şirketên hema hema taybet. Piştî serxwebûnê van yekeyan – şirketên weke ***British Petroleum*** (şirketa petrolê ya anglo-îranî ya berê dewlet xwedîyê wê), Total S.A. (bi tevlîbûna gelek şirketên petrolê yên dewlet xwedîyê wan hat afirandin), û ENI (şirketa berê dewlet xwedîyê wê ya bi navê Ente Nazionale Idrocarburi) – operasyonên xwe li kolonîyên berê dewam kirin, di rewşên adetî de bi elîtên xwecihî re girêdanên xurt pêk dianîn û pozîsyona biîmtîyaz ya ku wan berê di bin birêveberîya kolonyal de jê sûd werdigirt, dewam dikirin.

Ev ew dîrok û rê ye ku lîderên çînî hewl didin di danûstendin û muameleya xwe ya bi cîhana li ser rêya bipêşketinê re xwe jê xilas bikin. Û têra xwe delîl hene ku haya wan ji vê potensîyalê heye û ew gavan diavêjin da ku vê şaşîyê nekin. Weke mînak di Foruma Hevkarîyê ya Çîn-Afrîkayê ya li Pekînê de serokdewlet **Hu** ragihand ku Çîn wê di nava sê salên li pêşîya me de 20 milyar dolaran deyn bide welatên afrîkî da ku çandinîyê, binesazîyê û hewldanên bazirganîya piçûk bi pêş bixin. Hu û rayedarên payebilind ên çînî yên din herweha xwe bi tu meyla destwerdana karên hundir a dewletên dabînêr nakin. Li gorî rayedarên çînî ev helwêsteke hêzên rojavayî ye. Dîsa jî, dîyar e zehmet e ji bo Pekînê ku xwe ji tevlîhevîya sîyasî xilas bike ya ku ji mêj ve dimeşe bi hewldanên Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û hêzên din ên rojavayî yên ji bo derxistina çavkanîyên giranbiha ji deverên cîhana li ser rêya bipêşketinê.

Berê Çînê di warê madeyên xav ên herî heyatî de bi zêdeyî têra xwe dikir, lê belê ji dema ku aborîya wê di salên 1980yî de bi firê ket û vir ve pir zêde girêdayî van madeyên xav bû. Di mesela petrolê de weke mînak, Çînê dikarî heta bi salên 1993yê xwe bisipêre çavkanîyên nava xwe, lê belê piştre dema daxwaz zêde bû, dest bi îtxalkirina ji çavkanîyên bîyanî kir û miqdara vê îtxalkirinê jî ji hingê ve her çû zêde bû. Çawa ku di tablo **I** de tê nîşandan, îtxalatên petrolê yên Çînê di navbera 2000 û 2010ê de ji sedî 233 zêde bû, ji rojê 1.5 milyon barîlan firîya û gihişt rojê 5 milyon barîlan (mbd); heke texmînên heyî piştrast bibin, di nava 25 salên li pêşîya me de ev îtxalat wê hê ji sedî 132 zêde bibe û sala 2035ê bigihîje 11.6 mbd.

Ya rastî hin analîst bawer dikin ku îtxalatên petrolê yên Çînê wê gelekî zêde bibin, sedema vê ya sereke jî wê fîloya welêt a wesaîtan a bi lez mezin dibe be. Lêkolînerên li ***Baker Institute of Rice University*** li Houstonê xwe disipêrin senaryoyeke ku li gorî wê Hilberîna Hundir a Nesafî (HHN) ya bi rastî wê salê nêzî ji sedî 6 zêde bibe heta bi sala 2030ê û texmîn dikin ku hejmara otomobîlan li Çînê wê ji 63 milyonên sala 2009ê dê sala 2020ê bigihêje 210 milyonan û sala 2040ê jî bigihêje hejmara ku mirovan ecêbmayî dihêle 770 milyonî.

Deyndayînên bi avantaj... birêveber dest diavêjin navgîn û pereyên mezin da ku parzemîna reş qayîl bikin

Ew wî hesabî dikin ku wesaîtên wê zêde bibin bi piranî wê bi petrolê bixebitin û texmîn dikin ku daxwaza Çînê ya petrolê ya giştî sala 2040ê wê gihiştibe 19 mbd – hema hema heman mîqdar e ku li gorî texmînan wê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê jî hingê serf bikin. (5) Lê belê tevî ku Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê wê karibin ji sê paran diduyên pêdiviya xwe ya petrolê ji nava welatê xwe yan jî Kanadaya cîran dabîn bikin jî, Çîn bi xwe wê bi tenê karibe ji bo ji çar paran yekê pêdivîya xwe xwe bisipêre çavkanîyên xwe û bi vî awayî wê neçar be ya mayî ji Afrîka, Rojhilatê Navîn, Başûrê Amerîka û welatên Yekîtîya Sovyeta berê îtxal bike.

Girêdana her diçe mezin dibe ya Çînê bi îtxalkirinan ve di madeyên din ên pêwîst ên ji bo dewamkirina mezinbûna aborîya heyatî de jî bi delîl dîyar e. Ji bo ku di hilberîna elektrîkê de di nava bîst û pênc salên li pêşîya me de destûrê bide mezinbûneke di ser ji sedî sed re ya ku mirov hêvîyê jê dikin, Çîn divê serfkirina xwe ya komir, gaza xwezayî û ûranyûmê zêde bike; tevî ku Çînê berê di warê van hersê sotemenîyan de têra xwe dikir, ew her diçe bêhtir girêdayî îtxalkirinan dibe da ku bersivê bide pêdiviya xwe ya bi van hersê sotemenîyan.

Weke mînak di mijara gaza xwezayî de li gorî texmînan îtxalat wê ji sifira sala 2005ê bigihêje 87 milyar kubîk merteyên sala 2020ê û 118 milyar kubîk metroyên sala 2030ê. Piranîya van îtxalkirinan dîyar e wê bi şewazê lîkîd ê gaza xwezayî (LNG) ji Rojhilatê Navîn û Başûrrojhilatê Asyayê were yan jî bi xeta lûleyan ji Rûsya û Tirkmenistanê. (6) Çîn wê dewam bike û piranîya komira xwe ji çavkanîyê hundirê welêt dabîn bike, lê belê tengasî û astengên li pêşîya hilberîn û veguhestinê kirin ku ji bo herêmên li peravên deryayê yên aborîya wan pir mezin dibe, îtxalkirina komirê ji Awusturalya û Îndonezyayê bi tesîrtir û erzantir be. Di encamê de îtxalkirina komirê ya Çînê ya ku berîya sala 2009ê sifir bû, di sala 2011ê de firîya û gihişt 183 milyon tonan (7) ev hejmar jî mirovan ecêbmayî dihêle. Bi heman rengî li Çînê daxwaza ji bo mîneralên îtxalkirî jî pir zêde bû, di nava van mîneralan de madenên sereke yên pîşesazîyê yên weke hesin û sifr jî hene, belê herweha mîneralên taybet ên mîna kobalt, kromîyum û nîkelê jî hene ku ji bo elektronîkên bipêşketî û têkelhevên pir zexm pêdivî bi wan heye.

Çawa ku girêdana Çînê bi van madeyan û madeyên din ên îtxalkirî ve zêde bû, misogerkirina ewlekarîya dabînkirinê jî veguherî mijar û fikareke sereke ya serokatîyê. Ji bo rayedarên herî payebilind ên hukûmet û partîyê dewamkirina mezinbûna aborî ya xurt mijara herî li pêş e û nabe ku destûr were dayîn da ku tiştek li pêşîya vê yekê bibe asteng. Çawa ku alîkarê wezîrê karên derve **Le Yucheng** bi samîmîyeteke neadetî îşaret pê kir "*mijar û wezîfeya herî girîng ji bo Çînê ew e, misoger bike ku nufûsa* [wê] *ya 1.3 milyar karibe xweş bijî û hûn dikarin lê bifikirin bê çiqasî karekî giran e û ev yek zexteke çiqasî giran li hukûmetê bar dike. Ez bawer dikim tu tiştê din a ji vê girîngtir nîne. Her tiştê din divê xizmeta vê wezîfeya navendî bike.*" (8) Dabînkirina ji hev qut nabe ya çavkanîyên îtxalkirî bi mîqdarên her diçe zêde dibe yek ji hêmanên heyatî yê vê "wezîfeya navendî" ye û bi vî awayî danîna têkilîyên dabînêr ên navneteweyî yên bawerî bi wan were jî armanceke heyatî ya sîyaseta derve ye.

Weke hevpîşeyên wan ên li Rojava, lîderên çînî bi tevahî bi tehlûkeyên qutbûna dabînkirinê di encama lihevnekirinên sivîl, guhertina rejîmê û şerên herêmî yên li cîhana li ser rêya bipêşketinê de pir baş dizanin. Ji bo daxistina asta herî jêr a van tehlûkeyan – dîsa gava xwe diavêje şiverêyeke dirêj a ji mêj ve hêzên rojavayî şikil dayîyê – Çînê hewl da çavkanîyên xwe yên dabînkirinê zêde û pir hejmar bike, bi dabînêrên xwe yên sereke yên bîyanî re girêdanên sîyasî yên xurt bi pêş bixe û hîseyan di rezervên enerjî û mîneralên ji derve de bi dest bixe. Dema ku ev gav weke gelekî girîng tên dîtin ji bo dewamkirina mezinbûna


Tablo I:

Serfkirin, hilberîn û îtxalkirinên petrol û gaza xwezayî yên Çînê


	Rabihurî			Texmînên ji bo siberojê				
	2000	2005	2010	2015	2020	2025	2030	2035
Petrol								
Serfkirin, mbd	4.8	6.9	9.1	12.1	13.6	15.6	16.4	16.9
Hilberîn, mbd	3.3	3.6	4.1	4.0	4.2	4.8	5.2	5.3
Îtxalkirin, mbd	1.5	3.3	5.0	8.1	9.4	10.8	11.2	11.6
Gaza xwezayî								
Serfkirin, bcm	24.5	46.8	109.0	148.4	190.4	240.8	285.6	322.0
Hilberîn, bcm	27.2	49.3	96.8	86.8	103.6	131.6	168.0	204.4
Îtxalkirin, bcm	-3.3	-2.5	12.2	61.6	86.8	109.2	117.6	117.6

Jêder: Rabihurî ji BP, *Statistical Review of World Energy 2011 / / Lêkolîna Statîstîkî ya enerjîya Cîhanê 2011*, rûpel 8, 9, 22, 23; texmînên ji bo siberojê US Department of Energy, *International Energy Outlook 2011 / Siberoja Enerjîyê ya Navneteweyî*, Tabloyên 6, A5, A6, E1.

mbd = rojê milyon barîl; bcm = milyar kubîk metre



Çavkanî: OMC; Cnuced; OCED; Sipri; Patrick Artus, Jacques Mistral
Û Valérie Plagnol, "L'émergence de la Chine: impact économique et implications de politique économique / Derketina holê ya Çînê: bandora aborî û pêbûna sîyasî aborî", Conseil d'analyse économique, 2011; Benedicte Vibe Christensen, "China in Africa. A macroeconomic perspective / Çîn li Efrîkayê: Perspektîveke Makroekonomîk", Working paper 230, Center for Global Development, çiriya paşîn a 2010ê; Bureau national des statistiques de Chine.



aborîyê, lîderên çînî bêguman bawer dikin ku divê ev gav di bin kontrola hukûmeta navendî de û bi destekeke xurt a tevahîya hêmanên hukûmetê werin avêtin – di nava van hêmanan de banke û şirketên dewlet xwedîyê wan, yekîneyên dîplomatîk û artêş jî hene. (9)

Di mijara petrolê de weke mînak, hukûmetê stratejîyeke *"go out / biçe derve"* qebûl kir ku li gora wê çav li rê ye ku sê şirketên dewlet xwediyê wan ên welêt – ***China National Petroleum Corporation*** (CNCP), ***China National Petrochemical Corporation*** (SINOPEC) û ***China National Offshore Oil Corporation*** (CNOOC) – hîseyan di erdên petrolê yên bîyanî de bi dest bixin û bi ***şirketên petrolê yên neteweyî*** (ŞPN) re yên şirketên li derveyî welêt hildiberînin ên weke ***Saudi Aramco***, ***Petróleos de Venezuela S.A.*** (PdVSA) û ***Sociedade Nacional de Combustíveis de Angola*** (Sonangol) tevlî teşebusên hevpar bibe. Dîmenekî weke vê xwe di pîşesazîya kanan de jî da der, li vê qadê şirketên dewletê ên weke ***China Minmetals Corporation*** û ***China Nonferrous Metals Mining Group*** stratejîyên xwe yên "go out" şopandin, di nava vê stratejîyê de kirrîna kanan li gelek deveran û tevlîbûna nav teşebusên hevpar bi şirketên din ên mezin re hene. (10)
Ji bo vê gelek dîplomasî ya rayedarên payebilind ên çînî pêwîst bû, gelek caran bi vê dîplomasîyê re soza gelek teşwîqan hat dayîn û di nava van teşwîqan de deynên bi faîzên kêm, şîvên musrif li Pekînê, projeyên prestîjê yên mîna çêkirina stadyûmên sporê û şewazên cihê yên alîkarîya eskerî hene. Weke mînak, ji bo mimkin bike ku SINOPEC ji sedî 50ê hiseyên qadên petrolê yên li peravên Angolayê bi dest bixe, Çînê xelatek da hukûmeta Angolayê, ango deynekî bipêşxistinê yê 2 milyar dolarî yê bi faîza kêm bê şert û merc da Angolayê; di dema hevdîtinên li ser bazareke li ber encamê ya CNPCyê bi PdVSAyê re ji bo astengîyan ji holê rake Çînê 20 milyar dolar deyn pêşnîyazî Venezuelayê kirin. (11) Di navê de Sûdan û Zîmbabwe jî Çînê di berdêla gihiştina çavkanîyên petrol û mîneralan de sîleh û alîkarîya eskerî dan welatên din. (12)

Lîderên Çînê çiqasî li ber xwe bidin da ku xwe bi pratîkên neo-kolonyal ên hêzên rojavayî nekin jî, ev rengên lihevkirinan bivênevê rê vedike, li ber her diçe bêhtir ketina nav karûbarên sîyasî û eskerî yê welatên di nav meseleyê de. Di mijara Sûdanê de weke mînak, Pekîn hat gunehbarkirin bi alîkarîdana rejîma hov a serokdewlet **Omer Ehmed el-Beşîr** bi rêya cebilxane û palpiştîya dîplomatîk li Neteweyên Yekbûyî da ku milkîyeta CNPCyê li erdê herî mezin ê petrolê ê Sûdanê biparêze. (13) *International Crisis Groupê* di hezîrana 2008ê de weha dinivîsî: "*Çîn muteşebîsê herî girîng ê Sûdanê ye. Kombînasyona daxwaza Pekînê a bergirîya veberhênanên* [CNPCyê]*, zêdekirina petrola ew hisedarê wê ye û sîyaseta wê ya ji rêûresmê ya destwernedanê, kirin ku Çîn rejîma Sûdanê ji zexta navneteweyî biparêze.*" (14) Ji demeke kurt û vir ve Çînê desteka dida **Beşîr** kêm kir – nexasim piştî damezrandina dewleta serbixwe ya Başûrê Sûdanê (lê bêhtir petrol heye) – lê belê ew bi

Li navenda globalbûnê

Bi bipêşxistina pevguherînên mal û tevgerên sermayeyê (kirrîna deynan), Çînê li navenda globalbûnê cihê xwe girt. Têkilîyên berê nedîtî bi hêzên reqîb (Bakurê Amerîkayê, Ewropa) re hatin danîn, lê belê her weha bi Efrîka û Amerîkaya Latîn re jî. Divê mirov balê bikşîne ser vê mijarê jî (Li nivîsa li hember binêre) ku bêhtirî nîvê bazirganîya wê ya bi derveyî welêt re bi Asyayê re ye, cihê ku ew parçeyên li ser erdên wê tên bihevvekirin jê dikire ku wê paşê werin firotin. (Herweha *Manière de voir* jî bixwîne - hejmar 123, "Chine, état critique/Çîn, rewşa xeter", hezîran-tîrmeh 2012, peyda dibe li ser malpera http://boutique.monde-diplomatique.fr).

awayên cihê palpiştîya wî dewam dike.

Serokdewletê Efrîkaya Başûr dide zanîn ku têkiliyên bi vî rengî "demeke dirêj" dewam nakin

Çîn herweha tê rexnekirin ji ber ku alîkarîyê dide rejîmên din ên bertîlxwur û dîktatorî yên ku ew di warê madeyên heyatî de girêdayî wan e. Îran û Zîmbabwe jî di nava van rejîman de ne. Çawa ku li Sûdanê jî wisa bû, alîkarîya Çîn dide rejîma Îranê li gorî îdîayan hem desteka eskerî ye û hem jî palpiştîya dîplomatîk li Neteweyên Yekbûyî ye; Tehran li Neteweyên Yekbûyî ji ber îdîaya bidestxistina sîlehên nukleer ket ber mueyîdeyan. (15) Li gorî îdîayan Çînê li Zîmbabweyê bi dana sîlehan û perwerdeya eskerî ya hêzên wî yên ewlekarîyê, destek dabû rejîma zextkar a Robert Mugabe – di berdêlê de jî erdên çandinîyê, titûn û mîneralên giranbiha stendin. (16)

Dema bi welatên di sîstema navneteweyî de kêmtir tecrîdbûyî re jî dide û distîne, tercîha Pekînê ya kirina karan bi hikûmetên dostane û şirketên dewlet xwedîyê wan re bivênevê bi dewlemendbûna elîtên xwecihî bi encam dibe, bi awayekî adetî bi tenê çendek xêr û bêr heta bi girseyên xizanbûyî dadiwerivin. Li Angolayê weke mînak Çînê pêwendîyên xurt bi *Sonangol* – şirkete dewlet xwedîyê wê, ya ku kesayetên nêzî serokdewlet **José Eduardo dos Santos** wê kontrol dikin – re danîn. *Sonangol* şirketa herî mezin û herî dewlemend e li Angolayê. Tê gotin ku rayedarên wê yên payebilind xwedîyê dewlemendî û îmtîyazên pir mezin in, lê belê piranîya şênîyên Angolayê bi xwe debara xwe bi rojê kêmî 2 dolaran dikin. (17)

Hemin, ne bi tenê şirktên çînî bi Sonangolê re dixebitin – şirketên mezin ên ji Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Ewropayê jî pêre dixebitin, di nava van şirketan de Chevron, ExxonMobil û BP jî hene. Lê belê bi dewamkirina bazar û bazirganîyê bi rejîma Angolayê (û rejîmên din ên weke wê) re, Çîn – weke hêzên rojavayî – dibe hevkar di nava pergalekê de ku îmtîyazên çendekan li ser pişta gelekan dide dewamkirin.

Rayedarên Çînê hêvî dikin ku pêşîyê li vê meylê bigirin bi dana alîkarîya bipêşketinê ya dide cotkarên piçûk û yên din ên li tebeqeyên jêr û navîn ên civakê. Ya rastî, ev armanca darîçav a 20 milyar dolar deyn-fona serokdewlet **Hu** li Foruma Hevkarîya Çîn-Afrîkayê di hezîranê de ragihandî bû. Bi herhalî, pêdivîya Çînê bi madeyên xav ewqasî zêde ye – û ewqasî bi lez zêde dibe – ku ew xwe neçar dibîne ku wan şirketên bîyanî li pêş bigire ku elaqedarî dabînkirina çavkanîyên heyatî ne. Li deverên ku ew bi xwe pir bi derxistina petrol û mîneralan bûye, yên weke Afrîkaya jêra Sehrayê, Çînê gelek pere razandin li avakirina rêyên hesinî, bender, xetên lûleyan û binesazîyên din; ev teşebus dikarin cesaretê bidin hin hewldanên din jî, lê belê bi awayekî gîştî ew li gorî pêdivîyên şirketên petrol û kanan ên pêwendîdarî Çînê hatine çêkirin û ne ji bo tevahîya aborîyê.

Çavdêrîya raporeke ji bo Komîteya Bipêşketinê ya Parlemana Ewropayê amadekirî weha ye: *"dema mirov pêşî berê awira xwe didîyê, tîhna Çînê ji bo çavkanîyên xwezayî weke xêr û nihmetekê dîyar e ji bo Afrîkayê"*. Rapor dibêje, bi razandina gelek pereyan li petrol û mîneralên Afrîkayê, Çînê alîkarî kir bi mezinbûna safî ya aborî ya parzemînê re. Bi herhalî, dema mirov ji nêz ve lê dinêre, dîmenekî tevlîhevtir derdikeve pêşberî me. Sala 2005ê bi tenê 14 welatên afrîkî – hemû jî hilberînerê petrol û mîneralan – di bazirganîya bi Çînê re xwedî tewazuneke ji bo wan erênî bûn ku sedema vê bi giranî ji ber firotina madeyên xav bû; li hemberî vê 30 welat xwedîyê tewazuneke neerênî bûn, lewra malên tekstîlê û metayên din ên erzan ên çînî bazarên wan dan ber xwe, gelek caran jî hilberînerên xwecihî jî ji cihên wan kirin der. Ji vê û wêde, ev cihêtîya di navbera "serketîyên safî" û "binketîyên safî" di bazirganîya Çîn-Afrîkayê de her fireh bû, pêre jî li hin welatên afrîkî bû sedema nerazîbûneke mezin. Encama rapor gihiştîyê dibêje, retorîka bipêşketinê ya Çînê "*ji bo piranîya welatên afrîkî dibe sedema peydabûna hêvîyên mezin, lê belê şert û mercan naafirîne ji bo mezinbûneke aborî ya daîmî.*" (18)

Nexwe, di vê qonaxê de, Çîn li ber durîyaneke pir girîng e. Heke ew dewam bike û bidestxistina çavkanîyan li pêşîya her tiştê din bigire, hingê ew ê bibîne ku ew bi xwe her diçe bêhtir weke hêzên împeryal ên kevin tevdigere, dibe hevalbendê hikûmetên rantxwur ên welatên di warê çavkanîyan de dewlemend, û ji bo bipêşxistina gîştî hindikî hewl dide. Çawa ku serokdewletê Afrîkaya

www.kurdishdiplo.org

Bi hejmaran PKÇ
(Partiya Komunîst a Çînê)

- Di sala 2011ê de 80.6 milyon endamên wê hene, ev hejmar di salekê de bi % 2.9 zêde bû

- % 25ê endamên wê di bin 35 salî de ne, temenê % 50ê endaman di navbera 36 û 60 salî de ne, ji % 25 ên ku di ser 60î re ne; % 23yê wan jin in

- Li gorî texmînan % 45ê wan karker, cotkar û masîgir in, % 12ê wan kadro û teknîsyenên pir kalîfiye ne, % 22yê wan karkerên demdirêj in, % 21ê wan esker in (li gorî agahîyên Xinhua).

- 204 endamên wezîfedar ên komîteya navendî hene (12 ji wan jin in) û 167 alîkarên wan hene. Qederê % 10ê li derveyî welêt perwerde bûne û şuxilîne; % 5ê wan birêveberên şîrketan in.

Kurê filan kes…

Hin dêûbavên birêveberan di warê bazirganîyê de xwedî wezîfeyên girîng in. Weke nimûne:

- Hu Haifeng, kurê serok Hu Jintao, patronê Nuctechê bû ku pisporê derîyên hewşê û skanerên ewlehîyê (yên balafirgehan, metroyan...) ye, ew piştre bû sekreterê bi hêz yê Partîyê Tsinghua Holdings, navenda Nuctech û ya şîrketên din jî. Keça serok Hu Haiqin, bi kevnepatronê malpera Internetê ya bi navê Sîna.com, Mao Daolin re zewicîye.

- Wen Yunsong, zavayê serokê Meclîsa Netewî ya Gel Wu Bangguo (erkdarê duyem ê reîsmê) ye, foneke pererazandinê bi rê ve dibe, hevkarê Bankaya Pîsesazî û Bazirganîyê ya Hongkongê ye.

(Çavkanî: Xinhua; The New York Time, 17ê gulana 2012ê; lêkolîna Patrick Boehler ku di malpera *Le Monde Diplomatîque*ê de qeydkirî ye.)

Wergera ji fransî: Feryal Guladawiya

Hesasîyetên aborî

- Mezinbûna aborî: % 7.8 di semestra yekem a sala 2012ê de. Desthilatdarî hêvî dike ku tevahîya salê wê ev hejmar % 7.5 be, ev jî tê wê maneyê ku mezinbûna aborî ya semestra duyem wê ji nû ve kêmtir bibe. Di sala 2011ê de ev hejmar % 9.5 bû û di sala 2010ê de % 10.3 bû.

- Bêkarî : di sala 2011ê de % 4.3 bû. Lê zêde maneya vê hejmarê tuneye: bi tenê karkerên bajaran tên hesibandin (lê % 49ê çînîyan gundî ne); koçberên ji kar derxistî nayên hesibandin.

- Pererazandin: + % 21 di navbera hezîrana 2011 û hezîrana 2012yê de. Pererazandina milk, ku hîn jî gelekî bilind e (+ % 19.6 di salekê de), li gorî hejmara ku di nîvê sala 2011ê de gihîştibûyê, du qat kêm bû. Xerckirin bi xwe, bi awayekî kêmtir bi lez mezin dibe (%13 ji bo firotinên perakende) û meyldarê kêmbûnê ye.

- Bazirganîya bi derve re : meha hezîranê mayeya bazirganîyê ji 31.7 milyar dolaran bihurî yanî du caran ji ya di sê mehên bihurî de zêdetir bû. Di sibatê de, budceya Çînê li hev derneketibû. (Hezîranê mezinbûna itxalatan bi awayekî diyar hêdî bû (tevî ku di gulanê de % 12.7 zêde bûbûn, di hezîranê de % 6.3 zêde bûn). Li gorî Xinhua, îxracatên ber bi welatên ewropî ve sekinî ne, lê «danûstandin bi saya bazarên nû bi lez mezin bûn».

- Pererazandinên Yekser li Derveyî Welêt (PYDW): li gorî rêûresmê, ew sermayeyên bîyanî ne (amerîkî, ewropî…) ku tên Çînê ji bo ku pereyên xwe lê razênin; ev kapîtal di sala 2011ê de gihişt 220.1 milyar dolaran. Lê ji deh salan û vir ve, sîrketên çînî li derveyî welatê xwe peran radizînin: sala 2011ê qederê 50 milyar dolaran. Di warê PYDWyê de Çîn welatê di rêza pêncemîn a cihanê de cîhê xwe digire (li dû Amerîka, Almanya, Franse û Hongkongê).

- Kirîna şîrketan : sala 2010ê (hejmara dawî ya tê zanîn), şîrketên çînî muzakereya tevlîbûna xwe ya di 188 sîrketên biyanî de kirin (heta bi % 100ê), piranîya wan di warê fînansê de dixebitin (şîrketên kredîyê, banke…) sîgorte û bar û rêwî guhestin. Di sala 2003yê de % 75ê pererazandinên çînî yên li derveyî welêt yên şîrketên kanan bûn, ev rêje sala 2010ê % 7 bû.

- Hewcedarîya bi petrolê: xerçkirina petrolê ji rojê 4.8 milyon barîlên sala 2000î di sala 2010ê de gihişte 9.1 milyon barîlan . Îtxalat ku di sala 2000î de rojê 1.3 milyon barîl bû, sala 2010ê gihîst rojê 5 milyon barîlan.

- Hewcedarîya bi gaza xwezayî: xerckirina gaza xwezayî sala 2000î 24.5 milyar m3 bû, sala 2010ê ev hejmar gihişt 109 milyar m3. Sala 2000î Çînê gaza xwezayî difrote welatên din (3.3 milyar m3); sala 2010ê ew 12.2 milyar m3 ji derve dikire.

(Çavkanî: Chinal Statistical Yearbook 2011; Mofa Pékin; Xinhua; Caixin, 2011; Société générale, Econote, mai 2012; Bulletin économique de l'ambassade de France à Pékin (Rapora aborî ya sefareta Franseyê li Pekînê), tîrmeh 2012; BP,"Statistical Review of World Energy 2012 (Kovara statîstîkî ya Enerjîya Cîhanê 2012".)

Wergera ji fransî: Feryal Guladawiya

Bûyereke asayî yan pevçûneke siyasî ?

Li gorî hin şîrovegeran, ji wezîfeyê girtina birêveberê bajar-wîlayeta Chongqingê Bo Xilai bûyereke asayî ye. Hevalekî çînî wiha dibêje *«mirov dikare bibêje ev bûyer hinekî dişibe tiştê li Franseyê hatî serê* ***Strauss-Kahn****. Ji gelek salan û vir ve* ***Bo*** *amadekarîya bûna birêvberekî neteweyî kiribû lê ji ber kirineke li gorî adetan nebû, ket.»* Tevî ku kurê xwe jiyaneke luks li Londonê didomîne, Jina wî bi kuştina bazirganekî îngilîz tê gunehbar kirin.

Ji sedemên vê jiholêrakirinê wêdetir pevçûneke îdeolojîk di navbera tiştê ku jê re "modela Chongqing" tê gotin û "modela Guangdong" de heye. Ya yekem modeleke birêvebirina dewletê ye ku hem civakî û hem jî otorîter e ku **Bo** heta niha sembola wê bû. Ya duyem jî modeleke birêvebirina welêt e ku di warê aborî de liberal e û di warê sîyasî de mêjî vekirî ye û birêveberê Cantonê **Wang Yang** temsîla wê dike. Herdû model hewl didin bersiva pirseke ku tevahîya Partîya Komûnîst a Çînê (PKÇ) elaqedar dike, bidin: mirov çawa dikare li ber nerazîbûna gel a her diçe zêdetir dibe, bisekine? Li gorî qaîdeyên fermî di sala 2011ê de, sed û heştê hezar "bûyerên girseyî" qewimîn, ev hejmar jî du car û nîv ji hejmara bûyerên di sala 2008ê de qewimîn zêdetir e… Budceya ji ewlekariyê re hatî veqetandin gihîşt hejmara budceya lêçûnên eskerî, weke ku "dijminê nava welêt" biqasî dijminê derveyî welêt bi tehlûke be hatibe hesibandin. Lê sînorên tepisandina gel hene. Edî blogên li ser înternet û hin rojname dengê gel didin der : *"em dikarin mafê axaftinê bidin gel, em dikarin hevpeyvînan li ser sedemên nerazîbûnan çêkin, yanî bi şertê ku dev neavêjine birêveberan. Li gorî demên berê mekan û cîhê me firehtir e",* redaktorê berê yê *Nanfang Zhoumo,* rojnameya Cantonê ku bi lêkolînên xwe yên deqerû (rastbêj) bi nav û deng e wisa dibêje. "*Ev nayê maneya ku daxwaza kontrolkirinê edî tune ye."* Jixwe birêveberê rojnamê bi fermana komisyona propagandayê ya Pekînê ji kar hat derxistin. ***Weibo*** jî, ku "Twittera çînî" ye, di bin çavdêriyeke şidandî û giran de ye.

Çalakîyên civakî ji birêvebirên neteweyî bêhtir yên herêmî rexne dikin û hema hema tu caran rexneyan li rejîmê bi xwe nagirin. Lê li herêmên ku hejmara karkeran gelek e û ku xerîb *(minging*) lê dijîn, bawerîya bi komûnîstan lawaz dibe û hin birêveber xwe weke ku wê sebra gel biqede û wê weke bombeyekê biteqe hîs dikin. Ji xwe yekane sendîkaya welêt (Federasyona Sendîkayên Tevahiya Çînê-FSTÇ), ku girêdayî partîyê ye, ewqasî kêm bawerîya gel bi xwe tîne ku jê nayê bi rola hekîmê êşên gel derman bike jî rabe.

Ji ber ku di xwezayê de tu cîh tucar vala namîne, rêxistinên serbixwe yên mûçegiran û tevnên parêzeran derketin holê, weke li Guangdongê ku navenda endustrî û îxracatên Çînê ye. Hebûna wan ji alîyê hin karkeran ve ku têdikoşin, tê xwestin, ew ji alîyê birêveberîyan ve ji bo pêkanîna muzakereyan di demên grevê de tên bikaranîn û mirov dikare bibêje ku kêm zêde ji alîyê Partîyê ve tên qebûl kirin. Buroya *Laoewei Law Firm* (LLF) yek ji wan rêxistinan e ku ji alîyê parêzerekî li ***Shenzhen***ê ve tê birêvebirin, Shenzhen saet û nîvekê dûrî ***Canton***ê ye. Bi alîkarîya yanzdeh hevkarên xwe Duan Yui ***mingong***ên nifşa nû perwerde dike, mafên wan fêrî wan dike, heke bivê wan yeko yeko diparêze û di dema grevê de muzakereyan dike – grev di destûra bingehîn de hîn weke mafekî nayê qebûl kirin. Di taxa kevîya bajêr a Cantonê de, rexistineke karkeran a bi navê Buroya Xizmetên ji bo Karkeran heye û ew bi vê rolê radibe. Li gorî texmînan li derveyî bajaran bi dehan sazîyên bi vî rengî hene.

Herdû sazîyên ku me hevdîtin bi wan re kir, bêhtir behsa guhertina mentiqê karkeran dikin. Li gorî Duan "*diho ew li hemberî patronan bi tenê bûn. Îro gelek karker bikêrîya çalakîya kolektîf û ya muzakerekirina bi temsîla xwe kifş dikin. Ev bûyereke dîrokî ye*." Gelo ev tê maneya ku bîrewerîya ku ew çînekê pêk tînin bi *mingong*an re pêk hatiye ? Gelo sendîkayên serbixwe ku navê xwe diyar nakin, ava dibin?

Tevî ku tiştekî nedîtî ye jî, ji du sed û pencî û sê milyon *mingong*an bi tenê çend sed hezarên wan ev tecrube kirin. Ev hejmar kêm be jî sîstema sendîkaya yekane ku ji alîyê partîyeke bi hêz ve tê birêvebirin dihejîne. Di destûra bingehîn de tê nivîsîn ku " *mulkiyeta gelemperî ya sosyalîst dawîyê li sîstema mêhtina mirov ji alîyê mirovî ve tîne.*" Lê weke ku îfadeya Duan ya bi zimanekî bêîmtiyaz gotî "*dijberîya sermaye û kar her diçe dijwartir dibe*". Têkoşîneke çînan heye. Lê gelo "partîyeke çîna (karkeran) heye"? Li gorî Duran "*Partîya Komunîst divê biguhere, heke na, wê karker wê neçar bikin, yan jî… ew ê wê red bikin ».* Di adara bihurî de li Shenzhenê di şîrketa Japonî ***Ohms Electronic*** de karkerekî 35 salî namzetê sendîkaya fermî têk bir û piştî greveke giştî ya karkeran, bi tevahîya dengên heft sed hevpîşeyên xwe hat hilbijartin.

Herçiqasî bersiva wan li hemberî vê yekê guhertî be jî, hin birêveber li maneya bûyerên qewimî mikur hatin. **He Gaocho** ku pisporê têkilîyên karî ye û ku fikrên wî nêzîkî yên sekreterê komunîst ê Guangdongê ne, alternatîfên heyî yên di pratîkê de dîtî ji me re rave dike. Ew nimûneya greva şofêrên taksîyan ên li Chongqingê sala 2008ê dide ku bi mudaxeleya sekreterê partîyê (Bo yê navdar) li ser rêveberîya şîrketê re zû çareser bû. Ew lê mikur tê ku: "*ji bo karkeran tiştekî baş e: lê li tevahîya devêrên din ên welêt wexta birêveberê partîyê telefonê dide birêveberîya şîrketê, ew kêm caran heqê karkeran diparêze. Ev tê wê maneyê ku partî ye ya ku biryara hertiştî dide*" Li gorî wî partîya Guangdongê "*tercîh dike karkeran ber bi muzakerekirinê ve bikişîne. Grev aktorên cîvakî eleqedar dike: sendîka, karker û birêveberî. Ew ne bûyereke siyasî ye ku divê birêveberên sîyasî pêre mijûl bibin.*"

Tê gotin ku di mehên bê de, li hema hema sêsed şîrketan hilbijartinên azad wê pêk werin da ku karker nûnerên xwe hilbijêrin, da ku ev nûner ji jor ve neyên wezîfedarkirin. Gelo tecrubeya Wang ya ku jê tê hêvîkirin di kongreya bê de cihekî baş bi dest bixe, wê li welêt belav bibe? Gelo partî wê windakirina yek ji şîrketên xwe (ku di civakê de bi rola partîyê radibe) qebûl bike da ku yên din di destê wê de bimînin? Tu kes nikare bersiva vê pirsê bide.

M.B.

Wergera ji fransî: Feryal Guladawiya

Başûr **Jacob Zuma** jî di axaftina xwe ya li Foruma Hevkarîya Çîn-Efrîka a sala 2012ê derbirrî "*tevlîbûna Afrîkayê li bipêşketina Çînê*" para bêhtir ji "*dabînkirina madeyên xav*" pêk tê – wî got, ev nîzam "*di dema dirêj de nikare were dewamkirin.*" (19) Dema ku em li ber çavan bigirin ka Pekînê çiqasî hewl da têkilîyên xurt bi Zuma û Afrîkîya Başûr re deyne, ya rastî ev peyameke xurt û bibandor e.

Lê belê her guherîna girîng di bazirganîya Çînê bi Afrîkayê (û cîhana li ser rêya bipêşketinê bi giştî) re wê bike ku guhertineke li gora vê di strukturên aborîya Çînê de jî biqewime – ji girêdana bipîşesazîyên pir çavkanî ji wan re divên ber bi pîşesazîyên sivik û xizmetan ve, pêre jî guhertina di qada enerjîyê de ji girêdana bi sotemenîyên fosîl ve ber bi awayên enerjîyê yên dikarin werin nûkirin ve. Hemin, lîderên Çînê diyar e haya wan ji vê rewşa bivênevê heye, lewma Plana Pênc Salan a herî dawî ya sala 2011ê hat ragihandin, bipêşxistina pergalên veguhestin û barbirîyê yên alternatîf, enerjîya dikare were nûkirin, madeyên nû, teknolojîya bîyo û hewldanên din ên ku wê guherîneke strukturel ên bi vî awayî mimkin bikin, li pêş digire. Bi herhalî, heke planeke dikare pêkwere nebe ji bo hêdîkirina belavbûna otomobîlên bi petrolê dixebitin û teşebusên din ên pir pêdivîya wan bi çavkaniyan heye, hingê wê lîderên Çînê ji her demê bêhtir girêdayî mîqdarên zêdetir ên madeyên xav bin û di encama vê yekê de jî heta bi qirikê bikevin nava çerxa sîyasetên cîhana li ser rêya bipêşketinê, ku bi piranî tevlîhev û bi xirecir in.

* Michael Klare profesorê lêkolînên aştî û ewlekarîya cîhanê ye li Hampshire College û berîya demeke kurt berhema li jêr nivîsî: *The Race for What's Left: The Global Scramble for the World's Last Resources / Pêşbazîya ji bo tiştê mayî: Têkoşîna global a ji bo çavkanîyên dawîyê yên dinyayê* (New York: Metropolitan Books, 2012).

(1) Hu Jintao, "Open Up New Prospects for a New Type of China-Africa Strategic Partnership / Hêvîyên nû biafirînin ji bo şewazekî nû yê hevkarîya stratejîk a Çînî-Efrîkî," axaftina li Foruma Hevkarîya Çîn-Efrîkayê, Pekîn, 19ê tîrmeha 2012ê, ji www.fmprc.gov.cn/eng roja 19ê tîrmeha 2012ê hatiye girtin.

(2) Ji bo nîqaşên li ser "resource curse/boşîya çavkanîyê," binêre li Terry Lyn Karl, *The Paradox of Plenty: Oil Booms and Petro-States / Nakokîya Boşahîyê: Mezinbûna sektora petrolê û dewletên petrolê* (Berkeley: University of California Press, 1997); û Michael L. Ross, *The Oil Curse: How Petroleum Wealth Shapes the Development of Nations / Boşîya Petrolê: Dewlemendîya ji Petrolê çawa şikil dide bipêşketina neteweyan* (Princeton: Princeton University Press, 2012).

(3) Ji bo piştperdeya van bûyeran binêre li Michael T. Klare *Blood and Oil* / *Xwîn û petrol* (New York: Metropolitan Books, 2004), rûpel 30-37; Daniel Yergin, *The Prize* / *Xelat* (New York: Simon and Schuster, 1993), rûpel 204-5, 298-301, 403-5.

(4) BP, *Statistical Review of World Energy* / *Lêkolîna Statîstîkî ya enerjîya Cîhanê*, Hezîrana 2012ê (London: BP, 2012), rûpel 6.

(5) Energy Forum of the James A. Baker III Institute for Public Policy / Foruma enerjîyê ya James A. Baker III Înstîtûta siyaseta Dewletê, Rice University, *The Rise of China and Its Energy Implications: Executive Summary / Bilindbûna Çînê û xwepêkirinên wê yên Enerjîyê: Kurteya Birêveber* (Houston: Baker Institute, 2011), rûpel 13-15.

(6) Binêre li U.S. Energy Information Administration (EIA), "China," Country Analysis Brief / "Çîn" Analîza Welêt bi kurtî, çiriya paşîn a sala 2010ê, ji ber www.eia.gov roja 20ê tîrmeha 2012ê hat girtin.

(7) "China to Boost Coal Imports on Wider Price Gap / Çîn wê Îtxalkirinên Komirê bi Buhayên Pir Newekhev Zêde Bike," Bloomberg, 23yê nîsana 2012ê, ji ber www.bloomberg.com 19ê hezîrana 2012ê hat girtin.

(8) Le Yucheng, "China's Relations with the World at a New Starting Point / Têkilîyên Çînê bi Cîhanê re li Niqteyeke din a Destpêkê ," axaftina li CIIS Forum, 10ê nîsana 2012ê, ji ber www.fmprc.gov.cn/eng roja 18ê tîrmeha 2012ê hat girtin.

(9) Ji bo nîqaşa vê xalê binêre li International Crisis Group (ICG), *China's Thirst for Oil / Çîn tîyê petrolê ye*, Asia Report, hejmar. 153, 9 hezîranê, 2008, rûpel 12-17.

(10) Ji bo piştperdeya stratejîyên veberhênanê yên Çînê binêre li Jonathan Holslag, et al., *Chinese Resources and Energy Policy in Sub-Saharan Africa / Çavkanî û Sîyaseta Enerjîyê ya Çînê li Efrîkaya li jêra Sehrayê*, Rapora ji bo Komîteya Bipêşketinê ya Parlemana Ewropayê, 19ê adara 2007ê, rûpel 10-12.

(11) Jeffrey Ball, "Angola Possesses a Prize as Exxon, Rivals Stalk Oil / Angola Xwedîyê Xelateke weke Exxonê ye, Reqîb bi Gavên Mezin ber bi Petrolê ve Diçin," *Wall Street* 5ê kanûna 2005ê; Simon Romero, "Chávez Says China to Lend Venezuela $20 Billion / Chávez dibêje, Çîn wê 20 milyar $ deyn bide Venezuelayê," *New York Times*, 18ê nîsana 2010ê.

(12) Binêre li Holslag, et al., *Chinese Resources and Energy Policy in Sub-Saharan Africa / Çavkanî û Sîyaseta Enerjîyê ya Çînê li Efrîkaya li jêra Sehrayê*, rûpel 45.

(13) Heman jêder, rûpel 45-47.

(14) ICG, *China's Thirst for Oil / Çîn tîyê petrolê ye*, rûpel 24.

(15) Heman jêder, rûpel31-34.

(16) Binêre li Holslag, et al., *Chinese Resources and Energy Policy in Sub-Saharan Africa / Çavkanî û Sîyaseta Enerjîyê ya Çînê li Efrîkaya li jêra Sehrayê*, rûpel 45.

(17) Ji bo agahîyên piştperdeyê binêre li Ken Silverstein, "Gusher to a Few, Trickle to the Rest /Ji Çendekan re Zêde Merd, ji yên Mayî re Belavkirina bi Hesabê Dilopan ," *Los Angeles Times*, 13ê gulana 2004ê.

(18) Holslag, et al., *Chinese Resources and Energy Policy in Sub-Saharan Africa / Çavkanî û Sîyaseta Enerjîyê ya Çînê li Efrîkaya li jêra Sehrayê*, rûpel 32-35.

(19) Çawa ku di berhema Leslie Hook de ji ber hatîye girtin, "Zuma Warns on Africa's Trade Ties to China / Zuma der barê girêdanên bazirganîyê yên Efrîkayê bi Çînê re hişyar kir," *Financial Times*, 19ê tîrmeha 2012ê.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê


www.

Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê pirî caran gazinan dikin ji hevrikîya pîşesazîyê ya dewletên başûrê Asyayê. Ew ji bîr dikin ku sala 1997ê dema ku krîza malî ev herêm dabû ber xwe û dihejand, wan li ser vê herêmê dermankirineke şokê ferz kiribû, vê jî kiribû ku welatên mexdûr sozê bidin xwe ku hew tu carî bikevin rewşeke lawazîyê. Wan biryar da ku dovîzan berhev bikin ... vê jî bi rîya îxrackirina ber bi Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê dikin.

Lihevderneketineke bazirganî ya ji ber petaxa krîza asyayî ya sala 1997ê mayî

Sedemeke pûte pê nayê dayîn a krîza amerîkî

Dean Baker *



Têra xwe naye fêmkirin ku lihevderneketina bazirganîyê weke bêtewazûnîyeke girîng di aborîya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê de ye. Sedemên lihevderneketinê di avahîya plana xilasîyê de, ya ku Sazîya Malî ya DYAyê ji bo krîza aborî ya Rojhilatê Asyayê plan kir û bi rêya Fona Pereyan ya Navneteweyî ferz kir jî hê kêmtir tê fêmkirin. Ev plana xilasîyê bi awayekî neyekser bû sedema mezinbûna bi lez ya spekulasyona kirîna xanîyan. Jihevdeketina wê jî derbeke giran li aborîya welêt da.

Berîya plana xilasîyê ya 1997ê, lihevderneketinên piçûk ên bazirganîyê bi serê Amerîkayê de hatibûn, ev lihevderneketin ji sedî yekê Hilberîna Hundir a Nesafî (HNN) hinekî zêdetir bûn. Di dîroka aborîyê de tiştên jibîrkirî û bi kêrî herkesî tên hene: yek ji armancên sereke yên siyaseta kêmkirina lihevderneketinê ya dema **Clinton** kêmkirina nirxê dolarê amerîkî bû. Feydeya vê siyasetê jî ev bû: dolarê amerîkî wê bi nirxê kêmtir bike ku berhemên amerîkî karibin di bazara navneteweyî de bêhtir reqabetê bikin. Vê yekê wê hejmara îxracatên safî zêde bikira û ruh bi aborîya welêt de bianîya.

Ev çîrok, bersiva yekem a li hember kêmkirina lihevnekirina bazirganî ya di dema destpêka birêveberîya Clinton de hatî dayîn, bi temamî terîf dike. Wê demê nirxê dolarê amerîkî di salên 1993 û 1994ê de kêm bû û pêre lihevderneketina bazirganîyê jî li gorî mezinahîya aborîya welêt kêm bû, tevî ku aborîya welêt salê ji % 3 bêhtir mezin dibû.

Wexta di sala 1995ê de **Robert Rubin** wezîfeya Sekreterîya Kasayê girt ser milên xwe, doza sîyaseta nirxbilindkirina dolarê amerîkî kir. Tevî ku ev retorîka dolarekî nirxbuha ji bo bilindkirina nirxê pereyî hinekî bi tesîr bû jî, ya ku bi rastî ev sîyaset şuxiland plana xilasîya ji krîza aborî ya rojhilatê Asyayê ya sala 1997ê bû.

Heta bi vir, welatên vê herêmê, "pilingên asyayî" (1) modelên serketî û pêşketî bûn. Ji welatên weke Taywan û Koreya Başûr hat ku bi dehsalan mezinbûneke bi lêz ya nedîtî tevî başbûna standarta jiyanê bidomînin û xwe nêzî qadên ewropayê bikin.

Ji bo îxrackirinê kêmkirina nirxê pereyî

Lê dîsa jî krîzê derbek li wan xist, ev welat bi bertîlxwarin û bi xwedîkirina kapîtalîzmeke qralî hatin gunehbar kirin. IMFyê doza "reformên" bingehîn kir da ku ev welat sîstema xwe ya aborîyê li gorî ya DYAyê ji nû ve çebikin. Li ser wan hat ferzkirin ku berhemên xwe bi buhayekî gelekî erzan bixin bazarê.

Ji wan hat xwestin ku tevahîya deynên xwe bidin, di berdêla vê de jî ew ê bibûna xwedîyê bazareke vekirî ya li DYAyê ku wê bikarîyana berhemên xwe lê bifroşin. Pereyên herêmê li hember dolarê amerîkî serberjêr ketin û ixracatên wan zêde bûn.

Lê zirarên krîzê ji sînorên rojhilatê Asyayê bihurîn. Zehmetîya şert û mercên plana xilaskirinê peyamek da welatên li ser rêya pêşketinê. Eger karibin têkîlîyê bi IMFyê re daneynin wê baştir be. Baştirîn rêya xwe parastina li hember tehlûkeya ku weke welatên rojhilatê Asyayê were serê wan, berhevkirina mîqdarên bilind ên rezervan bû, jixwe ya ku welatên li ser rêya bipêşketinê kirî jî ev bi xwe bû.

Di salên piştî krîza aborî de, li tevahîya herêmên welatên li ser rêya pêşketinê, rezervên pereyan bi lêz hatin danîn û mezinkirin.

Bêguman, ji bo welatekî rêya çêkirina rezervan, li hemberî dolarê amerîkî bi qest kêmkirina nirxê pereyê xwe ye; ev yek destûrê dide wî ku di warê bazirganîyê de gelekî li xwe zêde bike. Ev e ya ku bi awayekî pir belav piştî sala 1997ê dest pê kir. Nirxê dolar gelekî zêde bû û lihevderneketina bazirganî ya Dewletên Yekbûyî pir zêde mezin bû. Di sê mehên dawî yên sala 2000î de, berîya ku krîza sala 2001ê wê hinekî kêm bike, lihevderneketina bazirganî ji % 4.0ê HNNyê bihurî. Wexta aborîya DYAyê baştir bû, mezinbûna mîqdara lihevderneketina bazirganî hinekî rawestîya. Di sêyem sêmeha sala 2006ê de, mezinbûna wê ya herî bilind % 6.0 ya HNNyê bû, yan jî 805.7 milyar dolar, tam di dema ku sektora milkiyetê gihişt asta xwe ya herî bilind de.

Hesta dewlemendîyê

Sektora milk gelekî eleqedar e bi lihevderneketina bazirganîyê re, lewra lihevderneketinek dike ku daxwaz gelekî kêm bibe. Ev ew pere ye ku mirov li mal û eşyayên bîyanî didin û ne bi malên li hundirê welêt didin. Berîya hilweşînê, deynkirinên ku di sektora milk de zêde bûn, kêmbûna daxwazê telafî kir. Beşek ji vê kêmbûnê jî bi mezinbûna sektora avahîsazîyê re hat telafîkirin. Mirov dikarî li benda vê mezinbûnê bimîne, lewra ew bersiva bilindbûna zêde ya buhayê xanîyan bû. Beşa mayî ya kêmbûna daxwazê jî bi zêdebûneke serfkirinê ya ku bi trilyonan dolarên *housing equity* [nirxê xanîyekî dema ku pereyên krêdîyê jê tên kuştin; nota wergêr] ya ku bi spekulasyonê hatin çêkirin.

Gelek zehmet e mirov lê bifikire ku sektora milk wê mezin bibe heke Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê xwedî lihevderneketineke bi hejmarên nêzîkî tewazûna bazirganîyê bûbe. Eger li dinyayekê bazirganî nêzîkî tewazûnê be, buhayê xanîyan jî wê bi heman rengî bilind bibûna, weke encama vê rewşê jî daxwaz ê mezin bibûya, wê gavê wê mumkin bûya ku vê mezinbûnê pêşî li hin zextên enflasyonê bigirta û lewra rêjeyên faîzan wê bilind bibûna. (Yan jî bilindbûna daxwazê wê qet nebe tirsa enflasyonê, li Sîstema Federal a Rezervên Pereyan/FED têra xwe belav bikira, heta hîsa pêdiviya bi bilindkirina rêjeya faîzan ji bo kêmkirina daxwazê pêre çêke).

Dîsa di çarçoveya lihevderneketinên bazirganî yên pir zêde de wisa xuya ye ku FED sektora milk weke hêmaneke ku dikare stimulasyoneke bikêrî herkesî tê çêbike, dibîne. Di rastîyê de **Alan Greenspan** bi xwe hevnivîskarê rêzek nivîs bû ku li gorî wan zêdekirina buhayê serfkirina jinûve fînanskirina xênî kirîye ku buhayên xanîyan jî zêde bibin.

Bi kurtî, lihevderneketina bazirganîyê hawîrdorek afirand ku têde ew şêwazê spekulasyona kirrîna xanîyan a ku me dehsala bihurî dît, mumkin be. Em bi pêş ve biçin, zehmet e, bêyî ku dolar pir ji nirxê xwe wenda bike û lihevderneketin jî danekevin asteke mirov dikare ji heqî bê der, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê vegerin ser rêyeke mezinbûna aborî ya maqûl û çê. Ev meseleyeke besît a muhasebeyê ye û ne mijareke ku mirovên maqûl li ser li hev nekin û xwedîyê fikrên cihê bin.

* Aborîzan, hevbirêveberê Center for Economic and Policy Research (Navenda Lêkolînên Aborî û Sîyasî),Washington, DC.

(1) Koreya Başûr, Hongkong, Sîngapûr û Taywan.

Wergera ji ingilîzî: Feryal Guladawiya





Kîto Sîno: **Hezkirina herûm**, li ser kartonê, boyaxa akrîlîk



Kîto Sîno: Rêzewêneyên li ser bilêta trênê

Modela herî dawî ya demokrasîya afrîkî ango Malî noqî nav bêîstîqrarîya sîyasî dibe, serhildêrîya bakur jî welêt dike du parçe. Ji darbeya eskerî ya 22yê adara derbasbûyî ve serokdewletê demî Dîonkûnda Traorê hewl dide partîzan û mixalifên darbekaran li hev bîne. Sedema vê krîzê cihêtîyên kevin in ku ji dawîya dîktatorîyê ya sala 1991ê û vir ve bandorê li civaka Malîyê dikin.

Tehlûkeyên parçebûnê, gotegotên li ser destwerdanê

Li Malîyê jihevdeketina xewna demokratîk

Jacques Delcroze *

Gelo Malî bi tehlûkeya giştîkirineke şerîetê re rûbirû ye? Ji 27ê hezîranê û vir ve, bakurê welêt di destê komên îslamî yên tundrew de ye, yên ku herêmên ***Kîdal, Gao*** û ***Tombûktû*** kontrol dikin û ev erd teqabulî ji sê paran diduyê erdên welat dikin. Di serwerîya wan de xespên ku sûc in bi navê **Ellah** tevî alîkarîya xelkê mehrûm û mexdûr –qet nebe yên ku erdên xwe bi cih nehiştî – hene. Selefîstên li sê herêmên bakur bicihbûyî pere û hawarê belav dikin û qet zehmetîyê nakişînin ku ji nav ciwanên bêkar û hêvîyên wan ji siberojê nînin, xelkê bixin nav refên xwe. Li Gaoyê, ew mazot, benzîn û dexl bi buhayê lêçûnê dabîn dikin, navendên tenduristîyê bi gurçûpêç dikin, mûçeyên xebatkarên wan didin... Hilbijartîyekî bakur dibêje, wî hewl daye bigihêje serokê tevgera îslamîst-tundrew a bi navê ***Ansar Dîn***, **Îyad El-Xalî** da ku bi wî re rûne. Bersiva dayî wî: "*Ez ê te bibînim dema ku te ji meqamê xwe îstîfa kir. Tu rewatîya parlemanteran li beramberî qanûna Xwedê nîne.*"

Di vê navê de li welatekî ku du car û nîvan ji Fransayê mezintir, Bakur her dûr dimîne. Dûrî welatê "bikêr" ê ku lê % 90ê nufûsê heye. Li ***Bamako*** di guhertinên li ezmanê germîyanê de, di nîvê meha remezanê de, bêhnfirehîya ji rê û resmê dewam dike: restoran vekirîne, alkol peyda dibe û çendek çixarekêş li ser rêyan hene. Piranîyeke şênîyan bigre nava xwe jî meha rojîyê (heta bi nîvê meha tebaxê dewam kir) "bi awayê malîyî" pêk tê, bi bawerîyeke dînî û ne bi ferzên giştî Sedema sereke ya fikaran: kar e. Ji ber krîzê, aborî ji hev de ketîye. Gelek şirketan nexasim jî yên xizmetan yan derîyê xwe girtin yan jî xebatkarên xwe xistin bêkarîya teknîk. Piştî ku otêlvanîyê û restoranvanîya bi carekê derb xwarin, niha tevahîya sektoran bi awayekî hêdî dixebitin. Şirketên mezin ên îstîxdam dikin, ên weke Air Maliyê xebatkarên xwe ji kar derdixin. Bi tenê sektora kanan wisa dîyar e xwe ji vê rewşê xilas kirîye û dewlet jî hê mûçeyan dide.

Motîfeke din a tevlîhevîyê: jihevdeketina sîyasî ya welatekî ya heta niha weke modeleke demokratîk dihat dîtin. Popularîteya darbeya eskerî ya 22yê adara 2012ê ya ku li derveyî welêt li herderî hat rexnekirin, mirov matmayî hiştin. Tevî pêkhatina wê ya di demekê de ku îhtîmala wê pir kêm de – çend hefteyan berîya hilbijartineke serokdewletîyê ya vekirî – û helwêsta kirdarên wê ya bi kêra talanê û hesabjihevpirsînê hat, eskerên artêşa bejahî ya Kati a ku seresker **Amadû Sanogo** wê bi rê ve dibe, dest werda li ser erdeke guncaw: ji bilî ku wan sûd ji harbûna piştî rûbirûbûna hêzên herî li pişt ên eskerî bi serhildana ***tûaregan*** re li bakur girtibe, axaftinên darbekeran li ser bertîlxwurîya elîtan û "*demokrasîya qalik vala*" di nava xelkê welêt de bi erênî hatin pêşwazîkirin. Yên ku – bi dizî – darbe bi rêya Bereya Yekbûyî ji bo Parastina Demokrasî û Komarê şermezar kirî jî di navê de (BDK, yan jî "Bereya Redê") (1), hema piştre berpirsîyarên sîyasî li pey hev çûn cem wan. Yek ji pêşengên şoreşa sala 1991ê, ya ku rejîma yek-partîyê ya general **Mûsa Traorê** hilweşand û berpirsîyarê Partîya Piştgirîya Efrîkî ji bo Demokrasî û Serxwebûnê (PEDS) **Umar Marîko** dibêje, "*vê darbeya eskerî em ji xewn û leylanekê xilas kirin, û ew pirsgirêkê jî di çarçoveya wê de bi cih dike, ango gerîna li demokrasîyê ji bo xelkê Malîyê*". (2) Întellektuela malîyî **Amînata Dramane Traorê** jî tiştekî din nabêje dema ew weha difikire: "*Sanogo ne pirsgirêk e, Sanogo semptomek e*". (3) Li derveyî welêt ev têz pir bi xurtî deng vedide, nexasim li Fransayê, li devera ku bîst sal ji bo jihevdeketina welêt, ji bo "*gabegie* [talan; nota wergêr]" bûn xisar (4) – piştî ku pesnê "*modela*" vî welatî pêşnîyaz kirî da. Gelo ev deng ne bi lez destketîyên Komara Sêyem a encama şoreşa 1991ê bû, înkar dikin? Azadîya xweîfadekirinê ya ku destûr da rojnamevanan bi awayekî hişk rexneyan li rewşa sîyasî bigirin (dibe ku vê yekê kiribe ku ew carinan fizîkî jî rastî êrîşan werin); pêşîlêvekirina civakî tevî damezrandina bêhejmar komele yên ku îro di seferberîya ji bo bakur de bi rola xwe radibin; û dînamîzma qada çandî kir ku paytexta Malîyê bibe navenda hunerî ya parzemînê: Hevdîtinên Wênegirîyê yên Bamako li Festîvala Rêwî-Mêvanên Mirovan Ecêbmayî Dihêlin, welat êdî referansê pêk tîne, stranbêj jî li derveyî welêt dik û sahneyan fetih dikin. Di warê aborî de krêdîya "demokratîk" ya ku Malîyê sûd jê werdigirt bi kêrî peydabûna nifşekî nû yê serekên şirketan hat û rê li ber vebûna li tûrîzmê û teşebusên bîyanî jî vekir.

"Biryarên şaş hatin dayîn"

Amadû Tûmanî Tûré (navê wî weke ATT tê hildan) bi van peyvên li jêr mikur hat, li Alfa Ûmer Konarê yê arkeolog ê ku piştî yekem hilbijartinên azad ên di dîroka Malîyê de weke serokdewlet hat hilbijartin: "*ji bo birêvebirina vî welatî divê mirov dîn be*".

Serokdewlet Konarê piştre neçar ma her li pey hev rûbirû bibe bi serhildanê re – ji berê ve – li bakur, bi zexta daxwazên korporatîstan re, bi ajîtasyona dawî lê nayê û ji hev qut nabe ya xwendekaran re ya ku tevlîbûna wan a nav derbasbûyîna sîyasî ya 1991ê rê li ber vekir, û bi alozîyên dijwar ên di nava partîyan de di her civana hilbijartinan de.

Şantîyeya mezin a herdu dew-rên wî yên desthilatdarîyê jinavendîbûnêkirin pêk anî; biserneketina vê yekê û nebûna çavkanîyan jî pêşî li cezba vê yekê negirt. (5) Tûrê jî sala 2002yê weke serokdewlet hat hilbijartin, wî jî sistbûn û arambûneke bi rastî ya siyasî pêk anî. Rola wî sala 1991ê di hilweşandina rejîma Traorê de kiribû ku xelkê welêt gelekî hez jê bike. Ew hingê general bû û birêveberîya darbeya eskerî girte destê xwe da ku piştre desthilatdarîyê bide sivîlan. Deh salan piştre ew bû serokdewlet, wî dixwest weke hêmanekî yekker xuya bike. Heta bi wê radeyê ku wî awayekî hukûmetê vedît yê ku qada sîyasî parçe parçe kir: bêyî partîyeke ku xwe bisipêrîyê, wî hewl da konsensusekê pêk bîne û nûnerên tevahîya meylan li dora xwe bicivîne.

Vê sîstemê hêdî hêdî hêzên guherandin û cihgirtinê, kapasîteya pêşnîyazên partîyan û heta tevahîya nîqaşên raya giştî tevizandin. Tevî ku li seranserê welêt avahîsazî çedibûn û binesazî (rê, kanalîzasyon, enerjî, ...) bi pêş ket jî, bertîlxwarin êdî giştî bû û payebilindkirina kadroyên asta navîn ber bi wezîfeyên asta herî jor ve kir ku bawerîya bi rejîmê nemîne: gelekan ji xelkê Malîyê êdî konsensus weke awayekî pasîfîk ê "parvekirina pasteyê [bi maneya rantê; nota wergêr]" di nava demokrasîyeke "*bi awayekî giştî hîmê xwe baş danî*"– li gorî îfadeya kevne-milîtanê demokrat ê bûyî wezîr û niha mirî ye **Mamadû Lamîne Traorê** – didît. Heman awayê birêveberîyê belav bû heta gihişt pirsgirêka Bakur, li devera ku Koma Selefîst ji bo Waez û Şer (KSWŞ) a ku sala 2006ê bû El-Qaîdeya Mexreba Îslamî (EQMÎ) û paşê jî encamên şerê Lîbyayê yê ku bi kêrî derbaskirina sîlehan a Sahelê hat, rewş ji nûve aloz kir. (6) Ji bo Tûrê yê ku rewşa bakur sala 1992yê bi hevdîtinên peymana neteweyî ya 11ê nîsanê ya mohrkirina aştîyê bi serhildêran re rewş aram kirî (7) têkçûn misoger bû. Ew hê jî girêdayî sîyaseta lihevhatinê bû, bi her kesî re guftûgo dikir tevî tehlûkeya dana nîşanên lihevhatina veşartî, wî bawer kir ku bi vî rengî ew ê karibe erdên Malîyê biparêze ji komên şervanên cezayîrî yên ji 2003yê û pêve li Sahelê çalakbûyî. Heman salê wî kir ku sîh û du rojavayî yên ku li Cezayîrê hatin revandin werin berdan, wî roleke navcîtîyê jî xist para xwe. Ji bo vê jî hêzên ewropî destek dabûnê, çawa ku zexta Parîsê ji bo azadkirina rehîne **Pierre Camatte** di sibata 2010ê de kirî jî nîşan dide. Lê belê hingê "peymana" bi EQMIyê re êdî ne li dar bû û revandina mirovan li Malîyê diqewimî, vê yekê kir ku Cezayîr û Fransa, Tûrê bi sistîyê gunehbar bikin.

Ji bo vî eskerê xwedî tecrûbe, lê belê berpirsîyarê xirakirina birêxistinbûyîna artêşê, înkar îro temam bûye. Kevne wezîrekî bergirîyê çavdêrîya xwe weha derdibire: "*biryarên şaş hatin dayîn: efserên ji artêşê hatin dûrxistin, yên ku kinerê payeya wan bilindkirî, wezîfedarkirinên generalan ên mirovî nikarîbû rave bike hebûn û pirsgirêka lojîstîkê jî bi giştî nehatibû çareserkirin.*" Li gorî fikra rayedarên malîyî, bicihkirina şervanên tûaregî di nava artêşê de li gorî peymana neteweyî, bi rastî jî qewimîbû. Bi heman rengî, li Bamakoyê tu kesî bi rastî jinûve rûdana serhildana – sînordar bi çend hizban – a sala 2006ê ya li bakur fêm nekir.

Bicihanîna bitesîr a biryarên peymana neteweyî ya bi piranî pesnê wê tê dayîn, dereng ma, nexasim jî xweserîya îdarî û bipêşketina aborî. Birêveberê rojnameya dewletê *L'Essor* **Suleyman Drabo** qebûl dike ku "*Şaşî hatine kirin. Divîyabû dema ku me dest bi çêkirina rêyên nû kir, dawîanîna li rewşa tecrîdkirî ya bakur li pêş bihata girtin. Lê belê ne rast e mirov bibêje ATT – û berîya wî Konarê – tu tişt li bakur nekirin. Ji bo yên ku Kîdalê baş nas dikin, bajar veguherî. Ji bo bîyanîyekî bêparbûn û mehrûmbûn her weke xwe ye, lê ji bo me, em dizanin em ji ku tên. Wekî din raya giştî ya malîyî tu carî qebûl nekir ku evqas fon ji hersê herêmên Bakur re werin veqetandin, lewra kêmasî û mehrûmî li her deverî hene. Dibêjin: dirûvê herêma Kayesê* [li başûrrojavayê welêt] *guherîye, hemin wisa ye, lê belê ne ku dewletê ew guherand, bi xêra mayeyên karkerên koçber veguherî!*"

Dewleta Malîyê ya îdareya wê kêm û bertîlxwarina ku her weha kolektîvên herêmî jî kangren kirine, bê şik û guman nedikarî vîzyona serokdewlet Konarê pêk bîne: bicihkirina pirsgirêka bakur di nava tevgera mezin a jinavendîbûnkirinê de. Wezîrê Karê derve yê dawî yê Tûrê ê bi navê Sûmeylû Bûbeye Mayga qebûl dike ku pêncî salan piştî serxwebûnê ew "*hê jî bi pirsgirêka neteweyî dilebikin*". Ji rewşa heyî û wêde ew tirseke bi rastî li Malîyê dibîne: başûr xwe ji herêmên bakur dûr bike û wan bi serê xwe bihêle.

Sîyeke din gefan li tecrûbeya demokratîk dixwe. Tevî ku damezrênerên serxwebûnê bi qedr û qîmetê împeretorîyên mezin ên dîroka Malîyê dizanîn (8) weke gelek ên tecrûbeyên bihevrejîyana etnîsîteyan, roj roja tecrîdkirina nasnameyên cihê ye. Dîrokzan û civakzan M.T. ji ber ku pirsgirêk nazik bûye, naxwaze navê wî were eşkerekirin, belê çavdêrîya xwe weha îfade dike: "*Xelkê Malîyê her diçe bêhtir difikire ku bambara* [etnîsîteya ku zimanê wê bû zimanê danûstendinê] *ne, û li têkilîyên di navbera komên etnîk de weke pêwendîyên girêdanê yên di serdema hukmê melik **Sêgû** di sedsalên 17ê û 18ê de dinêrin.*" Di nava heman atmosfera civakî de heta dawîyê nirx bi mîrateya malînkê û ya "esîlzadeyên" dîroka împeretorîya ***mandîngî*** ya sedsala 13ê tê dayîn, tevî ku ev împeretorî ji dîroknûserîyê bêhtir mîtolojî ne.

Tehlûkeya tundrewîya îslamî, vîzyona revîzyonîst a demokratîkbûnê, xurtbûna civatparêzîyê û bi ser wan de jî neteweperestîyeke bi ser xwe ve çûyî tê, ya ku ji 22yê adarê ve xwe li hemberî destwerdanên dîplomatîk ên bîyanî îfade dike: xisletên dikin ku defa hawarê lêxe, yên Komara Sêyemîn a Malîyê ya ku heta bi hîmê wê di tehlûkeyê de ye, ev in.

* Rojnamevan

(1) BDK pêncî partî û sed komeleyên muxalifê darbekaran dicivîne.

(2) *Le Nouveau Courrier,* Bamako, 22yê hezîrana 2012ê.

(3) "Afrique presse", TV5, 26ê gulana 2012ê.

(4) *Bigire li ber* Laurent Bigot, "Les défis du Sahel : focus sur la crise malienne / Pirsgirêkên Sahelê: zîvirandina awiran ser krîza Malîyê", semîner li Institut Français des Relations Internationales (IFRI), Parîs, 22yê hezîrana 2012ê.

(5) *Bigire li ber* Ousmane Sy, "Reconstruire l'Afrique / Jinûve avakirina Efrîkayê", Charles Léopold Mayer, Parîs, 2009.

(6) Gotara li jêr bixwîne: Philippe Leymarie, "Comment le Sahel est devenu une poudrière / Sahel çawa veguherî barûtxaneyekê", *Le Monde diplomatique,* nîsana 2012ê.

(7) Peymana Neteweyî di navbera hukûmeta Malîyê û Tevger û Bereyên Yekbûyî yên Azawadê (TBYA) de hat mohrkirin, ev peyman statûyeke taybet dide bakurê Malîyê.

(8) Yên ku behsa wan tê kirin împeretorîyên Gana, Malî û Songayê ne ku ji sedsala 9ê heta bi sedsala 16ê serwer bûn li Sahel û Efrîkaya Rojava.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Îslameke ji xwe û me re kişkişandî

Îslama Malîyê dibe ku hertişt be, lê ne yekbûyî ye. Berpirsîyarên misilman ên welêt tîrmeha 2012ê civîyan û li dijî texrîbkirina ziyaretên şêxan ku 30ê hezîranê li Tombûktûyê dest pê kir, protesto kirin. Lê belê ji derve ve hevdengîya wan cudatîyên wan ên hundir baş venaşêre. Meylên "modernîst" ên ku monarşîyên petrolê yên Kendavê pişta wan digirin muxalif in li dijî serekên ji rêûresmê yên rêzdar ên îslama şêx û zîyaretan a ku ji sedsalan ve diherike nav zevîyên dîndarîya xelkê. Ji bo meylên "modernîst" şêx û kulta zîyaretan xurafe ne û divê ji binî ve werin tinekirin.

Ev meyl li Malîyê her diçe bêhtir deng vedide û girîngtir dibe. Xeml û têkelhevîyeke tevgeran roja me ya îro bi *wehabîzmê* re ketîye nava muhbetekê, Întelektuelên ciwan ên ku diçûn li Rojhilatê Nezîk bixwînin, wehabîzm anîn Malîyê û rabihurîya vê yekê heta bi dawîhatina li kolonîkirinê diçe; dîsa jî doktrîna ji Erebîstana Suûdî tê, ji bîst salan û vir ve gelekî bi pêş ket.

Bi bihara demokratîk a Malîyê a adara 1991ê re, bi dehan komeleyên misilman hatin damezrandin. Ûsman Medenî Heydera berpirsîyarê yekê ji wan ên herî populer e, wî bi israr gilî kir ku navê rêxistina wî Ensar Dîn ("Parastina Dîn") ji aliyê koma bi heman navî li bakur çalak ve hatiye "desteserkirin". Ew vê koma li bakur weke terorîst û "şeytanî" bi nav dike. Heydera yê ku îlhama xwe ji sûfîtîyê digire û mirov gelekî hez ji waezên wî dikin, bi xwe pesnê bêhnfirehî û toleransê dide. Li alîyê din hemû jî endamên heman meyla paqijker in ku li dijî bêhnfirehî û toleransa civakê radibe.

Erê, rêxistina şêwirmendîyê HCIM ya sala 2002yê damezrandî, xirakirina tirbe û zîyaretan weke "kirinên serdemeke din" bi nav kiribe jî, di qanûna nû ya malbatê de, bi roleke dîyarker rabû; vê qanûnê mafên jinan kêm kirin û berepaş birin.

J.D.

www.pranavkurd.org

Bi hatina dem cot re, bajarê Kalabrî ya Rosarnoyê xwe ji bo vegera karkerên demsalî, yên ku îsyanên aloz yên çileya paşîna 2010'ê ji bajêr bezandibûn, amade dike. Wê demê jî, medyayê bi yekdengî nifûsa bajêr bi «nijadperestiyê» tawanbar kiribû. Em vegeriyan şûna pevçûnan, da ku sedemên din destnîşan bikin.

Koçberên afrîkî di tora mafyaya kalabrîyê de

Sedemên cuda yên teqînekê

Christophe Ventura *

Li nêzîkî dergehê kevnebinyada Operaya Sîlayê, mirov li rastî parçeyên erebeyeke şewîtî tê. Ev şopa dawî ya «serhildana Rosarno'yê» ye, ku weha li ber deriyê vê kevnekargeha guherandina zeytûnan hat hiştin. Di roja 7'ê çileya paşîna bihurî de, ev qezaya cotyarî ya Kalabra'yê, ku xwediyê 16 000 nişteçîhan e, bûye paşxana raperrînan, paşê ku karkerekî togoyî, Ayiva Saibou, bi fîşekên tifingê hat birîndarkirin. Ew wê demê ji zêviyên porteqalan vedigeriya, yek ji 900 karkerên demsalî ku li wira, di bin mercên tenduristî yên erjeng de, li ser hev dijîn.

Yek ji wan karkeran vê meseleyê weha vedibêje : *« Êdî zêde bû, em raperiyan. Bes beşek ji nişteçîhan li dijî me derket û erîş anî ser me. »* Ji ber şîddeta şerrekî bi dar, hesin û koktayl molotovan, dewlet neçar ma ku, di roja 10'ê çileya paşînê de, bi acilî 700 koçberan bi rêya otobusê ji bajêr bi dûr bixe û wan bibe bajarên Krotona û Bariyê. (1)

Rewşa aborî û şert û mercên jiyanê yên hemwelatiyên ne-ewropayî ji dawiya salên 1990'î û vir de bûn kêşe, lewre jî hêjayî pirsînê ye ka çima bûyerên Rosarno'yê bi taybetî di sala 2010'ê de rû dane ? Çapemeniya îtalyayî û navneteweyî, ev xezeba giştî bi tenê weke bertekeke nijadperest daxuyand. *« Pevçûnên nijadperest »* ; *« nêçîra koçberan »*. Heta *The Guardian*'ê jî, di çapa xwe ya 10'ê çileya paşîna 2010'ê de, Îtalya weke *« welatekî ku yekîtiya xwe di nijadperestiyê de pêk tîne »* destnîşan kir. Bes gelo kîneke weha bi sedemekê tenê rave dibe ?

Ji dûr ve, rewşa Rosarnoyê ji ya deverên din ên cotyariya xurt ne cuda ye - bi taybetî ku em li Endulusyayê biniherîn. (2) Li derdora 1600 eraziyên, ku bi naverastî 1,8 hektarê fireh in, qamûşa cotyarî ya deştê çêdikin. Giulana Paciola, endama Enstîtûya Neteweyî ya Aboriya Cotyarî (INEA) bi pêbaweriyê balê dikişîne ser ku di nava erdên bi vî rengî de, *«hebûna karkerên demsalî insûreke tevnî ye. Li Kalabra'yê, % 95'ê wan bi awayekî derqanûnî tên xebitandin »*,.

Di sala 2009'ê de, bêhtir ji 10 500 karkerên ganayî, senegalî, kêlbefîlî, nîjeryayî an malîyî, bi kaxez an bê kaxiz, digel karkerên din ên ji welatên rojhilata Ewropayê ku nû ketine Yekîtiya Ewropayê, di herêmê de kar kir. 20 sal berê, hejmara wan derbasî 800 kesî nedibû. Bi tenê di sala 2009'ê de, zêdebûneke % 30 hat tomarkirin. Ev karker hane ku pirrî caran qaçax in û bê peyamê dixebitin, ji bo heqê 20-25 euroyan serê rojekê - nîvê hatina karkerekî zagonî yê nişteçîhê herêmê - an jî 1 euro ji bo her zembîla porteqalan, ji berbangê heta avabûna rojê xwe li ser kar diwestin. Wekî din, *capo* (serok) yê ku wan bi rojekê dixebitîne, beşek ji qezencên wan jî ji xwe re vediqetîne. Ew di têkiliyên di navbera xwediyê axê û cotyaran de rola navberekî dileyize, û ew navenda pergaleke xebitandinê ye, ya ku bi giranî di bin bandora sûcên rêxistinkirî de ye, û pirrî caran jî, bi taybetî di eraziyên mezin de yên ku beşeke mezin a *braccianti* (karkerên demsalî) yên afrîkayî dixebitînin, bi van sûcan ve girêdayî ye.

Ji salên 2008-2009'ê ve, dema ku xebatkarên demsalî, yên ji hêla 'Ndrangheta'yê (mafyaya kalabrî) ve xebitandî, di deşta Gioia Tauro'yê de bi hejmarên hîn pirr mezin kom dibûn, beşa sitrûsan qeyraneke girîng derbas kir. Antonino Inuso, serokê Konfederasyona Îtalyayî ya Cotyaran (KÎA) yê qezaya Reggio di Kalabrya'yê vê rewşê weha vedibêje : *« Daketina mayînde ya buhaya porteqalên endustryel, yên ku ji bo guherandina bo ava porteqalan tên bikaranîn, ku ev jî beşa esas ya berhemdariya deştê, bûye daketineke bê bin û asteke nedîtî ya 5 sentîm ji bo kîloyekê gihîşt. »* Ew weha jî didome : *« Bi tenê di sêmehiya duyem a sala 2009'ê, hatina naverast a cotyarên deştê % 25 kêm bû. »*

Nizmbûna buyahan a li seranserê dunyayê, dijberiya xurt a porteqalên biyanî (bi taybetî yên Brasîlyayê), dawiya mîsogerkirina fiyatan a ji hêla Siyaseta Cotyarî ya Hevpar (SCH) ve : ev sedem hemû li hev zêde bûn û xirabûna adaniya çandina sitrûsan bi xwe re anî. Ji bo Giuseppe Mangone yê serokê KÎA'yê yê herêmê, di Kalabrayê de ji 32 000 hektarî yên ji bo vê curê eraziyan veqetandî, 4 000 hektarî di bin xetereya tunebûnê de ne. *« Cotyarên dirust ên deştê zehmetiyên weha dikişînin ku heta meaşa* braccianti*'yan nikarin bidinê »*, Inuso bi şermokî dibêje.

Merivekî xwîngerm, cixareyek di destê wî de, Domenico Bagnato, « qeymeqamê ne ji rêzê » yê Rosarnoyê, me di buroya... şaredêr de pêşwazî dike, ji ber ku ji 10'ê çileya pêşîn 2008'ê ve ye ku şaredarê bajêr tune ye. Di wê rojê de, desteya şaredariyê li gorî zagona dijmafyayê ji bo 18 mehan hat pûçkirin. Li derdora deh heb bajarokên din jî di heman rewşê de ne. (3) Ji bo çi ? *« Paşê îspatkirina girêdanên di navbera xebata îdarî ya şaredariyê û rêxistinên sûcdar de, em li vir hatin wezîfedarkirin »*, Bagnato rave dike.

Bi kiryarên weke hilbijartina şaredar û şêwirmendên şaredariyê yên şirîk, bidestxistina birêvebiriyê û şîrketên xizmetdayînê, 'Ndrangheta dilsozê irfa xwe ya kevn dimîne. Di sitrûsçîniyê de, ew buhaya firotinê li ser berhemdêran ferz dike û beşên guherandinê, barkirin û xistina pazarê jî di destên wî de ne. Tekedestê mafyayî tevahiya beşê bertîl dike. Bagnato rewşê weha dinirxîne : *« Cotyar kîloyeke porteqalên masayî bi 50 qirûşan difiroşe bazirganan. Mafya, ya ku belavkirin û pazarê kontrol dike, vî fiyatî ferz dike. Cotyarek nîne ku dê bikare berhemên xwe bi buhayeke din bifiroşe. Weha ye. Di vê fiyatê de, beşa pareyê xebatê 8 sentîm e, û 4 sentîm jî ji bo xebata nezagonî... Li aliyê din ê zincîrê, ev berhem dikare bi fiyateke di navbera 2 û 2,50 euroyan de di supermarketê de bê firoştin. »*

Lê belê mafya li wir nasekine. Têkoşêrê dûvûdirêj ê li hemberî mafyayê û dozgêrê komarê yê dadgeha Palmiyê, ya ku li ser deşta Gioia Tauro jî hikumdar e, Giuseppe Creazzo rêbazên bidestxistina diravên gîştî - herêmî, neteweyî û ewropayî jî - yên 'Ndrangheta'yê li ber me weha rêz dike : *« Di beşa cotyariyê de, bi taybetî di zeytûnçînî û sitrûsçîniyê de, bidestxistina axan weke pîvana çavbirçîtiya binemalan dikare bê dîtin. Kirrîn û dançandina erdan rê li ber « spîkirina » sermayeyan vedike, bes ew jî dihêle ku ev binemal diravên gîştî, yên Yekîtiya Ewropayê jî di pêş de, wer bigrin. »* Ev xebat pir berhemdar e. Di sala 2007'ê de, rayedarên îtalyayî li Kalabra'yê 451 mînakên qaçaxçîtiyê (ya diravên ewropayî û diravên gîştî yên dewletê) îspat kirin, ji bo yekomeke 125 mîlyon euroyî. (4)

Du sal berê, YE'yê şertên dana finansmanên xwe guherandin, da ku ji berhemdariya erdan bêhtir qîmetê bide hatina cotyaran. Nuha rewş weha ye ku berfirehî û hejmara kokên darên porteqalan yên areziyekê şûna hejmara porteqalên berhemdayî girt. Giulana Paciola vê diyardeyê weha tehlîl dike : *« Vê daneyê pergala aborî û civakî ya Rosarno'yê guherand. Hektareke çandî dikare 250 kentalên sitrûsan berhem bide. Beriya 1'ê rêbendana 2008'ê, Yekîtiya Ewropayê ji bo kentalekê 10 euroyî dida. Areziyeke naverast a yek hektarê bi vî awayî 2500 euroyî distandin - û hîn bêhtir bi qaçaxçîkirinê... Anuha, her areziyekê di navbera 800 û 1200 euroyî de distîne, û ne mimkun e jî ku ew YE'yê bixapîne ! »* Beşeke karkerên nû hatî êdî zêde ne.

Rûniştina wan heye, lê hê jî tên bidûrxistin

Di herêmê de, karkerekî ku di demsalê de 51 rojê xebitîbe - 5 rojan ku tofaneke xwezayî qewimîbe jî - ji bo mayîna salê tezmînateke betaliyê distîne. Mafya û xwediyên axê yên piçûk, ev pergal jî ji rê derxist : ew kesên ku naxebitin weke karkerên demsalî diyar dikin *(falsi braccianti)*, an jî kesên din li şûna wan dixebitînin.

Li Kalabrayê, 13 500 karker li Istituto Nazionale della Previdenza Soziale (INPS, saziya berpirsyara dana tezmînatên civakî) qeydkirî ne, û INPS jî tezmînatan dide % 75'ê ji wan. (5) Rewş weha ye ku rêjeya wergirên tezmînatê, di tevahiya welêt de, li Kalabra'yê herî bilind e... Giulana Paciola diyar dike ku *« INPS ji xewa xwe rabû û wê lîsteya wergirên tezmînatan di ber çavan re derbas kir. Ji 2008'ê ve, ev lîste bi nîvî hat kêmkirin, û çavdêrî jî zêde bûn. Berî, bimifa bû ku meriv porteqalan ji bo wergirtina alîkariyên YE'yê kom bike, û wekî din xebatên din bike û diravên INPS'ê bistîne. »*

Ew weha didome : *« Qeyrana aborî hejmareke mezin a karkerên koçber, ku kaxizên wan hebûn bes ji karê xwe yên di pîşesaziyên bakurî de hatibûn avêtin, ber bi başûrî ve anîn. Lê belê, di heman demê de, di deşta Gioia Tauro'yê de, pêwîstiya bi karkerên sitrûsan pirr kêm dibû. »* Domenico Bagnato vê tehlîlê piştrast dike : *« Bi pey bûyerên rêbendanê re, polês diyar kir ku % 50 karkerên demsalî yên ne-ewropayî ku hatibûn dûrxistin, xwediyê daniştinê bûn û ji ber ku ji karê xwe hatibûn avêtin, ji bakurî hatibûn. Tunebûna xebatê ev koçberên demsalî li vir bi cîh kirin. »* Rewş weha ye ku ji 2008'ê ve, çar insûrên cuda, lê bi awayekî bi hev ve girêdayî jî, li Rosarno'yê li ser hev bûn û aloziyên aborî û civakî zêde kirin : qeyrana bêşa sitrûsan, ku nifûsa herêmî xist tengasiyê û bandora xwe li hatina cotyaran kir ; guherandina şertên dana alîkariyên ewropayî, ku 'Ndrangheta'yê ji vê xebatê xemsar kir ; biryarên INPS'ê, ku pergaleke hatinên sextekar, ya ku beşeke nifûsê jê sûd werdigirt, lerizand ; û, taliyê, encamên pêşî yên qeyrana aborî ya navneteweyî li ser welêt.

Ev insûrên cuda, û ne tenê nijadperestî, arîşeyên di navbera komên civakî yên cihê de, û bi taybetî cotyarên piçûk û karkerên koçber, geş kirin. Lê belê, erdên herêmê hê jî di destê 'Ndranghetayê de ne, û ew hê jî pereyan distîne û mafê her kesî dixwe.

* Rojnamevan

(1) Li gorî ajansa Ansa ku hejmarên walîtiya qezaya Reggio di Kalabrayê dubare dike, di roja 26'ê nîsana 2010'ê de, 53 kes birîndar bûn, 21 koçber, 18 polês û 14 nişteçîhên herêmê jî di nav de.

(2) Bnr. Pierre Daum û Aurel, « Et pour quelques tomates de plus » (« Ji bo çend bacanên sor ên zêde »), *Le Monde diplomatique*, adara 2010'ê.

(3) Bnr. Antonello Mangano, *Gli africani salveranno l'Italia (Afrîqayî dê Îtalyayê bifilitînin)*, Rizzoli, Mîlan, 2010.

(4) Desteya meclîsî ya lêpirsîna diyardeya mafya û şîrketên sûcdar ên wekî wê, « Rapora salane ya li ser 'Ndrangheta'yê », 2008, www.camera.it

(5) Bnr. Sergio Rizzo û Gian Antonio Stella, « I cinque martiri e i centomila falsi braccianti », *Il corriere della sera,* Mîlan, 29'ê gulana 2010'ê.



Kîto Sîno: **Keştîya mirinê**, Li pêş Parlementoya Ewropayê, Meydana Schuman, 30 m

Wergera ji fransî: Simko Destan

www.lemondekurdi.org

*Parrhesîa*ya Yewnana antîk û qedexebûna kurdî li Kurdistanê

Şengul Ogur

Mîchel Foucault di payiza 1983ê de li zanîngeha Calîforniayê di derbarê têgiha parrhesîaya Yewnana antîk de semîneran dabû. Ev semînerên **Foucault** wekî pirtûkekê çap bû.

Di beşê pêşî yê vê pirtûkê de **Faoucault** li ser berhemên **Eurîpîdes**, di navbera sazîyên wekî azadî, perwerdehî, desthilatdarî û siyaseta heyî de, bi pêvajoyê re guherîna têgiha ***parrhesîa***yê dişopîne û vê guherînê bi awayekî ku me qanî bike radixe ber çavan.

Parrhesîa wekî *"free speech"* hatîye wergerandin bo îngilîzî. Dema ku mirov bala xwe dide taybetmendîya *parrhesîa*yê mirov dikare wê, ji hêla wateyî ve wekî *''axaftina azad"* wergerîne kurdî jî. Parrhesîa wekî "rastgotinîyê" hatîye wergerandin bo fransî û almanî jî. Bi ya min sedema wê jî ew e ku alman û fransizan bêhtir hêla sincî ya parrhesîayê dane ber çav û ya siyasî paşguh kirine. Lê îngilîzan jî bêhtir hêla wê ya siyasî dane ber çavan û li gorî vê jî ew wekî ***"axaftina azad"*** wergerandine. Ku ez raya xwe bibêjim *parrhesîa* berîya taybetmendiya xwe ya etîkî (rastgotinîyê) ew berîya her tiştî xweyî wateyeke siyasî ye (axaftina azad). Loma parrhesîa mafek e û ku ji hêla zagonan ve ev maf hatîye diyar kirin ka kî dikare vî mafî bi kar bîne û kî ji vî mafî bêpar e. Helbet, sînordarkirina mafan a ji hêla zagonan ve bi demê re hin têgihiştin û rêbazên etîk jî bi xwe re tîne. Ji bo bandora diyarker a hêla siyasî ez wateya etîkî ya parrhesîayê wekî dûvelinga wateya wê ya siyasî dibînim û bi dilekî rehet têgiha parrhesîayê wekî "axaftina azad" werdigerînim kurdî.

Parrhesîa ji hêla etîmolojîk ve ji ***parrhesîazesthaî*** tê - ku ji pevgihîna ***pan***(her tişt) û ***rhêma***(ya hatî gotin)-ku tê wateya "***vegotina her tiştî***" (Mîchel Foucault; Axaftina Azad, r. 10)

Lê parrhesîa mafek e; ango her kes nikare her tiştî bibêje. Mînak biyanî, kole, jin û zarokên wan nikarin parrhesîayê bi kar bînin, yanî ew nikarin hest û ramanên xwe yê di derbarê bûyerekê de vebêjin. Zagonan ew maf ji wan standine. Ew ne xweyî karîn û şiyana bikaranîna parrhesîayê ne. Mafê bikaranîna parrhesîayê statûyeke civakî ya bilind dixwaze ku ev jî ji hêla zagonan ve hatine diyar kirin. Ji bilî jin, biyanî, kole û zarokên wan ku nikarin mafê parrhesîayê bi kar bînin herwiha kesên ku ne xweyî navekî paqij ê sincî jî bin nikarin vî mafî bi kar bînin. Hemwelatîbûyina sîteyê ji bo mafê bikaranîna parrhesîayê her çiqasî şertê sereke û bingehîn be jî, ji bo bikaranîna mafê axaftina azad, rastgoyîyê, ne bes e; loma herwiha ew kesê hemwelatîyê sîteyê ye divê ji malbata xwe navekî lewitî newergirtibe, divê navê bêşerefiyê bi dû neketibe. Helbet ber bi şerê Sparta û Atînayê ve têgiha parrhesîayê li gel şertê hemwelatîbûnê, navekî paqij ango şertên xweyîbûna prensîbên sincî, şertê zanînê jî bi xwe re tîne.

Ku em bi giştî lê binerin ji bo mirov bikaribe mafê parrhesîayê bi kar bîne; *1) Hemwelatîbûna sîteyê (bi şertê ku nebiyanî jî be), 2) Xweyîbûna li prensîbên sincî, 3) Zanîn,* hewce ne.

Li gorî rewşa sazîyên perwerdehî, azadî, siyasî, desthilatdariyê, bi demê re mafê parrhesîayê diguhere. Jixwe **Foucault** dibêje kêfareta min ew e ku ez bidim nîşandan bê çawa hînbûn, tevgerên ji rêzê, tiştên ''bêdeng'' ên mirovan di navbera sazîyên navborî de çawa krîzê pêk tîne û dibe pirsgirêkek. (Mîcheal Focucault; Axaftina Azad, r. 61)

Mînak di ***Îona*** **Eurîpîdes** de ji bo ku ***Apollon*** ji atînayîyan bêhtir nêzîkî spartayîyan bû Eurîpîdes desthilatdarîya parrhesîayê ji Apollon distîne û navenda heqîqetê jî ji ***Delphoî***yê tîne ***Atîna***yê. Bi vê guherînê re êdî hînbûna heqîqetê ji yezdanan derbasî mirovan, ji remildaran derbasî hemwelatîyên Atînayê dibe. (Mîchel Foucault; Axaftina Azad, r. 30-47)

Di ***Orestesa*** Eurîpîdes de jî parrhesîa bi bandora şerê atînayîyan û spartayîyan dikeve krîzê û şertê zanînê li xwe bar dike û qada bikaranîna mafê parrhesîayê bertengtir dibe. Loma di rewşên şer de, di rewşên ku rejîma demokratîk ketiye krîzê de her kes parrhesîayê bi kar bîne ji bo rejîmê wekî tiştekî nebaş tê nirxandin. (Mîchel Foucault, Axaftina Azad, r. 47-61)

Ango li gorî rewşên polîtîk mafê herî xwezayî, tevgerên hînbûyî dibin pirsgirêk û mirov ji hin mafên herî însanî jî bêpar dimîne.

Mafê bikaranîna parrhesîayê ji bo mirovên yewnanan xweyî çi wateyê be mafê bikaranîna kurdî jî ji bo kurdan tê heman wateyê. Lê di mijara bikaranîna parrhesîayê û kurdî de mirovên yewnan ji kurdan bisiûdtir in; loma kesên xweyî şertên diyarkirî bûn dikarîbûn mafê parrhesîayê bi kar bînin lê dema ku mirov li kurdan dinêre ti kurdekî ku karibe mafê axaftin û hînbûna kurdî bi kar bîne heya berîya bi demeke nêz jî nebû û hê jî di salonên dadgehan de mikrofon li kurdî tê girtin, hê jî di dibistanan de dema ku zarok di polê de bi kurdî diaxivin mamosteyê wan bi awir û rotên xwe rê li ber axaftina bi kurdî digirin. Ango li Yewnana antîk koleyên ku nikarîbûn mafê parrhesîayê bi kar bînin çi bin, li Kurdistanê jî kurd heman tişt in; statûya kole û biyanîyên ji mafê parrhesîayê bêpar çi bin, kurdên ku nikarin kurdî bi kar bînin jî ji bo dewleta tirk heman tişt in; ango kurd li Kurdistanê di statûya koleyan de ne û li welatê xwe ''biyanî'' ne. Loma li Yewnana antîk ''kole'' û ''biyanî'' ji mafê bikaranîna parrhesîayê; ango ji mafê axaftinê, axaftina azad, rexnekirinê, rastgotinê bêpar in û çawa ku di ***Bakhaî*** û ***Elektra***ya Eûrîpîdes de bikaranîna parrhesîayê xweyî rîsk be (Mîchel Foucault, Axaftina Azad, r. 26-30) axaftina bi kurdî jî xweyî rîsk e ku mirovan dixe zindanan, dixe nav destên îşkencekaran, mirovan dixe bin goran.

Ji bo ku ez destnîşan bikim bê qedexebûna kurdî bi awayekî berbiçav tê çi wateyê, ez ê hinekî behsa berhema bi navê ***Jinên Fenîkeyî*** ya Eurîpîdes bikim û çend diyalogên **Îokaste** û kurê wê **Polyneîkes** par ve bikim. Di vê diyalogê de em ê bibînin ku kurd li welatê xwe biyanî ne û statûya wan statûya jêr-kole ye. Ango kurd li gel ku li welatê xwe dijîn jî ew ji welatê xwe sirgunkirî ne, loma di yewnana antîk de kesê ku sirgunî sîteyeke din dibe, li sîteya nû, li biyanîstanê ne xweyî mafê parrhesîayê ye ango ew kesê sirgunkirî, ew kesên biyanî, li biyanîstanê nikare hest û ramanê xwe bi azadî bibêje; nikare biaxive. Ji bo ku yewnanîyek karibe mafê parrhesîyê bi kar bîne berîya her tiştî divê ew hemwelatî be, divê xweyî şerefeke paqij be, divê ne kole û jin û zarokên koleyan be, divê ne biyanî be, divê zana be.

Li gorî vê ji bo mafê axaftina azad a kurdan nîne, em dikarin bibêjin ku kurd li welatê xwe biyanî ne, kole ne, ji hêla statûya civakî ve li paşmayî ne, ji gorî zagona serwerîya tirkan kurd ne xweyî prensîbên sincî ne ku karibin bi zimanê xwe biaxivin, ne xweyî wê zanînê jî.

Lê berîya damezirîna serwerîya dewleta tirk a li Kurdistanê ti krîzeke mafê axaftina bi kurdî nebû. Piştî serwerîya tirkan li Kurdistanê ava bû, roj bi roj tevger, hînbûn, hewldan, mafên herî rewa ên kurdan bûne pirsgirêk. Di kurdî de krîzek pêk hat. Kurdî bû krîz û serwerîya tirkan bo vê krîzê ji holê rake her cure zext û zordarî ceriband. Lê hê jî li Kurdistanê, li Tirkîyeyê mikrofon li kurdî têne girtin, hê jî ji navenda serwerîyê daxuyanî tê dayîn ku, ***''kurdî ne zimanê şaristanîyê ye"***, hê jî tê gotin ku, ***''ne pêkan e bi kurdî perwerdehî bibe"***, hê jî tê gotin ku; ***''kurdî encax dikare bibe dersa hilbijarkî"*** û hwd. Lê kurd jî hê jî ji bo ku vî mafî; mafê axaftina bi kurdî; mafê axaftina azad bi kar bînin berdêlan didin; têne girtin, êşkencekirin û kuştin.

JINÊN FENÎKEYÎ; DÎYALOGA ÎOKASTE Û POLYNEÎKES

Mijara lîstika ***Jinên Fenîkeyî*** ya Eurîpîdes pevçûna desthilatdarîyê ya di navbera du birayan de ye; **Eteokles, Polyneîkes.** Her dû bira ji bo ku pêşî li gotinê xefzan bigirin ku ew ê ji bo desthilatdariyê pev biçin di navbera xwe de peymanê datînin da ku bi awayekî dorveger sal bi sal desthilatdarîya Thebaîyê bi dest hev ve berdin. Lê Eteokles sonda xwe bi cih nayîne û desthilatdarîyê bi dest birayê xwe Polyneîkes ve bernade. Ji bo vê jî Polyneîkes li hemberî birayê xwe dikeve amedakarîya şer û ji welatê xwe sirgûn dibe.

Lê diya wan **Îokaste** dikeve navbera wan û wan qanî dike da ku agirbestê di navbera xwe de bikin. Dema ku Îokaste wan qanî dike û Polyneîkes ji sirgûnîyê vedigere, diya wî herî pêşî pirsa rewşa sirgûnê jê dike bê rewşeke zor bû yan na. Polyneîkes bersiva; ***"ji her tiştî zortir bû"*** dide diya xwe. Sedema zorbûna wê jî ew bi parrhesîayê ve girêdide. Loma Polyneîkes li sirgûnîyê yekî biyanî bû û mafê wî yê bikaranîna parrhesîayê nîn bû; ango Polyneîkes ne xweyî wî mafî bû ku bikaribûya hest û ramanên xwe bi azadî derbibira. Ji bo vê jî Polyneîkes bêparmayina ji mafê parrhesîayê dişibîne rewşa koleyan û diya wî Îokasteyê jî bêparmayina ji parrhesîayê dişibîne rewşa dînbûnê û wê wekî nexweşîyê bi nav dike.

Heke bêparmayina ji mafê parrhesîayê ango qedexebûna derbirîna hest û ramanê koletî be, dînker be û nexweşî be gelo ji bo kurdan bêparmayina ji mafê axaftin, nivîsandin, perwerdehîya bi zimanê kurdî çi ye û divê mirov vê rewşê di nav kîjan kategorîyê de bi cih bike?

Ez ji vê statûya kurdan re ku nikarin li welatê xwe bi zimanê xwe biaxivin, statûya ***jêr-kole*** dibêjim. Polyneîkes ji welatê xwe bi der e, biyanî ye û ji mafê parrhesîayê bêpar e lê kurd li welatê xwe ne lê li welatê xwe biyanî, li welatê xwe sirgûnkirî ne ku nikarin mafê bikaranîna kurdî bi kar bînin.

Ez dorê didim diyaloga di navbera Îokaste û Polyneîkes de û xwe kerr dikim:

ÎOKASTE: Berîya her tiştî, tiştê ku dixwazim jê serwext bibim ev e: Jiyana sirgûnîyê çawa ye? Şerpezetîyeke mezin e?

POLYNEÎKES: Ya herî mezin e…Ji ya ku hatiye gotin gelekî qambaxtir e.

ÎOKASTE: Ji kîjan hêlê ve kambax e? Çi ye ya ku dilê kesê mişextkirî herî pir diêşîne?

POLYNEÎKES: Dizanî ya herî qambax çi ye? Mirov ji mafê axaftina azad bêpar e (***En men megîston, ouk ekheî parrhesîa***)

ÎOKASTE: Bêparmayina ji mafê derbirîna ramanê..Ev dişibe jiyana koleyan.

POLYNEÎKES: Însan neçar dimîne ku bêaqilîyên rêveberan ragire.

ÎOKASTE: Lihevrasthatina bi dînan re a di dîtinîya wan de.. Ev mirovan nexweş dike.

POLYNEÎKES: Însan di ber berjwendîya xwe de li dijî xwezaya xwe derdikeve û bi vî awayî dibe kole. (Mîchel Foulcault; Axaftina Azad, r. 23-24)



Kîto Sîno: Rêzewêneyên li ser bilêta trênê

Naverok

ÎLON 2012

Sîyaseta kurdî ya amerîkî
Prof. Dr. Ferhad Ibrahim ▶ R. 1

Bozarslan: "Xwevekişandina Sûrîyeyê ya ji herêmên kurdan biryareke stratejîk e"
Yado Ciwan ▶ R. 1

Daxwaza herî xirab
Serge Halimi ▶ R. 2

Robotekê pulitzera min dizî
Evgeny Morozo ▶ R. 2

Sûrîye, qada şerê çapemenîyê
Marc de Miramon û Antonin Amado ▶ R. 6

Zêde civînên bilind, civînên bilind dikujin
Jonas Gahr Støre ▶ R. 7

Zilamekî din ê xwedê bijartî ji bo Îtalyayê
Raffaele Laudani ▶ R. 8

Siberoja Ewropayê li derî raya giştî, sergirtî tê nîqaşkirin
C. Deloire û C. Dubois ▶ R. 9

Bêdadîya li hember kurdan
Kendal Nezan ▶ R. 10

Cîhana veşartî ya Partîya Komunîst a Çînî
Martine Bulard ▶ R. 12

Gelo Çîn emperyalîst e?
Michael T. Klare ▶ R. 14

Sedemeke pûte pê nayê dayîn a krîza amerîkî
Dean Baker ▶ R. 17

Li Malîyê jihevdeketina xewna demokratîk
Jacques Delcroze ▶ R. 18

Sedemên cuda yên teqînekê
Christophe Ventura ▶ R. 19

*Parrhesîa*ya Yewnana antîk û qedexebûna kurdî li Kurdistanê
Şengul Ogur ▶ R. 20

Le Monde diplomatique kurdî

Abonetîya dîjîtal a salane: 30 €

(Ji bo serlêdanê forma abonetîyê ya malperê bikarbînin)

Independent Kurdish Media Group GmbH (IKMG)
Carnotstr. 4 - D-10587 Berlin

Berliner Volksbank - Hesab/Account/Konto: 2284 1230 10 - BLZ: 100 900 00
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 10 - BIC/SWIFT: BEVODEBB